# Minleyê Zoyê Gira

## Hec Elî Omer Minle Elî



**Dêwan û Gulistana**

**Minleyê Zoyê Gira**

**Hec Elî Umer Minle Elî**

**Bi Zimanê Kurmancî û Zerîf**

**Pesna Pêxemberê Axir Zeman Selat û Selam li ser wî û**

**Çar Yarên Gezîn û Al û Hemî Esĥabên wî**

**Wergerandin Ji tîpên erebî**
**bo Tîpên Kurdî Latînî û Rastanîn:**
**Dr.Mihemed Ebdo Elî**
**Efrîn… 21-2-2024**

## Kurtenasîne bi jiyan nivîskar û helbestvan Şêx Elî

Li sala 1912an li Gundê Dodo ku yek ji heft gundên deşt û çiyayê Meydan-Reco- Efrîn, xanim Zayde zarokê xwe ê carê û dawîn anî û li ser navê bavê xwe Mille Elî, ku mirovekî sincîpak, zana û xudî zanînên olî ên naskirî bû, zarokê xwe binav kir.

Malbata ew zarokê nûbûyî jî mîna hemî malbatên gundî sêfîl û xizan bû. Ji bo ku bavê Eliyê nûbûyî debara jiyana zaroyên xwe bike, neçar dibû wek cotkar li ba axeyên deverê kar bike û carina pêz jî bçêrîne.

Piştî bûndina wî bi saline hindik, Cenga Cîhanî a Yekê (sefer bêrlik) rabû. Li wê çaxê xizanî, birçîbûn, nexweşî pirtir dibûn. Lewre Elî jî mîna hemî zarokên hemtemenên xwe di sêfîliyê de dijî

Gava Elî gurpelaq bû, ew li ba Xocê gund Hec Birahîm ji Gundê Hec Xelîl li waneyên xwe ên sereta amade bû. Elî li ba xocê xwe fêrî xwendin, nivîsand, zanîna bîrewriyê û hin bingehên ola îslamî jî bû. Li kêleka zimanê erebî fêrî zimanê tirkî jî bû. Li wê çaxê di navbera wî û xoce de pêwendî û hezkirineke kûr çêbû û ji xwe re wek mamoste, perwerdkar û pêşeng didît. Wê yekê têkariyeke mezin di pergalbûna kesayetiya Elî de kir. Lewre, li dema ku Hec Birahîm çû ser qedera xwe, Elî pir xemgîn dibû û li salên pêş wî li ser goçkirina wî helbesteke dirêj û watdar nivîsand. Ew zanînên jorborî ji Elî re dibûn bingeheke xurt ji pêşdebirina zanîn, çand û karûbarên wî re li paşerojê û ji wê çaxê de pir ji pirtûkan hez kir. Piştî ku tîpên latînî li Tirkiyê bikar hatin, (Elî `Umo) wekî ku li wan salan bi wî navî dihate nasîn, xwe fêrî xwendina nivîsa Latînî û tirkiya nû jî kir. Ji ber wê, ew li salê pêş wek wergêr li ba destlata navça Kurdaxê kar kir.

Li dahsalên desptêkê ji sedsala bîstan navça Kurdaxê ji her aliyekî de li şûnmayî bû. Xizmetguzarî, dibistan, navendên tendurustî û her tiştê ku ji bo jiyaneke asayî pêwîst bû, lê peyda ne dibû. Navîe ji aliyekî dibin zor û setema derebegên navçê de bû, ji aliyê din de jî destatên Osmanî paşê jî Firensî û dewlet sûryê jî guh ne didan navçê û ew û gelê wê di reşiyê de dihîştin. Lewre rewşên abûrî û civakî li navçê gihşti bûn asteke pir qeyranbar û li benda çîkekî bûn ku bipeqin.

Li wê çaxê kesekî binav Şêx Îbrahîm Xelîl ji Tirkiyê derbas navça Kurdaxê bû û doza belavkirina ramanên olî û civakî ên cuda li şêniyê navçê kir. Herwiha pir neçû, nofine fere ji gundewarên Bakurî ji navça Kurdaxê li dora wî civîn û tevgereke li dijî derbegîtiyê û firensiyan rakir. Ew tevgera civakî di demeke kin

wergerî tevgereke çekdar û pevçûnên çekdar di nav xelkê Kurdaxê bi xwe de vêket.

Wan rewşên levketî kirin ku malbata `Umo Elî ji Gundê Dodê derkevin û herin li Gundê Bêkê, ku navendeke axan bû bicih bibin. Li wir Elî çend salan zarokên gund dan e xwendin. Li sala 1954an malabat Elî ji gundê Bêkê jî ji deket û çû li bajarokê Bilbilê rûniştin. Elî li Bilbilî bû Nivîskarê nifûsê, wî zarok ji didan xwendin û li mizgefta gund îmamtî jî dikir. Lewre ew ji wê çaxê ew bi navê Şex Elî hate nasîn.

Li sala 1953an Şêx Elî Bilbil berda û hat li bajarokê Efrînê rûnişt. Wî li Efrînê nivîsgehek ji bo meşandina karûbarên îdarî û dapiyên malan û zeviyan vekir û karûbarên çûna Hecê jî pêktanî. Li wê çaxî pêwendiya wî bi axeyên Hec Sim`elan re, mîna Fayiq Axa û birayê wî parêzer Mihemed Menan re baş bûn. Li Efrînê wî pêwendî û dostanî bi nofên fere re ji niştecihên bajêr re danîn. Gelek pirtûk jî bi dest xistin û piirtûxaneke ji pirtûkên rengereng di warên olî, siyasî û çandeyî de peyda dikirin. Piraniya berhemên û helbestên xwe jî li wê çaxê li bajarê Efrînê berhem dan.

Li sala 1959an li gel hin dostên xwe wek Hec Bîlal Zîbar, Xoce Resûl Silêman û bilî wan, komelek xêrxwazî bi navê (Komela Îslamî bo Birr û Rindiyê) ava kirin û ew bi xwe jî bû emîndarê wê. Komelê alîkariya xizanên navçê dikir, dibistan ava dikirin têde sêwiyên Efrîn û Ezazê fêr dikirin. Ew komele ta salên şêstî hebû. Lê bi bihaneyê (ewlehî û siyasî) ew li gel Nadiya Efrînê a Çandeyê û Werzişî ji hêla dewletê de hatin qedexekirin. Lê belê digel wê yekê, çalakiyên Şêx Elî ên çandeyî û civakî ne dihatin rawestandin, mala wî bû bû wek “saloneke çandeyî”, dost û hevalên wî lê dicivîn û gelek caran helbestên xwe jî ji wan re dixwendin. Herwiha li wan salan Şêx Elî di warên çande, xêrxwazî û civakî de li navaç Kurdaaxê dibû rûyekî naskirî. Wî wane li mizgefan didan şagirtan, îmamtî li mizgeftan dikir, û tiştê pir balkêş ew bû, ku gotarên xwe li mizgeftê bi zimanê Kurmancî digotin. Lewre diket bin çavdêriya asayişê destlatê û gelek caran ew vedixwanin ba xwe, ew gef dikir û hewildidan daku bi wan re kar bike.

Şêx Elî li sala 1972an wek kesekî serbixwe daket hilbijartinên rêvebiriya xwecihê li navça Efrînê. Li sala 1973an jî bi çalakî piştgiriya lîsta namzetên Kurd ji bo hilbijartinê Encûmena Gelê Sûrî kir û nivîsgeha wî li bajarê Efrînê bû bû weke navendekê ji wan namzetên Kurd re.

Şêx elî pir bi dilferehî dostanî bi oldarê Êzdî û Ermenên ku li wê çaxê li navcên re datanî û bi xweşî bi wan dida û distand. Wî pêwendiyên xurt bi navdarên olî re li bajarên Helebî û şamê re jî danî bûn, wek bi Şêx Ebdella Daxostanî re li Şamê û Mihemed Nebhan re li Helebê. Li sala 1963an Şêx Elî cû ȟeca xwe kir û li sala 1966an çû seredan Qudisê jî.

Di warê kurdewariyê de, pêwendiyên wî bi helbestvanê Kurd re li Bakurê Kurdistanê hebû, wek Mûse Enter ku carekê li Efrînê lê bû mîvan û li gel hev çûn serdana Dr. Nûrî Dêrsimî li Bajarê Helebê. Û gava ku Dr.Dêrsimî çû ser qedera xwe, Şêx Elî ew telqîn kir û gotarek bi kurdî li ser gora wî got. Pişt re û mêrava wî jî li Pîrzgeha Henên- Efrîn ava kir.

Şêx Elî oldarekî dilfere û lêbordar bû, ji tundûtûjî û hişkbaweriyan dûr bû. Di warên çand û agahiya siyasê de di asteke hêja de bû. Ew ne bû endamên tu rêxistinê siyasî, bi taybetî jî rêxistinê îslama siyasî. Ew bi wê baweriyê bû, ku karên siyasî ne li gora kesayetî û paya wî a civakî agiştî ye. Lê belê, ew ji berpirsiyarên xwe ên civakî- siyasî nêzîk bû. Wî bi dilêrî helwestên xwe ji bûyerên siyasî ên netewî û welatînî digirtin. Kurdîtiya wî jî di warên parastina nasnama çandeyî ya gelê Kurd re pir xuya dibû, li sereta parastina zimanê kurdî ji windabûnê xema wî bû. Lewre pir loma ji ew kesên Kurd ku zimanê erebî di nabera hev de bikar tanîn dikirin û wek kerekî xirab didît. Digel ku wî baş bi zimanên erebî û tirkî jî zanî, lê wî pir hindik helbestên xwe bi wan zimanan dinivîsand.

Ew bi kesayetiyên kurdî ên dîrokî pir serbilind bû, mîna Şêx Se`îdê Pîran, Selahiddînê Eyûbî, S`îdê Nûrsî û bilî wan. Wî hin helbestên xwe jî diyarî wan kirin. Ew li ser berhemên kurdî ên nûjen jî serwext bû wek helbestên Cegerxwîn, Mûse Enter û S`idê Nûrsî, û hemî pirtûkên Nûrsî ên bi tirkî li ba wî hebûn. Helbesteke wî e dirêj li ser şerê Tevgera Mirûdan jî heye, tê de bi tundî li dijî wî şerê navxweyî sekiniye û xwestiye ku xwîna Kurdan nerijê.

Kurdîtiya Hec Elî li pêş welatperweriyê kok ne dibû asteg. Wî li sala 1947an helbestek li ser derkatina Firensiyan ji Sûrê û serxwebûna wê nivîsand û li ber seraya Efrînê ji xelkê re got. Dilê wî bi şervanên Filestînê yên sala 1948 re bû jî û helbesteke wî e ciwan li ser wê pirsê jî heye. Şêx Elî Ereb wek ciran û hevbeş di welêt û karûbarên wî didît. Li dema yekîtiya Misirê û Sûryê, li boneya yekê li sala 1959an du birûsk ji Ebdinnasêr û Quwetlî hinartin û ew pîroz kirin.

Şêx Elî zû dest bi nivîsandina helbestê kir. Helbestê wî di hemî warên jiyanê de hene, wek pirsên û bûyerên civakî, netewî, niştimanî, siyasî û di warê evînê de jî hene. Lê belê piraniya ristên wî di warê sofîtiya olî û bergera Xwedê de ne. Risteke wî e dirêj li ser mewlîda pêxember Mihemed heye, beşek jê di bin navnîşana “hev kitaba mewlîda şerîf bi zimanê kurmancî û zerîf” li sala 1947an li çapxana Arax li bajarê Helebê hatiye çapkirin. Zaroyên wî jî hin hejmar jê çap kirin. Pişt re li sala 2014an Dr. Mihemed Ebdo Elî ew wergerand tîpên kurdî ên latînî û hejmarin jê çap kirin û belv kirin.

Li dawiya salên şêstiyan ji sedsala borî, kesê bi navê Silêmanê Xocê Resûl helbestên Şêx Elî bidestnivîs, di bin navê “Dîwana Mille Elî” nivîsandin, lê mixabin ew windabû û gelek helbestên wî jî jidest çûn. Wê hîngê, wî ew helbestên ku li ber destên wî mabûn civandin û ew di vê pirtûkê de parastin.

Zor mixabin, gava ku Hec elî ji verêkirina hecaciyan vedigerî Efrîn, ew tûşî bûyereke çûnhatinê bû û li roja 52/11/1975an jiyana xwe jidest da .

Emê beşek ji helbestên Şêx Elî ku li şûna xwe hîştine diyarî we bikin, belkî bi wê yek em kani bin beşekî biçûk ji dênê wî ê mezin ku di stuyê me maye, piştî vê dema dirêj, lê vegerînin.

**Zaryên Şêx Elî….**

## Hin têbînin berî xwendina helbestan:

1- Rist û helbest bi zarê deverkî yê devera Bilbilê hatine nivîsandin. Lewre naskirina hin deverkî û têgihîştina wan dijwartir dibû. Wek mînak:

- Hin tîpên dengdêr kok nehati bûn bikaranîn, mîna tîpên (I, ê) ew bi tîpa (ى), tîpên (u, û, w) jî bi tîpa (و) hati bûn nivîsandin.
- Cînava kesan (ew) herdem li tîpa kevin (h) wek (hew) hatiye nivîsandin, anî jî wek (hanî). Me jî ew ne guhert û wergî hîşt. Bê guman ji biî wê pir bêjeyên din jî hene bi şêweyê wê ê herêmkî û ê kevnar hatine nivîsandin, lê ji ber wate ne diguhertin, me wekî ku Şêx Elî niîsandi bûn hîştin

2- Bêje û dacek û bilî wan jî bihevxist hati bûn nivîsandin, wê yekê têgihîştina wate û naskirina vekîta bêjeyên pir dijwar dikir.

3- Gotinê Tirkî di helbestan de hebûn, lê ji ber ew li tevahiya navçê dihatin bikaranîn, ew ji bo me jî dihatin naskirin û zanîn.

4- Ji ber piraniya rist û helbestan di warê olî de bûn, ji ber yekê bêjeyên Erebî pir bûn, nemaze jî di ristên olî de. Lewre em neçar bûn ku tîp û şanên taybet ji bo nivîsandina wan bikar wînin. Ew jî ev bûn:

- Tîpa ع bi şertika (`), غ bi (ĝ), ح bi (ĥ).

5- Ji bo hin bêjeyên erebî ên din jî, ji bo ku ew werin naskirin ku erebî ne û ew rast werin xwendin, me tîpên wan ên bi şeddê, dubare dikirin. Wek bêjeyê:: Ummet (أمة), cinnet (جنة ) û hwd.

6- Çi tiştê ji Quraanê ye me kir nav di kevanan ( ).

**Dr.Mihemed E. Elî… Efrîn**

***

## Dîwana Minle Elî

Aferîn Minle Elî te nivîsand    çi xweş dîwan ji Kurdistanê re şand
Te kirine wekî yaqût û mircan    te şakir ez bi mîvanî dilocan
Li cîhanê te hîşt ev yadîgar    tune wekî wê li Belx û Buxara
Ne heye li Cizîr û şehrewanî    ne li Dêrsim û Şam û Esfehanî
Te rakir bextê Kurmanca dilê min    te melhem danî ser derd û kulên min
Nav û dengê te xweş tê min bi mîvan    li cîhanê tu hebî ey dilovan
Her şevê wekî Seydayê Xanî    rake dengê xwe xweş bi cawdanî
Li ser gora Selahiddîn bixwîne    rake ji xewê şahê pir şêrîn e
Li ser gorê binale seydayê kurdî    bêje kanî şûr û mertalê te merdî
Filestînê ji destê dijminê har    bi derxînin ey Selahiddînê keremkar
Bi zimanê me Kurdan ev dîwana    me danî pêş çavê xwendevana
Bixwînin hewna xweşxwanê[1] wî seyda    nezim kir min wekî bilibilê şeyda
Munacatin(er) ew pesna fexrê `alem    bi van her du meraqan dinalim
Li dîwanê dikim zar û munacat    qebûl dike xwedê mirad û hacat
Hezar carî selat û pir silav    li ser wî fexir alemîn werî eva
Bes Minle Alî heyran menale    heqîqet(er) va dîwana pir delal e
Va xweşxana li vir min paşî hanî    qebûlkin ey bira vê ermeĝanê

***

[1] . xweşxane: qesîde

| | | |
|---|---|---|
| Ez aşiqê navê te me | Hawar Mistefa Mihemed | ez miştaqê cavê te me |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| Mihemed şahê alem e | serwer Nebî Adem e | Nan li ser luĥqelem e |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| `Alem keti bû zulmetê | te derxistin hîdayetê | bi weĥiyê bi rîsaletê |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| Navşana te çî rind bû | qedra te `alî bilind bû | tu bi bejin û bal û zend bû |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| Tu efdelê ins û can î | tu me`şûqê `aşiqan î | tu ji ewladê `Ednan î |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| Mewlîda te li sala fîl e | tu ji neslê Îsmaîl e | rohniya çavê Xelîl e |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| Çêkir wî kewn û mekanî | seba xatirê te zî-şanî | kemala te Xwedê zanî |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| Eger çi misliman hene | ew giş miĥtacê te ne | miştaqê dîdara te ne |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| Çaqas insan hat fanî ye | çiqas derbas bû baqî ye | tu bû serwer li gîya |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| Li  nav giş rûĥê enbiya | tu bûyî efdelê giya | ty yî ew nûrê kibriya |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| Can û serê min fîda be | li pêşiya wan enbiya be | tu li  nav wan afta be |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| Tu  yî fexra du cîhana | li ser `alemê siltan e | şefî`ê gîş mislimana |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| Tu yî menbe`a edebê | şeva bist ĥefta Receb | can qurban mi`raca te be |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| Tu yî şeva şahê kewnên | derbas bû heft qatê `ezmên | tu derbas bû qabe qewsên |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| Cemala û ba li mala ĥeq | te dî bi çava muĥqeq | xêrî te kes nedî mutleq |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| Da te wî xil`eta lewlak | seba xatirê te zatî yek | şefa`et min meke xemnak |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| Te got bi fedil û reĥmet | `afke xetayî ummetê | hatim rica û minnetê |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| Ji ummetê re `af anî | te reĥmet ji min ra danî | bi her `ilmekî tu zanî |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| Ebû Bekir sedîqê te | Heval û (?) rê te | mezinê çar yarên te |
| | Hawar Mistefa Mihemed | |
| Emîr elmumînîn `Umer | ji dînê te re bû rihber | bû ĥakimê textê Qeyser |
| | Hawar Mihemed Mistefa | |

Binirin ĥedretî `Usman Hewa bû cami`ê quran ji derdan re dibin derman
Hawar Mistefa Mihemed
`Elî el-murteda kanî can û cîger bi qurbane wî siltanê dîn erslanî
Hawar Mistefa Mihemed
Di rêka wan ra here xar nabê hew li meĥşerê vexwe ava kewserê
Hawar Mistefa Mihemed
Hezar selat û selam li ser te xeyrû el-enam li ser alê te ê kîram
Hawar Mistefa Mihemed
Li esĥab û yarana bi qedrê pişkê baranan ji te ra fexrê cîhanan
Hawar Mistefa Mihemed
Li ser giş rûĥê enbiya ser al û esĥaba giya ser te ĥebîbê kibriya
Hawar Mistefa Mihemed

*Minle Elî ji ummetê dike rica û minet*
*Meded ji te şefa`et Hawar Mistefa Mihemed*

***

**Niyaz**

Hezar şukir û senayê vê hesab bi şev û ro li ĥedretî Xweda be
Selat û pir selam bi sed hezaran li se rûĥê Mihemed Mistefa be
Li ser esĥab û al û ensarên wî li ser pêxmberan û enbiya be
Xwedê razî be ji her çar yara Ebû Bekir û `Umer lawê Xetab e
Ew ji `Usman zî- el-nûrên tavban şêrê yezdan `Elî Elmurtda be
Li Îmam Hesen Ewladê resûl ji Ĥusên ew şehîdê Kerbela be
Li Se`id ji Se`îd û `Ebdirehman ji Telĥe ji Ebû `Ubeyde re be
Ji Zubêr ji Ehlî bêta te meqamê wan firdosa `ela be
Xweda razî be ji îmamê `Ezem Ebû Ĥenîfe hew bi pêşewa be
Îmamê Şafi`î pîrê şerî`etê lê pêş wan mal û can giş fîda be
Ji malêk ji Ehmed lawê Xelîl li her çar îmamên mezheba be
Şefa`eta van giya hem li derd û kulê min bi şefa û totiya be
Îlahî min cuda ji vana meke xêrî te ji kes çare nabe
Gunehkar im `asî û pir xeta me xwedan reĥm û pir `alî cenab e
Serê min `aciz û pir qusûr e li rêka te hezar carî fîda be
Selat û bi silama bi hezaran li ser şefî`ê min xeyr el-wera be
Dîsa li ser esĥabê wî be li ser giş enbiya û pêxembera be
Binir Minle `Elî pêxemberê me şefî`ê misilimana ye tu şa be
***

**Munecat**

Xwedawenda tu xwedan î hemû litf û îĥsan î
Xeta û curim û `îsyanê me derketine meydanê
Gunehkar û perîşan im ez pir qusûr û nuqsan im
Hatim dergahî sulatan im bi ah û zar û giryanê
Eger tu kê biqewtînî xêrî te kes nabînî
Ji vî ĥalî biderxîne li derdan bikî dermanî
`Umer çû li hewa yê xwedanê fedil û `etayê
Li dunyayê li axirayê bê heval meke îmanê
Ezî ĝayet gunehkar im û pir xeta û ewzar im
Ji dergehî te ez narim me `afke tobe ĝufranê
`înayetke bi rehma xwe xelask e min ji arê xwe
Seba xatirê ĥebîbê xwe Mihemed fexrê cîhanê
Tuyê `afkî gîş mislimana dayîk û bav û cîrana
Heval û xak û ixwana meşewtîne bi nîran e
Selat bi silama ve ĥeya ro tim derê ava
Li ser wî roniya çava xwedanê tac û quraanê
Hat Minle `Elî cakê xweda tu qelbê wî şakê
Bi ummeta Mistefa gî(giş) mek reşî li dîwanê

***

**Mûnacat**

Îlahî guh mede curim û xetayî me gunehkara
siba li mehşerê ya reb ji dergehê meqewtîne
qusûrên me paşi netên sitirke ya îlahî tu
bi fedil û rehmetê ya reb ji vî arî biderxîne
îlahî tu kerîm î em rica dikin keremke tu
me `aciza ji hebîbê xwe Mistefa meqetîne
te got (la teqnetû mîn reĥmetî llahî) bi quraanê
xîtamke bi îmanê bi arê xwe meşewtîne
*binir Minle Elî xwedayê te tewab û ĝefar e*
*me `afke bi reĥma xwe tu erĥem el-raĥîmîn e*
îlahî tê me `afkê bi kerem û lutf û îĥsanê
hatim bi barê îsyanan meqewtîne min ji dîwanê
îlahî meĝfîretke van gunahê min şahînşaho
hatim bi barê `isyana meqewtîne min ji dîwanê
ketin ber bayê dunyayê bûme esîrê hewayê
li derdê min bike çare bi heqê fexrê cîhanê
eger pir curim û `asî me xwedan curim û me`asî me
xwedanê qelbê qasî me tu bi eĥwalê min zanê
li ber qetreka reĥmeta te çî ye va ey xwedawenda
meşewtîn min bi arê dûrxî bi curm û `isyanê
bi şev û ro dinalim ez bi ah û ĥesrta ya reb
pişman bû li sûcî xwe xwedanê kewin û mekan î
*xweda! Minle Elî hatî dîwana te dest vala ye*
*zar û giryanê nema bi dest wî de ĝeyrî aha*
îlahî sellî we selêm li ser şems el-duĥa dayêm
Mihemed hem Ebû el-qasêm ĥeya ro derê ava
Li ser cimî`ê enbiya li ser ĥebîbî kibriya
Al û esĥab û giya qedra hêstirên çava
*Seba xatirê wî ey şaha tê `afkê sûcê me niha*
*Rica dike li dergaha ya reb Minle Elî hava*
***

**Resûl Munacat û pesna resûl û xwedandanê gezîn**

Ey xwedawenda her du `alema vî kêmtirî
meke miĥrûm ji şefa`eta wî ĥeq pêxmberî
Ehmed û Meĥmûd û Taha Mistefa wî serwerî
Ez bi qurban e bejin û balava her du çavên enwerî

Bi hevalê her çar yara ke siba li meĥşerê
Em vexwin ji destê te ava ĥewdê kewserê
Meke riswa ummeta wî şahê tu li wê derê
Hem şef`etê bikî li ummeta wî rehberî

Bi Ebû Bekir û `Umer û `Usman û `Elî elmurteda
Me şewtîne bi arê xwe dîsa yewm el-ceza
Çi qedir û qîmet te da vana kirin dewlet sera
Tac û rif`et dan serê xwedan ĥurmet keza

Seba xatirê şeş heval û çar yarên mistefa
Siba li meĥşerê ummetê meke cûr û cefa
Kes ji dest vê felekê qet nedî ebed wefa
Bike layiq reĥmeta xwe hew bikin zoq û sefa

Telĥa û Se`id û Se`îd we hum Zubêr lawê `Ewwam
Lawê `Of Ebû `Obeyde hew xwedan qedra humam
Pir cefa dîn li cîhanê seba xeyr el-enam
Daye mizgîn wa xwedayê cenneta `alî meqam

Ez dinalim bi şewata Ĥemzeyê pak û delal
Bû şehîd hew pehlewana seba fîdayê heval
Navûdengê wî li sirsir biderket vê mîsal
Go apo ezê ĥeyfa te rakim hem pir kemal

Kanî `Ebas bû dîsa birayê Ĥemze Pehlewan
Her du apê Mihemed Mistefa bûn fexrê cîhan
Pir zeĥmet kişandin li rêka şer`ê heman
Gişti çûn darî beqayê yek nema el-bette ji wan

Ĥedret Fatîme El-zehra bû fedla nîsaa
Hem Xedîce `Aîşe dayîka mumina dîsa
Nav û şanê wan belav wek navê dayîka `Îsa
Heq te`ala qedir û qîmet dabûn xeyr el-nîsa

Vemekin kul û birînê roniya çavê Resûl
Her du bûn şahê şehîdan çêkirê Fatme betûl
Jehra qatil dan Ĥesen dayîka wî kirin melûl
Hem Ĥusên kirin şehîd emrê barî kir qebûl

Ca Ĥusên şehîd bû li miha Meĥremê
Deri vekir kul û birîna wî xwedanê Zemzemê
Dagirîn ĥorî melek ĥeya bi lioĥ û qelemê
Ins û cin weĥş û teyr û hem wê çaxê ket meitemê

Çaxa ew şaha li deşta Kerbelayê bû mîvan
Hatine ser avê Xewarêc kes ji wana bernedan
Ĥeya ji te`na re şewitîn ĥalê wan bû perîşan
Kulfet û `erd û `eyalê xwe li meydanê we man

Encamê dajote ser avê Ĥusên şahê gezîn
Dîn firset Xewarica hicûmê kirin hemîn
Derbekê bi tîrkevên kirin birîn
Ins û cin him `erd û `ezman û melek giş dagirîn

Çaxa ket bi wê birînê ma li deşta Kerbela
Ajotin ser wî şahî hanîn serê derd lû bela
Kirin şêst û sê birîn bi tîrkevên wan ewwela
Xêrî çel sê derbê şûr li wicûdê wî mubtela

Qutkirin serê şahê el-wera kirin şehîd
Rohniya çavê resûl bi emr û fermana Yezîd
Çi kirin wan zalima wijdan û şefqet bûn belîd
Ya îlahî ji dîwana xwe wana bike be`îd

Pir cefa û pir bela û ezîyyet pê kirin
Kulfet û `ered û `eyalê Mistefa wan xorkirin
Bejin û balava wî şahî kirine xwînê sor kirin
Ji şefa`eta Mihemed Mistefa xwe dûr kirin

Bîst ev ĥala ketin reşî giş ehlî cinnetê
`erd û `ezman wê rojê pevda ketin zulmetê
Xelk û `alem dagirîn bi ĥiznê ketin ĥeyretê
Jan kirin wana got hev roya qiyametê

`Erd û `ezman seba wî şahî xêre nebin melûl
Hewa lawê ȟedret Fatîme El-zehra ya betûl
Him hewa sebta Mihemed rohniya çavê resûl
Ya îlahî mirazê me `aciza bike qebûl

Ez ĝulamê we me hatim dergeha te ey eȟed
Siba me li meȟşerê ya reb ji van meke cuda
Ger tu me qebûl nekî xêrî te emê herin kûda
Miȟtacê reȟma te ne em li rêka te canfîda

Can bi qurban xandanê ȟedret fexrê cîhan
Em giş miȟtacê şefa`eta wî ne her zeman
Pir selat û pir silaman dixwînim li rûȟê wan
Dil şewat û dil ȟezîn im ya îlahî el-eman

Pir menale derwîşê min kurdekî nadane tu
Bi arê eşqê dilê xemgîn bike perwane tu
Kî zane Minle Elê xweş şaj`irekî kurdan e tu
Bi `eşqa wan xwe bişewtîne wekî merdan e tu
***

## Munacat

Îlahî `asî kêmtr im xêrî te ezê kûda herim li ber kîjanî bigerim
pirguneh û ustuxar im
xweda ez dikin ricayê tu `afkî curim û xetayê me qûlî li vê dunyayê
xwedayê perwer digarim
Ĥalê min ji te va `eyan e ne ĥacet e bikim beyan e tu ye mu`în û miste`an e
Ez `aciza gunehkar im
Xêrî dergeha te ey xweda tuneye ez herim pêda bi şev û ro di dilê min da
Min `afke ey kerûkar im
Xelaske min ji vî `ezabî xwe, tu li roya ĥesabê xêrî reĥma te çare nabe
Pir di`îf û pir neçar im
Siba li roya meĥşerê bi rastî me de defterê qolay bike li wê derê
Te got star û ĝeffar im
Va qûlî bêçare gida ji Mistefa meke cuda canê mim li rêka we fîda
Bi `eşqa wî kizmetar im
We nefs dabû me esîr bi ĥalê min tu ye besîr ey barî tu ye destgîr
Rû siyah û şermesar im
Cefayê min meke teba bi lutfê xwe ey padîşah riswa meke min ya îlah
Pir qusûr û pir ewzar im
Te çêkiriye ĥey ĝenî ez qûla jî qetra menî ez hatim dunyayê bi wê
Destboş im ew ey keremkarê min
Selat û selamê Barî li ser Mistefa bibarî Al-esĥab û ensarî
Vê ĥed ya rebî berwar im
Ez im Minle Elî neçar bi şev û ro dikim hawar tu meĝfîretkî min ĝeffar
Gunehkar û dîsa har im

***

**Munacat**

Ya rebî ya reĥman    tu yî xwedan îĥsan    him `efû him ĝufran
ya xaliq el-ekwan

Şukir hezar carî    ji te re ey barî    tim subê û hêvarî
ya ĥeq û ya deyyan

Bi ĥeqê pêxember    bû ji min re serwer    te şand ew rihber
canê min bi qurban

Li miĥşerê xweda    min ji wî meke cuda    di bin senceqa wî de
ĥeşirke ya reĥman

Bû eşrefê giya    mefxerê enbiya    bi nûr wî bû diya
him `erd û him `ezman

Ser wî selat Ellah    alî resûl Ellah    bû xeyr xelq Ellah
hate jê re Quraan

Minle Elî hatî    dîwana te zatî    iĝfêr xetîyatî
ya rebî ya reĥman

***

**Munacat**

Îlahî bi Mihemed Mistefa `afke gunehên min
de`îf pir gunehkar im ji ummeta wî zatî me
îlahî meĝfîretke min esîrê xanedan im ez
bi Ebû Bekir û him Farûq bi Zî El-nûrên hatime
îlahî him bi Murteda bi Ĥesen û Ĥusên Rida
bi xandanî we bûne hewna sadatê me
îlahî mucrim im kêmtir meke cuda ji pêxember
bi Qasim û Zêneb bi Rûqeye û Fatîme
îlahî `aciz im geda tu `afkî sûcê min xweda
bi Um Kelsûm û Ebdella bi Îbrahîm xatîme
îlahî sed hezar selat wîne li serwerê pakîzat
Al û esĥab û zirrîyata fexrê kaînatê me
*Binir Minle Elî ya reb de`îf û `aciz û neçar*
*Bi firyadê dike hawar bi dest te de beratî me*

***

**Munacat**

| | | | |
|---|---|---|---|
| Hatim dîwana | te ya xudanê | kewin û mekanê | sed hezar meded |
| Dikim ricaya | ji te xweda | `afke xetaya | sed hezar meded |
| Ez perîşan im | pir bi niqsan im | eye siltan im | sed hezar meded |
| Ez rû siyaha | hatime wergaha | te xweda niha | sed hezar meded |
| Pir dikim hawar | `afke ey ĝeffar | bi navê settar | sed hezar meded |
| Hevê bêçare | pir gunehkar e | pir sûc û har e | sed hezar meded |
| Minle Elî can | bi ah û fîĝan | ya rebî derman | sed hezar meded |

***

## **Munacat**

Bi erebî ye

***

**Îlahî sellî we sellêm `ele şefî`îne Taha**
**We al sûmme welseĥib selat îla yeum el-dîn**

Îlahî sed hezar şikur hane bû emir û fermana te
ya rebî ez im dîsa xudanê curim û `isyanê
Tu nizanî pir perîşan im nikanim ez teĥmûlkim
eger li kul û derdê min nekî tu derman e
Şewata min kûr e ya reb ji sebrê de de`îfim ez
tu kê loma nekî min dest pê kir bi zar û giriyanê
Ji berê û paşê de karê me ah û ĥesret in ya reb
dixwînim ta wekî bilbil li nav baĝ û gûlistana
Hezar ehlen we sehlen ji belayê te re ey barî
meşewitîn min bi vî arî sêfîl im pir perîşana
Ĥelandim ez va barê pir giran rake bi fedla xwe
temaşeke ah û firyadê min çûn qatî `ezmana
Qeda û her belayê te li ser serî li ser çava
ĥeya ro tim derê ava dinalim ez bi nalana
Wekî ĥedretî Eyyûb qayîl im bi her cefayê te
min rûyê xwe axir da li dergeha te siltana
Dirêjin hêstirê çavê min bûne wek gola xwînê
sê zaro mane li şûnê ji dayîkê de yetîm mane
Mirazê min hev e ya reb tu `umrekî dirêj pêdê
nebînin ĥeya ez xweş im şewat û êşa vana
Sedaya wan her carê tê min çaxê dibêjin anê
dişewtîne dil û canê min ah û nalîna wana
Dixwazin ez ji te barî meşewtînî kes bi arê
heval cîran tu carî meke ser dîl û izmana
Dilo axir zeman e hev em li tobê roj û şev
saqin ber bayê kesî mekev, meşewtîn xwe bi fîĝana
Me va ji xwe re nekir bar, ca şorê xelkê şêr mirdar
her roj min dike axa sar bûme ez wekî dîwana
`eceb xelkê ji min xêre nizanim ez çi bêjim jê re
va xelkê cahil wena dan kirim ez şûnê nezana
Hezar el-ĥemdulla ji te re vî xwedayetê min
rica dikim ji xew rake ji ĝefletê dilovana
Li dergahê dinalim ez heroj bi xem xeyal im ez
de`îfim pir webal im ez tu `afkî sûc û niqsana
Binir li derd û şîna wan bi şev û ro dikin firyadan
bike Minle Elî şadan dixwazî `efû û ĝufrana
Temam dikim vê xweşxanê bi selat û bi selaman
li ser wî fexrê cîhan al û esĥabê zî- şan

Selat û bi selama ve li ser pêxemberên me    bi qedrê hêstirê çava qedra pişkê barana

***

| | | |
|---|---|---|
| Can û cîger ĥelî cana | ji dest van derd û van jana<br>meqewtîne min xweda ya reb | hatin ba te dilovana |
| Bi eşqê dilşikestî me | bi meraqan rawestî me<br>meşewitîne min xweda ya reb | de`îf im zar û mestî me |
| cuda bûm ez bi vê janê | ji me`şûqê xwedê zanê<br>feqîeê min xweda ya reb | talan kir vî dil û canî |
| xweda Minle Elî dîn bû | bi vê sewdayê xemgîn bû<br>tu `afkî min xweda ya reb | bi eşqê wekî şêrîn bû |

**Munacat**

Îlahî qûlekî him de`îf him perîşan im
xêrî zimanê Kurmancî bi dîlê kesî nizanim
Bi dest min de heva maye meraqa dil pê datînim
bi eşqê sebra xwe tînim toniyê `ilm û `erfan im
qusûrê min pir in meşewtîne min bi arê xwe
feqîr û pir ĥeqîr im ez hatim dergahê silatan im
bi qedra ĥalê xwe bawerkim ji can û ji dilbera
can û cîger heman kulda kanî dermanê Luqman im
di nav bax û gulistanê cîhanê de gulên min zer bûn
kul û derdê me bûn hicran esîrê zar û nalan im
va dinya fanî pir xweş bû eger mirin tuneba lê
ji dest wê herkes şaş bû di nav de ez ĥeyran im
mirin boş e bila kes şanebe bi darê dinyayê
giş boş e berd e sewdayê jê ĥez meke dil û can im
xweda va qûlê cahil ji xew rake meke ĝafil
li dergahê bûye sail nexwaş im kanî derman im
bi destê vala hat Minle Elî meĥrûm meke ya reb
qebûlke va munacata xudanê curim û `isyan im

***

Îlahî va dilê xemgîn siĥir gihan qe xew nake
Bi jan û ĥesreta eşqê dilê min jar û xemnak e
Nizanim ez nexweşê dil dinale tim wekî bilbil
Bûme esîrê jan û kul ya rebî heva çi sewdak e
Çi derdekî giran hev, ĥelandim ez bi roj û şev
Nexweşîk wek wêran e hev bi min mirin cak e
Ezê bimirim bi vî derdî bi dilxweş û bi comerdî
Meşewtînin derwêş kurdî vî barê pir giran rake
Hev derdê Zelîxayê û him Mecnûn û Leylayê
Tû dermankî derdayê li vî derdî çare nake
Hev derdê Mem û Zînê kula Ferhad û Şêrînê
Bi vî derdî cîgerxwîn me şewitî derdekî pak e
Bi vî derdî Niyazî çû Yûnis bi vî mirazî çû
Nesîmê serfirazî çû dilo xêre tu deynakê
Va derdê aşiqa ne bi dest wana de surr maye
Va derda te xweda daye? Dilê min xêre tu şana ke
Bi eşqa te dikim nalan can û mal min kir talan
Dinalim bi meh û salan me bi ummeta Mistefa ke
Tu selat û silaman her werîn li rûĥî pêxember
Al û esĥaba serteser li rûĥê enbiyana ke

Bes Minle Elî ey can bi eşqê xwe bike qurban
Birêje yaqût û mircan zati `alem te nasnake
***

Karê min nalîn û zar e    xwedayo tu keremkar e    lê derdê min kanî dar e
mame `aciz û bêçare
Va dunyayê dinê canê    min kirî ȟebs û zîndanê    vê zalimê vê wicdanê
Çî ĝeddar e û çi makir e
Ji dest weswasê şeytanî    biderxîn tu vê dîwanê    xêrî te kes pê nikanê
Çi va dijminekî har e
Hele va nefis emmar e    çi ejdirhakî bê `ar e    îş û gûcê wî giş xar e
Şerê xwe pirî dijwar e
Ji ber va dijminê zalim    perîşan bûye pir ȟalê min    esîr mame haqas sal im
Xwedawenda tu ĝeffar e
Gunehê min paşi netên    dil û cîger bi şewat in    bi giriyan çav biderhatin
Bizane dil birîndar e
Bi berger û munacat    li ber qadî ȟacata    dixwazin `af û berata
Xweda can pir gunehkar e
Ji nav `Eşîreta Biya[2]    de`îf û muȟtacê giya    hatî dîwana kibriya
Cîger pir ahîn û zar e
Minlekî zar û nadan e    bi serf û neȟwê nizane    di nav xelkê de nihan e
Zelîl û pir şermesar e
Ji ber Zoyê Gira[3] ye hew    qûlê reb el-wera ye hew    esîrê macera ye hew
Ji vê dunyayê dilsar e
Selat û min selam hanî    li ser wî fexrê cîhanê    rûmahê can bi qurbanî
Wî şahê pir kermkar e

*Binal Minle Elî hercar    bi firyad û fiĝan û zar*
*Heya gorî bike hawar    bi eşqa rûyê dildar*
****

Bi min ket agirê eşqê    dinal im ez bi wê şewqê    dîwane bûm bi wê zewqê
De`îf û pir webal im ez
Helandim ez kirim pir yan    siȟirgihan dikim giryan    dil û cîger ya reb xeliyan
aşiqê pir kemal im ez
Ĝerîb im ez wekî bilbil    dixwînin ĝence nabin gul    kanî derman yaman bû kul
Xeda vê heval im ez
Gul û çîçek li min borîn    bi ah nalîn û lorîn    bi cemala te a narîn
Bi şev û roj dinalim ez

[2] :Mille Elî ji Eşîreta Biya bû. Ew yek gelek caran hatiye.
[3] . li nav çiyayê dever Bilbilê du sirtên bilin hene, yek bajarokê Bilbilê li ber e, yên din jî li ba gundê Bêkê ye. Ji wan her du giran re (Zoyê Giran) tê gotin.

De`îf û mest û ĥeyran im   bi eşqa şahê xoban im   nexwaş im kanî dermanêm
Vê mal û vê mewal im ez
Li derdê min binir cakê   tu xêre çarê lê nakê   ĥeya ez dikevim xakê
Esîrê xem xeyal im ez
Bi lutf û kerema barî   xelaske min ji vî arî   bi ser de reĥmê bibarîn
Miĥtac reĥma delal im ez
*Vê sed Minle Elî guneh kirî ya reb îlah*
*Keremke `afke min feqîr im vê ĥal im ez*

Cîhan bû wek şeva tarî   li pêş çavê min bêçarî   hawar dikim meded barî
Meded ya reb meded ya reb
Hatim dergaha te zî-şan   bi `efwê min bike ĝufran   tu yî reĥîm tu yî reĥman
Meded ya reb meded ya reb
Li sûcê xwe poşman bû   halê xwe jar û yaman bû   çi derdekî vî derman bû
Meded ya reb meded ya reb
Bi ĥesretê dikim feryad   ji dest gunah bûme berbad   çi derdekî vê derman bû
Meded ya reb meded ya reb
Ji çavan hêstirê min tên xwar   li dergahê dikim hawar   tu `afkî min tu yî ĝeffar
Meded ya reb meded ya reb
Vê sebir û vê qerar im ez   ji dîwana te nar im ez   de`îf û ustuxwar im ez
Meded ya reb meded ya reb
Bi reĥma xwe xwedayê pak  mewşetîn min meke ĝemnak tu kes neqewtînî ĥaşak
Meded ya reb meded ya reb

*Bixwaz Minle Elî yê dîn   mirazê xwe bi zar û şîn*
*Reĥîme ji te re mizgîn   Meded ya reb meded ya reb*
***

**Pesna fexrê `alem salla Ellah `eleyhî we sellem**

Ez bi qurban cemala te Mihemed ez bi ĥeyrana kemala te Mihemed
Berî ez te bibîn `işq û şewqên te bi canê min kar kir pir Mihemed
Dînê tu pê hat çî musteqîm e ji eşqa te re canê min seqîm e
Cemala te ji derda re ĥekîm e ez bi qurban şemala te Mihemed
Tu yî eşrefê xelkê va cîhanê tu bû pêxember axir zemanê
Qedra te pir bilind xwedê zanê va cana fîdayê te Mihemed
Xwedê bi te re go lewlak lewlak min ne danî wicûdê `erş û eflak
Seba xatirê xwedan exlaqa pak `erd û `ezman çêkir Mihemed
Tu meĥmûd û miĥemed mistefa yî şefa`eta te li derda şefa ye
Va pêçara qûlekî pir xeta ye bi deste gêrê qete ya Mihemed
Çi derman e xakpaya te şahî xwedê kir pesna te pişt û bînahî
Li roja meĥşerê va rû siyahî meke riswa ĥebîbê min Mihemed
Hatim dergeha te ey fexrê `alem bi eşq û şewqa te şahî dinalim
Esîrê xanedanê pir kemal im tu ye rohniya çavê min Mihemed
Tu ye şefî`ê ummeta gunehkar kanî şef`atê ey pir keremkar
Keremke em bûne `aciz û bêçar dixwazin em şefa`etê Mihemed
Bi nûra te cîhan tevde bû rewşen nav û şanê te rûnahî sî xweş in
Binir ĥalê me jar û destê boş in qusûrê me tuyê `afkî can Mihemed
Va dar û ber kiş bi qelem bin va deryana bitûn giş bi merkeb bin
Gî ins û cin eger hew bi katib bin nikanin pesna te yazmîşkin Mihemed
Bi hezaran selat û pir selama li ser te li ser esĥabê kîrama
Li ser pêxember û rusulê `îzam tu ye serwerê enbiya Mihemed
Taha Minle Elî pir ustuxwar e bûye mucrim û `asî aşkare
Nexwaş bûm ez bi eşqê kanî çare şefa`et sed hezar hawar Mihemed

***

**Ne`ta resûl**

Hate der nûra te Ehmed
Wek cemala te Mihemed
Hêv û ro tu yî Mihemed
Tu ĥebîbê me ye emced
Tu yî Taha tu yî Yasîn
Tu yî ĥa mîm tu yî ta sîn
Tu yî tahir tu yî mixtar
Ji nûra te hatine enwar
qedra te `aliye meĥmûd
tu yî meĥbû tu yî meqsûd
ya Mihemed ya ĥebîbî
tu wesîla min ĝerîbî
ez bi qurban xakpayê
tu bû meĥbûbê xweda yî
bi hezaran ya Mihemed
bi şev û roya Mihemed
şa bike Minle Elî tu
bi eşqa te hew her çû

hêv û ro xwe kir nihan
kes nedî fexrê cîhan
nûra te da `alemê
tu xudanê zemzemê
tu îmam el-qubletên
tu yî ced el-ĥesenên
reĥmeten lîl- alemîn
ya şefî`e el-muznîbîn
da te wî fedil û kemal
tu xudan ĥusn û cemal
ya îmam el-enbiya
ya sîrac el-ewlîya
ye resûl Ellah aman
ez li dorê el-eman
esslat û esselam
ser te û alê kîram
ya şefî`ê ummetê
dixwaze şefa`et

***

**Qesîdet istîĝfar**

| | | | |
|---|---|---|---|
| Tûbû île Ellah | ya `îbad Ellah | esteĝfîrû *Ellah* | esteĝfîrû *Ellah* |
| Sibê êvarê | bîr meke barî | bi hezar carî | esteĝfîrû *Ellah* |
| Bi şevê rabe | bawer xweda be | hewa tewwab e | esteĝfîrû *Ellah* |
| Mebir amîd | xwe tu ji xweda | dermanê derda | esteĝfîrû *Ellah* |
| Bi istîĝfarê | reĥmet wê bibarê | bi ah û zarê | esteĝfîrû *Ellah* |
| Bermede vayî | li vê dunayayê | dişo xetayê | esteĝfîrû *Ellah* |
| Tobeke bira | birêj hêstira | bes e ji te re | esteĝfîrû *Ellah* |
| Heva derman e | curim û `isyan e | te li cîhanê | esteĝfîrû *Ellah* |
| Kî tobe nake | ji wî ĥez nake | hawar xwedake | esteĝfîrû *Ellah* |
| Reĥma wî zatî | qe paşi netê | li munacatê | esteĝfîrû *Ellah* |
| Muiminê kamil | qe nabe ĝafil | bermede `aqil | esteĝfîrû *Ellah* |
| Tobe istîĝfar | kelleyl we el-nihar | ya reb sed hezar | esteĝfîrû *Ellah* |
| Ez pir guneh im | hem rû siyah im | pişt û pinah im | esteĝfîrû *Ellah* |
| Bi gî qusûra | hatime ĥidûra | te û ĝefûra | esteĝfîrû *Ellah* |
| Ji gî xetaya | tobe xwedaya | dikim ricaya | esteĝfîrû *Ellah* |
| Vê ĥed selewat | ser wî pak zat | fexir kaînat | esteĝfîrû *Ellah* |
| Ser enbiya be | al û esĥaba | wana giya be | esteĝfîrû *Ellah* |
| Tobe îlahî | ji her gunahî | bi ah û ahî | esteĝfîrû *Ellah* |

*Minle Elî xoş*    *nefsa mefrûş*
*Mere dest boş*    *esteĝfîrû Ellah*

***

**Qesîda tewĥîd şerîf**

| | | |
|---|---|---|
| Xwedakî vê mîsal e | xudan fedl û kemal e | reĥîm û vê heval e |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| kî ji xwedê bixweze | digîne her mirazî | her bike niyazî |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| zikirke wî reĥmanî | li vê dunyaya fanî | bîr meke wî sibĥanî |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| `umrê xwe li bê hûda | mede, zikir ke xwedê | xweş e ji zikir û tewĥîdê |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| dilê hezîn şa dike | pak û nûranî dike | muimina xelas dike |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| derdixe ji zulmet | dike layiq reĥmet | mera dike cinnet |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| bi ro jî bibin saim | bi şevê bibin qaim | ehil ĥeq dibîn daim |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| lê hay dike ji xabê | mera dike hew ĥicabê | bike xêr û sewabê |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| serekê gî mirada | lê binir zikra xweda | canê xwe bike fîda |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| efdelê zikrê heva | ku ji me re Mistefa | ji gî derda re şefa |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| çava dike ronahî | zikra wî padîşahî | xweş navê xwe îlahî |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| eger tu kê îmanê | hevalkî li va canî | her bixwîn Quraanê |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| giran e li mîzanê | xelas dike va canî | min dûrxe ji nîranê |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| ger tu kê dikan şakî | layiq reĥma xweda kî | bi aşiqê be tu cakê |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| xwedayê xwe bîr meke | tewĥîdê înkar meke | zikrê wê xweş seke |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| hev zikra enbiya ye | ji cana re şifa ye | me`bûdê me giya ye |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| cana dike nûranî | zikra wî ĥeq yezdanî | can bi qurban wî canî |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| pir bikin ĥemd û sena | ban wî kin bên rebûna | cana dikê roşna |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| zikra wî xweş û delal | bermede bi meh û sal | derwîş nadan binal |
| | la îlahe îlle Ellah | |
| pir selat û pir selam | ser rûhê `alî meqam | Mistefa xeyrûl enam |

la îlahe îlle Ellah
*canê xwe Minle Elî bi zikrê biĥele*
*tim bixwîn bi vî dilî la îlahe îlle Ellah*
*****

**Pesna fexir `alem û çar yarê gezîn û xandanên kîram**

Serwer û şefî`ê min fexir `alem Eĥmed e
Mistefa û mucteba be hew e meĥbûbê xweda
Li rêka eşqa wî şahî canê min qûlî fîda
Serwerê `alem Mihemed Mistefa ye Mistefa
Yarê ĝarê şahê kewnên Ebû Bekir wefa
Taha hew kir sedîqê xwe bû xwedan sidiq û sefa
Pir kişand li rahê şer`ê vê şîkayet û vê cefa
Serwer û him şahê min e, him çar yarê Mistefa
Yek jî `Umer e meşhûr e bi `edalet
Xelk û `alem hanî der ji şevreşa û delalet
Qeyser û kîsra ketin ji textê xwe bi heybet
Serwer û him şahê min e çar yarê Mistefa
Yek jî zû el-nûrên taban ĥedret `Usman e hew
Wî rakir fisq û cehalet camî`ê Quraan e hew
Xudanê ĥilm û ĥeyayê kamilê îman e hew
Serwer û him şahê min e çar yarên Mistefa
Yek Elî El- Murteda ye hew şahê dil çil sîwaa
Kî di heybeta şûrê wî gotin vê (?)
La fete île Elî la seyfe île zûlfîqar
serwer û him şahê min e çar yarên Mistefa
bi xudan ĥemla giran ĥedret Ĥemze behlewan
bû şehîd li çayî Uĥud hew ayê fexrê cîhan
Ĥedret `Ebbas pak e xudanê derba giran
Serwer û him şahê min e apê pak Mistefa
Wer xudan exlaqa pak û şahê Zênilabîdîn
Ew Mihemed Baqirê qedra bilind siltanê dîn
Ce`fer û Sadiq îmamê me Mûsa Kazim hemîn
Serwer û him şahê min e xanedanî Mistefa
Me`denê cûd û comerdê ye Elî Mûse El-rrida
Him teqî û ba neqî mezherê xelk rida
Ez qurban xandanê Mistefa û Murteda
Serwer û him şahê min e xandanî Mistefa
Yek îmam e `Eskerî ye şahê salar cîhan
Yek Mihemed Mehdî ye rihber e hew saĥêb zeman
Ez li dora xakpaya we gîya bim her zeman
Serwer û him şahê min e xandanî Mistefa
Kî ji vana gîya ĥezke dibe layiq reĥmetê
Kî bi rêka van de here nabîne hew zeĥmetê
Kî ji van ĥezneke hew meĥrûme ji şefa`et

Serwer û him şahê min e xanedanî Mistefa
Kanî hew zatina ey ĝafil bes e ji xewa rabe
Bermede tu rêka wan saqin dîsa cahil mebe
Hev dunya fanî ye ĥeyran ji tirba têr nabe
Serwer û him şahê min e xanedanî Mistefa
Pir selat û pir selam li ser rûĥê nûr el-huda
Ser al û esĥab û ensarê wî meĥbûbê xweda
Ya îlahî me ji van gunekara meke cuda
Serwer û him şahê min e xanedanî Mistefa
Ez ricakarê şefa`eta vana me ya îlah
Pir xeta û pir qusûr im pir de`îf im û pir guneh
Ey Xweda Minle Elî me dilşewat im rû siyah
Serwer û him şahê `alem Mistefa ye Mistefa

***

## Ne`it Şerîf

Ya ResûlEllah de`îf im pir ĥeqîr û pir neĥîf im
`aşiqê rûyê şerîf im sed hawar û sed meded
Ya ResûlEllah ĝerîb im nexwaş im ez vê tebîb im
`aşiqê rûĥê ĥebîb im sed hawar û sed meded
Ya ResûlEllah zelîl im vê kes ez pir melûl im
Aşiqê rûyê xelîl im sed hawar û sed meded
Ya ResûlEllah gidam e pir qusûr û pir xeta me
Aşiqê rûyê Taha me sed hawar û sed meded
Ya ResûlEllah ya hadî bike meqbûl vî miradî
Vî qûlî bi lutuf şadî sed hawar û sed meded
Tu yî meĥbûbê Îlahî serwerê wî padîşahî
Ez bi qurbane te me hey sed hawar û sed meded
Şewqa te da vê cîhanê wek hêva asîmanê
Serwer û axir zemanî sed hawar û sed meded
Rojê hezaran selewat ser te be ey pakîzat
Tu ji boyî reĥmetê hat sed hawar û sed meded
Meke pir Minle Elî zar ew kes nakê şermzar
Ew şefî`ê me ye her car sed hawar û sed meded

***

Bi barê pir giran hatim dîwanê ya resûl Ellah
Rewa bike tu ĥacetim şefa`et ya resûl Ellah

> Hezar şukir û sena em bûne ummeta te zatî pak
> Keremke min meke xwar û xecalet ya resûl Ellah

Xweda te reĥme lîl-`alemîn şandî ĥebîbê min
Bûme ez pirguneh û pir qebaĥet ya resûl Ellah

> Dilê min dixwaze Ke`be ya `alî meqam cakê
> Bibînin hîn bi xweşî be ya resûl Ellah

Ji wê şûnda meraq û ĥesreta dilê min ê xemgîn
Herim te şahî ez ziyaret bikim ya resûl Ellah

> Meqewtîn vî qûlî `aciz li ber wê xakpaya xwe
> Bi mîvan ez kanî lutf û `înayet ya resûl Ellah

Wa ĥeca kir bibe mebrûr û se`ya me bibe meşkûr
Gunehên me bibin meĝfûr ya resûl Ellah

> Mirazê me hev e ey serwerê `alem bi lutfa xwe
> Binir vî kêmtirî `afke şefa`et ya resûl Ellah

Ĥalê Minle Elî pir de`îf û pir perîşan e
Ji te da ger nebî jê re hîdayet ya resûl Ellah

***

| | | | |
|---|---|---|---|
| Nûra te şêrîn | wek hêva `ezmên | şewqê da zemîn | ya resûl Ellah |
| Tu ye ya emced | Meĥmûd û Eĥmed | sed hezar meded | ya resûl Ellah |
| Ji dûrwelata | tên ziyareta | sed hezar meded | ya resûl Ellah |
| Qudreta te Taha | `alî ye şaha | tu çû dergaha | ya resûl Ellah |
| Tu bû siltanê | xelkê cîhanê | gî ins û canê | ya resûl Ellah |
| Tu afta be | `alî cenab e | canêm fîda be | ya resûl Ellah |
| Hew xakpaya | te bû şîfaya | derd û belaya | ya resûl Ellah |
| Miĥtac e ummet | bike bi himmet | li wan şefa`et | ya resûl Ellah |
| Ey padşah im | ez pir gunah im | him rû siyah im | ya resûl Ellah |
| Lewlak lewlak | çêne dibû eflak | seba zatî pak | ya resûl Ellah |
| Tu yî wesîla | me `asî qûla | bavê betûla | ya resûl Ellah |
| Jê ĥeq dixwazim | ez bê niyaz im | tu ye mirazê min | ya resûl Ellah |
| Hezar selewat | li ser te ey zat | fexir kaînat | ya resûl Ellah |
| | *Minle Elî wer* | *xwe bike mikter* | |
| | *Canê pêxember* | *ya resûl Ellah* | |

| | | | |
|---|---|---|---|
| Hate der nûra | te xeyr el-wera | şewqê da dera | serwer Mihemed |
| Ji nûra te sek | bûn gul û çîçek | şefî` im vê şek | serwer Mihemed |
| Şewqa te derket | xêr û bereket | hate ser ummet | serwer Mihemed |
| Bejin û balava | te wekî hêva | qe narê ava | serwer Mihemed |
| Ebrû hilal e | bê xet û xal e | tu pir kemal e | serwer Mihemed |
| Nav û nîşanê | te li cîhanê | çû asîmanê | serwer Mihemed |
| Ey pir şefa`et | Minle Elî ket | rake bi himet | serwer Mihemed |

***

| | | | |
|---|---|---|---|
| Navê Mihemed | çi xweş şêrîn e | bejina te Ehmed | çi nazenîn e |
| Binir cemalê | te pir kemalê | wekî hêva | li asîmîn e |
| Wekî te zatî | `alî sin`etî | qe kes nehatî | rûyê zemîn e |
| Can biqurbanê | tayê riĥanê | bejin û nîşanê | te yasemîn e |
| Şems el-duĥa ye | bedir el-duca ye | nûr el-huda ye | Taha el-emîn e |
| Tu `alî şan e | `enber fe şan e | rû derxeşan e | şahî medîn e |
| Ey pirşefa`et | miĥtac e ummet | ji cûr û miĥnet | me bi derîne |
| Sibê êvarê | bi ĥezar carî | selata barî | li ser werîne |
| | *Minle Elî hat* | *bi kul û şewat* | |
| | *Dixwazê berat* | *bi zar û şîn e* | |

***

Bi qurbana wa navê te û şêrîn bim ya resûlEllah
Bi ĥeyran wan çavê te û narîn bim ya resûlEllah
Cenab ĥeq te reĥmet da ji xelk û `alemîn
Dixwazim ez şefa`etê xelas bim ya resûlEllah
Tu yî şahê gî pêxember hatin darê dunyayê
Birin hêv û ro ji rûyê te ya resûlEllah
Li ser kes tuneye ya Mistefa şewq û şemala te
Nehatî kes wekî te qet ne jî tê ya resûlEllah
Bitûn `alem bûye qurban e wê ĥusin û cemala te
Te `alem derhanî ji kifir û şer gî ya resûlEllah
Cîhan çênedibû ger tu nehatiba vê `alemê
Seba xatirê te çêkir wî xwedayî ya resûlEllah
Va `erş û ferş û hêv û ro hanî wicûdê ey şah
Bitûn çerx û felek hatin ji nûrê ya resûlEllah
Şeva mi`racê tu derket çû seyrangahê `ezmana
Ĥeqîqet qabe qewseên te tewaf kir ya resûlEllah
Nîda kir wî xwedayî merĥeba go ĥebîbê min
Tu yî eşrefê xelk û `alemê gî ya resûlEllah
Tu yî şevê bi xwedayê xwe re ket mikalemê
Çi dewlet çi rif`et ji te ra ya resûlEllah
Bi te re got ya Mihemed bitûn va kaînata min
Seba te hanî wicûdê zanibe ya resûlEllah
Xêrî te kes cemal û bi kemala ĥedret barî
Neda bi çava tu yî meĥbûbê wî ya resûlEllah
Wî da te dewleta şef`etê seba gunehkara
Tu bû dermanê derd û kulê min ya resûlEllah

***

Ger tu kê herî Ĥîcazê bîr meke bayê sîba
Pir selat û pir silaman bixwîne li ser mucteba
Can bi qurban xakpayê ke eya bayê seĥer
Bi eşqê bêje ya resûlEllah hezaran merĥeba
Merĥeba bêje ne ji te ba çerx û felek çê nedibû
Merĥeba bêje serwerê pêxemberan merĥeba
merĥeba bêje şewq û şemala te da `alemê
merĥeba bi menbe`a şan û şerefê merĥeba
merĥeba bi reĥmet lîl`alemîn tu hat ĥebîb
merĥeba bêje ey xudan lutf û kerem pir merĥeba
her tu çû lêke silavan ji me da her weqtî

ser al û esĥab û ensara bitûn al `eba
bêje seba Minle Elî şewitî bi eşqa te şêrîn
dixwaze şefa`etê hew can bi qurban <u>dilreba</u>

***

Derket şewqa rojê ji ĥusin û qameta wî
şewqê da va `alemê nûra şerî`ta wî
Hev kaînata seba xatirê wî hate wicûdê
ins û cin û teyr û wiĥi ûş xelq bû bi ĥurmeta wî
hew tuneba nedihat wicûdê hev `alema
`erş û ferş û hêv û ro hatin bi kerameta wî
Bi navê wî şêrîn du`a kirin enbiya
Hew gihîştin mirazê xwe bi şan û rif`ta wî
Bi ĥurmeta wî xweda bi dîdara te û pak
Şa bike me `aciza bi rûyê telî`eta wî
Bi lutf û kerema ya reb tu me riswa meke
Layiq reĥmeta xwe ke em bikin sinneta wî
Îlahî yardimke tu li îslama her zeman
Meĥrûm meke me gîya tu ji şefa`eta wî
Hezar selat û selam ser rûĥê xeyr el-enam
Al û esĥabê kîram hevalê hicreta wî
Li ser gî pêxembera al û esĥab wan re
Li ser her çar yara li ser gî ummeta wî
Minle Elî dixwaze pir dike hew nîyazê
Cakê here Ĥîcazê bike ziyareta wî

*Tu qadî yê ĥacatî dikim ez munacatê*
*Bi dest te da necatê `afke bi ĥurmeta wî*

***

## Mihemed Mistefayê me

Werin kî aşiqê wî ye werin kî miştaqê wî ye şefa`et layiqê wî ye
Mihemed Mistefayê me
Binir rûyê xwe pir nûr e hemî sêv û hemî sor e cemala xwe vê qisûr e
Mihemed Mistefayê me
Binir çava çi siyah e li her dunya padîşah e li rûyê ezmana mahe
Mihemed Mistefayê me
Binir ebrû hilalî ne binir lêva zelalî ne bejin balav kemalî ne
Mihemed Mistefayê me
Binir dirana încewîn e bi ken şewqê daya rû ye ber ava zemzema xwe ye
Mihemed Mistefayê me
Binir wî canê canan e dev û lêv le`il û mircan e zilf bi ser da badan e
Mihemed Mistefayê me
Binir bejina wî delalî binir wê ĥusn û cemalê bû xudan qedra pir `alî
Mihemed Mistefayê me
Binir bênawî siltanî wekî tûmek rîĥanî diherike li cîhanî
Mihemed Mistefayê me
Binir xûyê wî zî-şanî xudan ĥulm û kerem kanî bû meĥbûbê wî reĥmanî
Mihemed Mistefayê me
Binir eniya wî nûranî ji `ezmên de xeber anî wî quraan ji me re hanî
Mihemed Mistefayê me
Binir porê wekî ĥerîr çi xweş bû hew navê beşîr ji me ra him bû destgîr
Mihemed Mistefayê me
Ji Adem û ji Ĥewayê nehatî rûyê dunyayê ne li firdos e`layê
Mihemed Mistefayê me
Xeber da encîla îsa hewalda Tewrata Mûsa berî hatina wî dîsa
Mihemed Mistefayê me
Hewalda weldûĥa şanî wî fexrê kan û mekanî Taha wel nicim burhanî
Mihemed Mistefayê me
Kî ye tu derwêş nadan bi pir qusûr û pir nuqsan dike pesan şahê yezdan
Mihemed Mistefayê me
Nikanî kes bi ezmana bi pesna fexrê cîhana bitûn aşiq `aciz mana
Mihemed Mistefayê me
Îlahî ez ricakar im de`îf û pir gunehkar im bi eşqa we giriftar im
Mihemed Mistefayê me
Îlahî sed hezar meded bike şefî`ê me Eĥmed seba li meĥşerê emced
Mihemed Mistefayê me
Selat û selam barî hewna li ser wî dildarî li ser esĥab û ensarî
Mihemed Mistefayê me

*Ya reb Minle Elî şake keremke tu ji xew rake*
*Xudan exlaqa pir pak e Mihemed Mistefayê me*

***

Binal ey bilbilê şeyda binale
Binir li qametê çî pir kemal e
Şefî`ê min Mihemed Mistefa ye
Beşîr û hew nezîr û pir wefa ye
Rûyê xwe wek hêva esîmanê
Hewa bi efdelê kewn û mekanê
Can û serê me `aciza fîda be
Li `erd û `ezmanê maheta be
Binir Minle Elî xocê gira ye
Muĥtac şef`eta xeyr el-wera ye

Ĥebîbê te şêrîn û pir delal e
resûlê wî xwedayî zî el-celal e
Qureşî ye îmamê enbîya ye
şerîf e eşrefê xelkê giya ye
nûra eniya wî şahî da cîhanê
şefî`ê me ye li roya mîzanê
bi qurban wî ĥebîbê kibriya be
eĥmed û meĥmûd û `alî cenab e
bi mumina giya re ew bira ye
Miĥemed Mistefa taca sera ye
***

**Pesna Resûl**

Miĥemed fexra cîhanê bû li rebî` û Nîsanê
Herikî bîna rîĥanê ĥebîbê min bû li Nîsanê
Şefî`ê min bû li Nîsanê
Hate mewlîda siltanî bitûn va kewn û mekanî
Hewa xudanê quraanê ĥebîbê min bû li Nîsanê
Şefî`ê min bû li Nîsanê
Miha Nîsanê şêrîn e datê reĥmet ji `ezmên e
Rûyê `erdê dixemlîne ĥebîbê min bû li Nîsanê
Şefî`ê min bû li Nîsanê
Ji qetraka baranê dibare ji `ezmanê
Dike hew le`il û mircanê ĥebîbê min bû li Nîsanê
Şefî`ê min bû li Nîsanê
Çi xweş e miha Nîsanê dikeve şad û xandanê
Gî weĥş û têr û ĥeywanê ĥebîbê min bû li Nîsanê
Şefî`ê min bû li Nîsanê
Li Nîsanê gul û çîçek bi nûra te vedibin sek
`erd û `zman gî dibin yek ĥebîbê min bû li Nîsanê
Şefî`ê min bû li Nîsanê
Li Nîsanê vedibin gul siba we gî dixwînin bilbil
Vedibin sîsîn û gul ĥebîbê min bû li Nîsanê
Şefî`ê min bû li Nîsanê
Nîsan bû miha Buharê dike bilbil ah û zarê
Bi `eşqa rojê dilzarê ĥebîbê min bû li Nîsanê
Şefî`ê min bû li Nîsanê
Li Nîsanê gî ins û can li pêş wî dikin qurban
Li ser `alemê bû siltan ĥebîbê min bû li Nîsanê
Şefî`ê min bû li Nîsanê
Binir hêva esîmanî bû du şeq ew bi fermanî
Mihemed fexrê cîhanê ĥebîbê min bû li Nîsanê
Şefî`ê min bû li Nîsanê
Li Nîsanê gî darûber çilo didin gî serbser
Bi mewlîda xêr el-beşer ĥebîbê min bû li Nîsanê
Şefî`ê min bû li Nîsanê
Nizanim ez çi bêjim şaha ji te ra ev çî ye miha
Xudan kewsera Taha ĥebîbê min bû li Nîsanê
Şefî`ê min bû li Nîsanê
Şefa`et ji me re anî Mihemed Mistefa xanî
Ji ummet re kire mekanî ĥebîbê min bû li Nîsanê
Şefî`ê min bû li Nîsanê

Hatim ya xeyr  xelk Ellah　　　şefa`et ya resûl Ellah
Meded ya nûr `erş Ellah　　　ĥebîbê min bû li Nîsanê

Şefî`ê min bû li Nîsanê

Selat û bi silama ve　　　li serwerê rohniya çava
Ĥeya roj tim dere ava　　　Şefî` Ĥebîbê min bû li Nîsanê

Şefî`ê min bû li Nîsanê

Temaşeke tu ya Eĥmed　　　guneh min kirine vî cesed
Şefa`et kanî ya emced　　　Ĥebîbê min bû li Nîsanê

Şefî`ê min bû li Nîsanê

Bi eşqê ket dilê neçar　　　dixwîne pir bi ah û zar
Hawar Minle Elî sed car　　　Hebîbê min bû li Nîsanê

Şefî`ê min bû li Nîsanê

Ez ĝulam Minle Elî can　　　kirî qurban ez bi mîvan
Ji kula wî re tu derman　　　ke şefa`et ey dilovan

Ey ĥebîb ĥeq ti`ala

***

Dil perîşan bû her car dinale jan pir yaman bû herdem dikale
Bi zar û ĥesret dil pir de`îf ket ey pir merwet binir vî ĥalî
Bi eşqa te ve bi roj û şeva dixwaze heva şahêm wîsalê
Nûra rûyê te bîna xûya te wa biroyên te roja zewalê
ey por ĥerîrê min ez li dorê ez bûm esîrê bejin û kemalê
bilnd e şana te canî cana ez bi mîvana ĥusn û cemalê
dîm yasmîn e lêv sorgulî ne fexra zemîn e bi şewq û şemalê
eşqa te şahî zerîn gulahî dil kir ronahî ketî xeyalê
sunbil û rîĥan derkete ey can ey diran mircan ji wê delalê
kî li rû seke roya felekê dev û lêv ava zelal e
tu yî Mihemed Meĥmûd û Eĥmed tu yî mumeced dikim sualê

*Minle Elî hîn bi giryan û şîn*
*Dilêm kirî birîn herdem dinalê*

***

## Ne`it Şerîf

Ez qurban te bim Mihemed    ez bi ĥeyran te bim Mihemed
Tu şefî`ê me ey mumeced    hawara te dikim hawar Mihemed
Meded ey şahê serîrê lewlak    ji te re dahat (wema erselnak)
Ne`ta te kir quraana zatî pak    hawara te dikim hawar Mihemed
Şaha ji te re xweş nav e Yasîn    Taha ji te re te re telsim e (tah sîn)
Aşiq bi navê te pir dibasin    hawara te dikim hawar Mihemed
Çî ye pê tere hev şahî kewnên    her du ebroyên te (qabe qewsên)
tu yî hem bavê Ĥesen û Ĥusên    hawara te dikim hawar Mihemed
him (elem neşreĥ leke) pir wefa    danî ji te re seke Mistefa
şeina te rakir cana qul kefe    hawara te dikim hawar Mihemed
tu yî ĥebîbê reb el-`alemîn e    him tu bû fexra `erd û `emên e
Ebû Bekir û `Umer çi xweş qerîn in    `Usman û Elî eweqas şêrîn in
Ĥemze û `Ebbas her du narîn in    hawara te dikim hawar Mihemed
Ĥesen û Ĥusên çi nazenîn in    her du ewladê şahê gezîn in
Telĥe û Zûbêr dîsa emîn in    hawara te dikim hawar Mihemed
Se`id û Se`îd him hevalê wî ne    Ebdireĥman lawê `Of gulîn e
Ebû `Ubeyde `amirê dîne    hawara te dikim hawar Mihemed
Fatme qîza xeyr el-wera ye    dayîka her du zoyê gula ye
Rohniya du çavên Mistefa ye    hawara te dikim hawar Mihemed
Xedîce ĥerema zatî pak e    `Aîşe ji mumina re dayîk e
Derwêşê min tu bawer xweda ke    hawara te dikim hawar Mihemed
Ketim bextê te ey xeyrû el-`alem    bi eşqa te şahî ez dinalim
Şefa`et kanî ey pir kemalê min    hawara te dikim hawar Mihemed
Zulf û rexsarê te gulîzar in    jê bîna te û xweş nêrgiz dibarin
Em gî aşiqê rûyê dildar in    hawara te dikim hawar Mihemed
Minle Elî hat bi zar û şewat    hêstrên xwe bûn Xabûr û Ferat
Dixwînim li ser te hezar selat    hawara te dikim hawar Mihemed
Li ser we al û esĥabê kîram    ji me de hezar selat û selam
Li ser enbîyayê me `alî meqam    hawara te dikim hawar Mihemed

***

**Qesîde Miĥemediye**

Mihemed bû eşrefê bitûn xelk û `alemê
Mihemed bû efdelê pêxemberan giya
Mihemed bû xudanê Bûraq û him Zemzemê
Mihemed bû fexrê gî enbiya
Mihemed bû `aşiqê me`şûqa her wextê
Mihemed bû rihberê gî rûĥî û ewliya
Mihemed bû gulşena cinnet `alî meqam
Mihemed bû rohniya her du çavê esfiya
Mihemed bû avtab bi bext û `alî cenab
Mihemed bû mahtab hew bû nûrê kibriya
Mihemed bû rûyê xwe wek hêva  çardeyî nû
Mihemed bû xuya xwe bîna çîçeka giya
Mihemed bû dilbirê reĥta bi qed û bal e
Mihemed bû bilbila gî zara etqiya
Mihemed bû şefî`ê `asî ummet binir
Mihemed bû asîman bi nûra wî bû ddiya
Mihemed bû pakîzat meĥmûd û `alî sîfat
Mihemed bû şîrmijê Ĥelîme el-Se`diye
Mihemed bû bi edeb hew şahê fexr El-ereb
Mihemed bû serfiraz can bi qurbane wîya
Mihemed bû pir kerem xudanê tac û `elem
Mihemed bû muĥterem bû şivanê ber miya
Mihemed bû destgîr ji ummetê re bû beşîr
Mihemed bû por ĥerîr nezîr e him heda ye
Mihemed ez vê ĥesab hezar selat û selam
Mihemed li rûĥê te û al û esĥaba giya

*Mihemed hev `aciza Minle Elî ye binir*
*Miĥtac e hatî ji nav `eşîreta xwe Bîya*

***

Şevreş çû rohate der dil êş çû nema keder
Rakir ĥîcab nema `ezab hat dilbira zerîn kemer
Ez bi mîvanê nav û nîşan bû vê guman xeyr el-beşer
Dil bi gula bû bilbila aşiqê gula pel sor û zer
Çavê wî reş wek lale geş zarê xwe xweş rûyê qemer
Ez bi ĝulam şêrîn kelam ĥalê humam ĥalêm binir
Minle Elî xweş biĥelî wer vî dilî daĝê seĥer

***

## Mizgîn ji ĥedret Emîne re

Mizgîn ji te re Emîne ka mizgîna Ehmed wîne hewa şefî` el-muznîbîn e
Mizgîn ji te re Emîne
Te hilgirt hew li Recabe va cana fîdayê we be hew menbe`a edeb e
Mizgîn ji te re Emîne
Miha diduyê tê Şe`ban e bi ĥemla fexrê cîha ne qedra wî pak xwedê zane
Mizgîn ji te re Emîne
Miha sisiyê Remedan e efdelê kewn û mekan e mefexra Benî `Ednan e
Mizgîn ji te re Emîne
Şewal bû miha çarê can û serê min li dorê diya bû `alem bi nûrê
Mizgîn ji te re Emîne
Zûlqe`dê hat li dû wan re da mizgîna xeyr el-wera çi dewlet hate ji te re
Mizgîn ji te re Emîne
Zû-elĥîcê hate bi sefa da te mizgîna Mistefa tu bi ĥemla xwe nedî cefa
Mizgîn ji te re Emîne
Miĥerremê da te xeber bi mewlîda xeyr el-beşer nûr da cîhan serteser
Mizgîn ji te re Emîne
Paşê li miha Seferê dar û ber didê xeberê serwerê `alem kê werê
Mizgîn ji te re Emîne
Çaĝa Rebî` el-ewel hat te hanî fexrê kaînat hew bû mefxer mewcûdat
Mizgîn ji te re Emîne
Şewq xwe da `erd û `ezmên ew hati bû şahê kewnên dî bi çava qabeqewsên
Mizgîn ji te re Emîne
Bû xudan zemzem û tacê şeva îsra çû Mi`racê ji ummetê re bû racî
Mizgîn ji te re Emîne
Wê şevê gîşte wîsalê dê cemal û bi wa kemalê wî xwedayê zû el-celalê
Mizgîn ji te re Emîne
Hew şefî`ê ummet siba li rojê qiyamet xudanê tac û dewlet
Mizgîn ji te re Emîne
Hew e xatimê enbiya cîhan bi nûrê bû diya hew e ĥebîbê kibriya
Mizgîn ji te re Emîne
Hew e xudanê kewserê hew eşefî` rihber gunehkar li meĥşer
Mizgîn ji te re Emîne
Hat bi weĥî rîsalet `alem keti bû zulmet hanî der bi hîdayet
Mizgîn ji te re Emîne
Ebro bijang hîlalî ne dev û lêv wek zelalî ne bejin û balav kemalî ne
Mizgîn ji te re Emîne
Şêrîn e pir zarûziman şewqa xwe da hêvê heman bûm aşiqê wî bê guman
Mizgîn ji te re Emîne
Hezar selat hezar selam li ser rûĥê xeyr el-enam ser al û esĥabê kiram

Mizgîn ji te re Emîne
Minle Elî bêçare bû aşiq rûyê xusare bû de`î û him aware bû
Mizgîn ji te re Emîne

***

## Hev cîhana fanî ye

Sed hezaran şukr û minnet û ssena — em bûne ummeta wî pêxemberî
Ne ji wî ba me ne didî va dewleta — dînê îslama hanî wî serwerî
Xelk û `alem hate der ji zulmetê — çaxa derket nûra wî rihberî
Şewqa xwe da va cîhanê serteser — ez bi qurban her du nûra wî enwerî
Reĥmet lîl-`alemîn hat Mistefa — ji nûra wî şewqê da hêva zerî
Le`l û mircan bûn diranê bakî zat — hem ziman û bejin û balav cewherî
Hew şefî`ê ummetê bi ca û dan — soret û nav û nîşan him cewherî
Ji xûya eniya wî şahî bêhin dihat — ez li dorê wek misk û `enberê
Ez kirim perwan e li hember xwe wî — bûme miştaq sûreta wî dilbirî
Zulf û rixsarê Mihemed Mistefa — pir kîbar bûn rengê ava kewserê

*Bermede sinneta wî Minle Elî*
*Ev cîhana fanî ye ey serserî*

***

**Qesîda mewlêd şerîf**

Tu bi xêr û silamet hat mewlîda fexir kaînat
Ez bi qurban wî pakîzat were gul mewlîda wî ne
Ĥebîbê min li vê mihê cîhan kir şewq û ronahî
Bixwîn mewlîda wî şahî were gul mewlîda wî ne
Ji derda re şîfa ye hew mihemed mistefa ye hew
Ji cana re sefa ye hew were gul mewlîda wî ne
Çi xweş e mewlîda Taha bi bext û şan e hev miha
Bûye aşiq dilê xemgîn Cemala Ehmedê rengîn
Cema`et ji we re mizgîn were gul mewlîda wî ne
Li miha mewlîdê cana bîna baĝ û gulistana
Diherike dike riĥana were gul mewlîda wî ne
Hezar selat kerem kanî li ser te fexrê cîhanê
Şefa`t ez bi mîvanî were gul mewlîda wî ne
Binir Minle Elî ey can bi eşqê xwe kirî qurban
Li derdêm bike derman were gul mewlîda wî ne

***

## **Bawer bike ey humam**

Wacibe tu zanibî bawer bike      zanî ĥesabê wan xweda
bîst û pênc pêxembera      bi ĥeşrî min feqîrî ez `ellam
xêr e van pir hatine      nehatî darê fena
gî sed û bîst û pênc hezaran      ittîfaqa wana temam
jan dike tu xeber e tukes      birayê min binir
kanî hew pêxemberanê      xelkî gotine xas û `am
kanî adem kanî Idrîs      kanî Îbrahîm Xelîl
kanî Nûh ka Ĥûd      dilxweş `alî meqam
kanî Saliĥ kanî Lût hem      kanî Yûsif û Şi`êb
kanî Isma`îl      `eleyhêm el-selat û el-selam
kanî Isĥaq kanî Ye`qûb      ka Silêman ey ciwan
kanî him Harûn      `eleyhêm el-selat û el-selam
kanî Mûsa kanî Dawûd      kanî Ilyas Elîse`
kanî him Eyyûb      `eleyhêm el-slat û el-selam
ka Zû el-kefil û ka Yûnis      lawê `Eziranê ye hew
ka Zekeriya      `eleyhêm el-slat û el-selam
kanî Yeĥya kanî Îsa      ser kirin pir ixtîlaf
kanî Mihemed      `eleyhêm el-slat û el-selam
sê pêxember din hene      kanî Zû el-qurnên `eceb
hina go pêxember in hew      `eleyhêm el-slat û el-selam
ka `Ezîz û kanî Luqman      meĥrûm meke
sed hezar carî      Hina got welî ne (?)
ya îlahî me ji şefa`eta wan      ya rebî reĥîm
çaxê li ber mirinê      `eleyhêm el-slat û el-selam
meĝferteke pidrû û maderî      Ĥaşa tu niqsan bibî
cîran û xalk û bira      bi nesîb meke ĥusin el-meqam
ger tu `afkî ji reĥma te      silaman vê Ĥesab
bi şefî`ê meke Taha      riswa meke yewm el-qiyqm
bi hezara hewna selat û esĥab û alî kîram
ser mihemed mistefa ĥebîbê xwe      ey xweda yeum el-zeman
dîsa ya rebî li ser      miĥtacê reĥma te ye tim
sed hezar selat û selam      xeyr el-enam
him ey humam      bi hevalê wan ke li
ey xweda Minle Elî      vê ĥesab tim (?)

***

**Ehlê dozexê kî ne**

Balê xwe pêdê hewaldim ey `ezîz sadiq bira
ehlê dojehê kîne ez kê xeberdim ji te re
Şeş mirîn e bi qewlê mihemed mistefa
Ĥakimê bi zulm bi cehalet ehlî qura
bi kebrê eşrefê(?) bi te`essub Ereb
`alimê bi ĥesedê ticcar xayîn fî el-şîra
Ĥeq ti`ala ji va her şeş taîfa ĥeznake qet
berde va dixwazê tu şefa`eta xeyr el-wera
xwe bixemlîne bi her exlaqê delal canê şêrîn
va cîhana fanî ye baqî namîne ji we re
ey dilê min vê nesîĥetê bi xwe de carekî
te `emel kir belkî `alem guhlêke şora mera
emrê ĥeq tu bermede her weqtê ĝîret ke tu
serserî megir li dunyayê xwe meke devê gura
ji can û dil de `emel bike sinneta resûlê
xwe bike layiqê şefa`eta Mihemed ey bira
*bermede rêka wî şahî* *boş megir Minle Elî*
*belkî hew çarê bike* *li derdî hew bira*

hev cîhana ji mera re nabe mekan ey dilo kes namîne li vê derê
balê xwe bidê kesî mayî heye `eceba kîjan neçû wê seferê
nabe va şaha dilo nabe geda Ĥecî hat vê zîndanê hewkê herê
ey berde sefayê fanîyê xêrî kefen tukê çi bibî wê derê
pir însan wekî te hatin û çûn bifkire hewl û `zabê meĥşerê
rêka te dûr e ka xercî û rahê te hîro siba ecelê te jî werê
pir zor e pirsa Munker û Nekîr şefreşa gorê tu nizanî bi rê
kanî eĥbab û yarên te `eceb heval û cîranê te çûn kûderê
mekev ber bayê nefs û fanîyê carekê li dafê van tu nanirê
ber xwedayê xwe biger bi şev û roj ta ku bi rastî te de wê defterê
sed hezar selat û silaman werîne ser te şefî`ê roja meĥşerê
*sîwayî Minle Elî berde eger*
*tu dixwazî vexî ava kewserê*
***

**Dilo ber bayê nefsê mekeve**

Ey dilo ber bayê nefsê mekeve saqin binir
mutleqe tu rokê ji faniyê bikî sefer
Ta`et û `badeta ĥeq bermede her wextê
vê wefa ye hev cîhana pir dike mekir û huner
guh mede Şeytanê mel`ûn hew xwedê înkar dike
bi şora wî meke tu rahê Ĥeq eger
`Umrê xwe mede hewayê gulêne va bendê xweş
Bermede emrê xwedayê xwe li boşê tim meger
Destvala mere dîwana ĥeq ti`ala tu ciwan
Destê boş him qelbê boş xalî nabe ji îşê şer

***

**Wer înkar meke**

Lezzeta dunyayê şêrîn e feqet aĝo lê ye
Wer bide ser sîwayê ji îşê xirap biger
Lizzet û naz û ne`îmê dunyayê mirdar e him
Bixwaze dildarê, darê mexwaze dilo binir
Hez meke ji faniyê barê giran rameke tu
Hew rêya tukê pêde herî dûr e pir serteser
Darê dunyayê şêrîn nabe zewq û sefa
Berde sîwayê tu dixwazî şorê pir muxteser
Firsetê bermede ĝîretke li ta`eta xwedê
Ey dilĝafil ji hîro de min da te xeber
Ĥeq ti`ala ni`meta daye te wer înkar meke
Vî başê ni`met daye te cakê lê bike nezer
Ya îlahî curim û `isyanê me wê ĥed û ĥesab
`afke bi ĥurmeta ewê jê re wenşeqe el-qemer
Wîne selat û selama ser mihemed Mistefa
Esĥab û ensar û ezwac alê xeyr el-beşer

*Tu nesîĥta didê xelkê li ĥalê xwe binir*
*Wekî te `asî hene Minle Elî bes vê xeber*

***

## Dixwazim reĥmetê barî

Bixwîne şertê îslama `emel bik ey îxwan
Bûye ferz ez hewalim ez berket ez ĥeyran
Nimaz û rojî ye ĥec û zekat û him şehadet
Bi dil îqrarkî ji dil de bike tesdîq û pê înan
Ji wê şûnda dîsa tu zanibî xwedayê te çiqa
`ezîz û qadir qeyûm e û waĥîd eĥed û reĥman e
Hewa rebê me ye daîm bike hew vê şirîk e Ellah
Xêrî wî kes tuneye ne li `erdê ne li ` e zmên
Hevalê wî tuneye vê nezîr û vê mîsal e hew
Bi wî xwedayî hat wicûdê hawqas însan
Çiqas mexlûq hene bi emir û fermana wî xllaqî
Hate wicûdê weĥş û teyr û kevir û dar û Ins û Can
Kitaba me jî quraan e bi qedir û `ezîm el-şan e
Dînê me dînê îslam e bûye efdelê edyan
Mihemed Mistefa pêxemberê me ye resûl Ellah
Şefî`ê me gunehkara ye li ber ĥeşir û ber mîzan
Ji me re qublegah e ke`be `alî meqam pak
Ĥeqîqet mumin im ez misliman im şukr û bê payan
Li i`tîqada mezheba me ehil sunnet e û ya
Ĥenefî mezheba me ye li `emelê dikim beyan
Ebû Mensûr îmamê me ye him li i`tîqadê tim
Li `emelê îmamê me Ebû Ĥenîf e yê Nu`man
Û ji zurrîyeta ĥedret Adem hatime dunyayê
Ji milletê resûl Ellahê me bû meĥmûd û `alî şan
Înan dikim xweda ĥeq e bi fihrîşta me îman kir
Bi her çar kitaba Tewrat û Incîl û Zebûr û Firqan
Ji Adem de ĥeya Eĥmed çi pêxember hatin
Înan dikim bi wan giya bi axretê tê him îman
Çi xêr û şer hebe teqdîrê barî ti`ala ye
Bitûn însan mirin şûnda wê herin ĥeşrê bêguman
Li ser herkesî wacib e zanibin şert û eĥkama
`emel bikin bi mûcibê li derdê xwe bikin derman
De`îf û bêçare me ez dixwazim reĥmeta barî
Ji derdara tu ye derman gunehê min bike ĝufran
Xwedaya pir selata tu werîne li ser rûĥê Taha
Resûlê te ye ew şaha xudanê qedr û `alîşana
Li ser gî al û esĥaba li ser ewlad û esĥaba
Muhacir û ensara bi qandirî eĥrufê quraan

*Bixwaz Minle Elî lutf û `înayet ji xwedayê xwe*
*Tobe ĝayet gunehkar e de`îf û pir xudan `îsyan*

**Gul û bilbil ĝezelê `eşqê**

Bixwîn bilbil gulîzara tu bû ĝence li Buharê
Bi şewqa rûyê dildarê bixwîn bilbil şêrîn
Temaşeke gulistanê te sor dikin li Nîsanê
Binivsîn tu vê destan bixwîn bilbil şêrîn bilbil
Bi vî arê te xwe şewitandin li gulzara te têr ne xwandin
Li hember wê te can ĥeland bixwîn bilbil şêrîn bilbil
Gul û çîçek gî hatin der gulistan bûne sor û zer
Ĝerîb ma tu `eceb li ser bixwîn bilbil şêrîn bilbil
Ez zanim tu ĝerîb maye çi zane hev çi sewda ye
Te gul ji dest xwe berdaye bixwîn bilbil şêrîn bilbil
Wekî te ez bi vê janê ĥelîm bi arê sozanê
Bi zarê xweş dilovanê bixwîn bilbil şêrîn bilbil
Bixwîn bi deng û awaz tu yî aşiq rûyê gulnaz
Ji gulşenan xatir bixwaz bixwîn bilbil şêrîn bilbil
Bi dengê te yê pir şêrîn rabûm ez ji xewa narîn
Gul û çîçek li min barîn bixwîn bilbil şêrîn bilbil
Siĥrgahan binir gulşen bi dengê te dibin rewşen
Zar û nalîna te xweş in bixwîn bilbil şêrîn bilbil
Tu li nav baĝ û bistana bixwîn bi zar nalana
Bĥkîn dilbirê cana bixwîn bilbil şêrîn bilbil
Buhar bi te gulê şîn bû rûyê `erdê gî hişîn bû
Tu bi eşqa gulê dîn bû bixwîn bilbil şêrîn bilbil
Vê eşqê ez kirim wêran mekin loma heval cîran
Li derdê min bibin derman bixwîn bilbil şêrîn bilbil
Bi min ket arê te bilbil bi şev û ro wekî te dil
Nexweş bûye bi zar kul bixwîn bilbil şêrîn bilbil
Bixwîn Minle Elî bêzar cîhan bi te re nabe yar
Gulzarê te bûne xwar bixwîn bilbil şêrîn bilbil

***

**Ĝezelê eşqa Minle Elî û felek**

Dil û cîger wêran bû		aman felek yaman felek
Bi nalîna dîwan e bû		aman felek yaman felek
Ez bûm esîrê ferqet		bi min meke va zeĥmet
De`if ketim bi hesret		aman felek yaman felek
Bûm bilbila aşiq gulê		borîn çîçek û sinbilê
Min `acizê bi vê kulê		aman felek yaman felek
Felek fanî `eceb kanî		wa bejina pak û rîĥanî
Bi serê min te çi hanî		aman felek yaman felek
Meraqa dil bû agirê		eşqê şewata min namirê
Ĝeddar e tu dilgawirê		aman felek yaman felek
Tu ji dergeha ĝeddar e		tu saĥir û to mekkar e
Tu dostekî wekî mar e		aman felek yaman felek
Melûl kir te dilê reben		ka dilbira nazik beden
Zalim te li min kir çi fen		aman felek yaman felek
Felek te ez melûl kirim		bi xem xeyalan şîn kirim
Felek te ez ĝemgîn kirim		felek yaman felek
Bi ĥesreta canê şêrîn		can û cîger bûye birîn
Ez bûme Mem hew bûye Zîn		aman felek yaman felek
Aman ey felekê fanî		çi camêr te xwarin kanî
Bi serê wan te çi hanî		aman felek yaman felek
Te kuştin roniya çava		wêde felekê malava
Te êxistim kirim dafa		aman felek yaman felek
Te ji baĝ û gulistanê		kirin sorgul xwedê zanê
Felek zalim vê wijdanê		aman felek yaman felek
Hêstirê çava bûn Ferat		`eceb çi bi serê min hat
Çi zor e ferqet û şewat		aman felek yaman felek
Dîwane bûm bi çiya ketim		bi der û jan û `llet im
Bi ah û zar û ĥesret im		aman felek yaman felek
Feleka fanî hana kir		va xelk û `alema şa kir
Dil û cîger bi sewda kir		aman felek yaman felek
Derwîşê min tu pir menal		neçe camêr man bê heval
Ka gulîzara pir delal		aman felek yaman felek
Minle Elî ey bê xeber		tukê ji vir bikî sefer
Bi dilĥezîn bixwîne her		aman felek yaman felek

***

**Ĝezelê derdê ferqet**

Tu bixêr û silamet hat mubarek miha Remedan
Tu bi her ĝir û ruf`et hat mubarek miha Remedan
Tu ye xezna giş reĥmeta tu yî binaha ummeta
Ji ser me rake zelmeta mubarek miha Remedan
Tu miha zikir û quraanê tu miha birr û îĥsanê
Tu pir xweş û dilovan î mubarek miha Remedan
Tu pak dikî curim û gunah tu bû ji mere pişt penah
Tu ji mere şand rebûna mubarek mehê Remedan
Tu mumina dikî dilşad tu `asiya dikî dilşad
Tu xelkê dikî ber mirad mubarek miha Remedan
Tu ni`met ji me re wî şand kemala te bi xwe min xwend
Te rûyê `erd xemiland mubarek miha Remedan
Tu yî fexra mislimana tu me`şûqa `aşiqana
Li nav gî baĝ û bostana mubarek miha Remedan
Tu bi bext û bi gî şan e tu bi text û bi siltan e
Tu miha fexra cîhan e mubarek miha Remedan
Tu bi şewq û şemala xwe tu bi tac û kemala xwe
Rake perda cemala xwe mubarek miha Remedan
Tu hadî û delîla me tu xanî û xelîla me
Va qewlê pir zelîla me mubarek miha Remedan
Cenab ĥeq va quraana ji loĥê meĥfûzê danî
Ji te re danî `ezmên e mubarek miha Remedan
Kîjan qedra nizane esîrê nefis û şetan e
Li her du dunya ĥeywan e mubarek miha Remedan
Xêrî munafiqa ew bes zanin qîmeta te herkes
Bûne hewna esîrê nefs mubarek miha Remedan
Bitûn `alem ins û can bi `eşqê xwe dikin qurban
Feqîr û zengîn û siltan mubarek miha Remedan
Bi nûra te cîhan şa kir te kifir û şirkê him rakir
Te reĥma xwedê belav kir mubarek miha Remedan
Bi eşqa te dikim weyla dike te Mecnûnê leyla
Diherikim wekî geliya mubarek miha Remedan
Remdan tu ci pak e ji ser me va guneha rake
Me bi ummeta mistefa ke mubarek miha Remedan
Şeva qedrê xwedê da te nûra bedrê xwe da te
Va qedir û qîmet da te mubarek miha Remedan
Binir fedil û kemala xwe binir ĥusin û cemala xwe
Binir nûr û delala xwe mubarek miha Remedan
Xweda emir da redwana vekin hûn deriyê cînana

Bigirin deriyê nîrana mubarek miha Remedan
Cinneta xwedê xemilîne <u>bi her tu rê dişemilîne</u>
Me ji tengiyê derîne mubarek miha Remedan
Ĥebîbê me mihemedî tu layiq ummeta xwedê
Can bi qurban wî Eĥmedî mubarek miha Remedan
Li te mihê gî derûber şa dibin hewna serteser
Cin û însan û weĥş û têr mubarek miha Remedan
Ço şa nebin bi te mihê bi eşqê ez dikim ahî
Bi şefê nabînim xewa hey mubarek miha Remedan
Te arê `işiq bi min dada ne bû ez jê bibim cida
Hawar dikim meded xweda mubarek miha Remedan
Kî rojiya te bixwe ey mihe bi qesdê hew e rûsiyah
Nabe ummeta Mistefa mubarek miha Remedan
Şefa`et miha remedan seba xatirê fexir cîhan
Hawar dikim ez el-eman mubarek miha Remedan
Ĥeya ĥeşrê binalim ez wekî berxan bikalim ez
Esîrê xem xeyal im ez mubarek miha Remedan
Meded ey fexir kaînat ji te re hezar selewat
Ji bo ummetê tu hat mubarek miha Remedan
Binir Minle Elî hava dirêjê hêstirê çava
Ji te re hezar silava mubarek miha Remedan

***

**Xoşxana mirinê**

Çûn heval û cîranên te zanibe tu kê jî herî
Çûn eĥbab û yaranê te zanibe tu kê jî herî
Nabe ey miskîno nabe ji xewa xefletê rabe
Va ye ser çavê te xa be roj ji wî `umrî derê
`umrê xwe mede hewayê destê xwe berde masîwayê
Destboş mere wê beqayê jan meke tu carek din werê
Ĥecî go dunyayê dinê mebe `eceb hew kanî
Felekê çi bi serî hanî ê bê ser te jî were
Her binir firset anî bike feryad û fîĝanî
Ji kêra hîşt vê cîhanê kîyê ji dunyê nere
Tu zanî tu kê ço bibî tu jî wekî wan bibî
Eger ecel hat çare nabe hindik ma `Ezraîl were
Çaxê defter hatin dandin destê te him bê xwandin
Li meĥşerê tu hat şandin `eceb tu yê herî kûderê
Çaxê tu çû ber mîzanê dem hat guneh pîvanê
Xêr û şer derket meydanê tu yê ço bixwînî defterê
Weqtê tu gunah bibînî tuyê wê çaxê li xwe xînî
Çi tê hayî bê li wê birînê tu nikanî werî vira
Cenab ĥeq dibe qadî `eceb ji te bibe radî
Bixwaz ji ĥeq wê miradê li wî ĥalî tu nafkirî
Berî mirinê tobeke va me`setîna meke
Li şevreşiya tirbê seke dilo tuyê jî herî wêrê
Xwedê li wir tu me şak e bi ummeta mistefa ke
Ji sîratê me derbas ke bi ĥeqê wî pêxemberî
Minle Elî bûye kêmtir kirî vê ĥed guneh û şer
Îmdad nebî ji te meger muĥtac e ew li meĥşerê
Silaman pir were li ser wê rûĥê pak pêxember
Li ser `alemê bû serwer quraan e nûrê enwerî

***

**Pend û Nesîĥet**

Rabe ji xewa ĝeflet ji dest xwe bermede firset
Royê dere ji `umrê te bike zikir û`îbadet
Şukirke pir ji xwedê re bike pir ta`etê jê re
Wê xelaske te agira xudanê fedil û reĥmet
Dunya nabe mekanê te ka eĥbab û cîranê te
Ka dost û ka yaranê te xêre yek ji wan netê
Mihemed mistefa kanî hewa bû nûra ĥeqanî
Nema li dunyayê fanî serwer û şahê ummet
Ebû Bekir serdarê heval û yarê ĝara wî
Mezinê çar yarê wî şan dabû bi sedaqet
Kanî `Umer kanî `Usman jji derda re dibûn derman
Can û serê me bi qurban her du nûra ĥeqîqet
`Elî El-Murteda kanî xudanê `ilm û `erfanê
Ez li dora wî siltanî meşhûr bû bi şeca`et
Kanî Mûsa kanî Harûn kanî Fir`on kanî Qarûn
Kanî xudan text û tac ew mal û milk û dewlet
Hezar selewat û selam li ser rûĥê xeyr el-enam
Ser al û esĥabê kîram ĥeya roja qîyamet
Xweda me gunehkara ĥeşirke bi ewliya re
Bi Mihemed Mistefa re bike li me şefa`et
Minle Elî tu kê binir ji dunyayê bikî sefer
Ji hîro de min da xeber tu jî vexwe vê şerbet

***

**Were veger xwedê were**

| | |
|---|---|
| Hewa ye bes e dilo | were vegere xwedê were |
| Sewa ye bes e dilo | were vegere xwedê were |
| Bi rêka şer`ê de here | rihberê te pêxember e |
| Ji hîro de veger were | were vegere xwedê were |
| Dilo ĥeyran mebe cahil | bi dunyê de mebe ĝafil |
| Hindik ma were `izraîl | were vegere xwedê were |
| Çavê xwe rake ji xabê | vê ĝîret qe tu kar nabî |
| Ĥeya çi weqtê tuyê rabî | were vegere xwedê were |
| Masîwayê ji dil çeke | li dînê xwe çava veke |
| Li çûndina roya seke | were vegere xwedê were |
| Dest xwe bermede firset | mere mekeve zulmet |
| Bike zikir û `îbadet | were vegere xwedê were |
| Bi `alemê re suĥbet | bi saliĥa re ulfet |
| Bermede va nesîĥet | were vegere xwedê were |
| Eger tu ji kê ĥez bikî | te bi wî re ĥeşir dike |
| Bibîn tu saliĥ dostekî | were vegere xwedê were |
| Heva dunyaka fanî ye | şerbeta xwe aĝo lê ye |
| Ê li baqî mayî kî ye | were vegere xwedê were |
| Dewleta xwe gî miĥnet e | kêf û zewqa xwe zeĥmet e |
| Karê xwe tim ezîyyt e | were vegere xwedê were |
| Ey dil ĝafilo rabe | li virê kes vê kar nabe |
| Heva li ser çavê te xabe | were vegere xwedê were |
| Binir heval û cîrana | `eceb kes maye ji wana |
| Ji kerema hev cîhana | were vegere xwedê were |
| Kewranê mirinê derê | zani be tu kê jî herê |
| Çend roj man ecel were | were vegere xwedê were |
| Were ey `aciz û bêçare | li dunêyê mebe aware |
| Li derdê xwe bike çare | were vegere xwedê were |
| Li siĥûrê vedibin gul | seba we zar dike bilbil |
| Xew meka lê hayî be ey dil | were vegere xwedê were |
| Bixwaze çaĝê siĥûrê | mirazê xwe li ĥudûrê |
| Bişewtînin xwe tu bi nûrê | were vegere xwedê were |
| Ĥeya niha dil te çêkir | bi vî ĥalî te çê şikur |
| Te çikir bi serê xwe kir | were vegere xwedê were |
| Kanî Mihemed mistefa | were vegere xwedê were |
| Ka Bû Bekir kanî `Umer | kanî `Usman kanî Ĥeyder |
| Her çar yarê pêxember | were vegere xwedê were |
| Neçe û camêr hatin vira | encamê gişti çûn wira |
| Binir wan çi bir ji xwe re | were vegere xwedê were |

Dilo bifroşe dunyayê bikir tu darê axîrayê
`umrê xwe mede hewayê were vegere xwedê were
Tu nezergahê xweda ye meqamê te pir e`la ye
Zikra ĥeq ji te re şefa ye were vegere xwedê were
Tu guh li wî xwedayî ke sibê hêvarê banêke
Xîbab ĥeq tu radî ke were vegere xwedê were
Bi roj û şev bike munacat hewa ye qadî el-ĥacat
Bi ĥeqê fexrê kaînat were vegere xwedê were
Minle Elî dîwane bû bi ah û zar miştane bû
Dil aşiqê canê te bû were vegere xwedê were
***

**Eger ĥez kir ji teqwayê**

Eger însan ji teqwayê bidûr ket ew ne însan e
Eger ĥez kir ji teqwayê li her du dunya siltan e
Go (Îne ekremekum `înde Ellahî etqakum)
Binê hev ayeta hatî ji teqwayê re birhan e
Kê berda ta`et û `îbadeta wî zû el-celalî kir
Ĥeqîqet hew li her du dunya ji esnafê ĥeywan e
Kê firset berneda dewletê darênê ji wê re ye
Siba li meĥşerê bi ewliya re şad û xendan e
Dilê min tûmî dunya ji min re belkî baqî be
Eger mirin bû ji kesa re va çihana nabe meskene
Ji kes re ew xeber nade ji des û `ekis xelas nabe
Tukê bi wî dî çi cewabê vê eman û vê wicdan e
Çi camêra bêkes dike çi me`sûma yetîm dike
Eger ecel hat çare nake nabêje va kal û va can e
Îlahî em esîr in tim bi dest nefis û hewayê de
Bi dest iblîs û dunyî de tu ĥenan û tu menan e
Xweda me xelaske tu ji şerê wan bi fedla xwe
Bi litfa xwe bi reĥma xwe tu xudan fedil û îĥsan e
Selat û pir silaman tu werîn ey ĥeq ti`ala tim
Li ser rûĥê ĥebîbê xwe Mihemed fexr cîhan e

***

**Xoşxana Filestînê**

Kurdino werin xortino werin ji can û dil de em gişti herin
Li ceng û ĝewza em huner in kurd berê û paşê de şêrê şer in
Kurmanc û Ereb em gişti  yek in Sûrye welatê me ye sekin
Filestîna me ye çavan vekin em vî barî ji ser xwe çekin
Bajarê Qudsa Şerîf a me ye mescidê Eqsa û Ĥeyfa me ye
Dergûşa Îsa û Yafa me ye sexra pak dîsa şûreta me ye
Binir em kurê Selaĥiddîn in li tarîxa derba me bixwînin
Yahûd mane me jê derxînin! Em gî canfîdayê Filestîn in
Temaşeke ey Yahûdiyê reben Filestîn ji we re nabe weten
Ji Ewrupa qet hicret mekin canê heman em fîda dikin
Binir Îngilîz û Emerîkan Filestin ji we re nabe mekan
Ĥeya em hene li rûyê cîhan welatê te kes lê nabe xudan
Metirse tu ey `ewîlê xedar bi dest te de ĥeq heye aşkar
Li dîroka em namdar li ceng û ĝeza bûne xwînvexwar
Here ey heval cîhada delal fîdake jê re tu mal û mewal
Xelaske weten şêrê pir kemal nesreta xweda bi te re heval
Ey Minle Elî li rêka weten mal û canê xwe fîdayê bikin
Ji te re heva gî nesîĥetin heval cîranê te bi rêketin
***

**Pendên me Kurmanca پنر مایا کرمانجا**

Guhlên derwîş serbilind ji te re hava we`iz û bend
binir tu rahê neqişbend rêka sedîqê kibriya ye
de rojekê fexrê kaînat ji ĥicet el-wîda`ê hat
va xetaba wî `alî sîfat li mîna yê hewaldaye
mebin firqe got wek kufar merêjin xwîna hev ey yar
ĥeram e va îşê mirdar ĥelal mekin ĥedîs va ye
mal û canê we her yekî ji kes re qe ĥelal nakî
kîtab û şer`a min bakî ĥeram kirî va fi`la ye
kanî şerî`t û ka dîn kanî terîqet ey mumin
ka sinneta wî a şêrîn dilê min çû we berdaye
we hew terîqeta `alî `eceb kiriye çi ĥalî
xelk û `alem jê dinale ji zulma we Mirûda ye
li Kurdaĝê we ar dada bi ser her kul û derda
çû `erş ah û firyada me Kurmanc û me Kurda ye
bû ĥevde sal pir însan hatin kuştin ji me Kurdan
çi mal şewitîn bûne wêran çi mekir hev çi bela ye
nabe millet bi vê nûrê bi vê zulmê bi vê cûrê
aman ji destê vî `esrî çi zemanê Nemrûda ye
hewê va ara dadaye ne dostê me ye dijmin e
hew xesmê me Kurda ye ku aqil te bada ye
netê bîra we Kurdistan kirin çi ĥalî wan Tirkan
xera kirin wan merdan guhlêne şorên dosta ye
kê Şêx Seîd bidarda kir kê xwendina me rakir
kê welatê me xera kir hilanî navê mêra ye
kanî namûs kanî ĝîret kanî welat kanî milet
tu qet nabî ji wê `ibret kanî Kurmanc li kû maye
we xêre dîn û dîwane bi hev re bûne dijman e
çi weqt û va çi zeman e vaya ne xewna şeva ye
kî ye mirûd lê ey derwîş kî ye minkir `ecayêb îş
gî îslam in mekin teşwîş gî Kurmanc in çi de`wa ye
va ewladê dê û bava mekojin rohniya çava
xwe mavên şirk û dafa va penda xelkê zana ye
bi destbûsê tu ey ixwan nabê mirûd binir ĥeyran
kî zalimî da te ferman ĥelal kir qetlê nafsa ye
we berda şer`a pêxember we eşqiya kirin rihber
bûne win yahûdê xeyber ka însafa xwedê daye
binir dor xwe wekî te kes li zulmê dike hewes
meke vê zulm û cûrê bes eger tu dostê xweda ye

terîqeta Neqişbendî esas kê danî efendî
`eceb te va li kû xwendî bi dest te da bû sir maye
Tu yî xelkê ducirmînî tu `alemê dişewtînî
bi sîleĥ û bi martînê terîqet ka li kû maye
we dîn kir mesxere berda şerî`et kanî bi ser de
werin va kul û va derda çi derdekî vê dewa ye
netê bîra we Kurdanê `ered û `eyal bû talanê
teyara ar wa berdanê şewitandin mal bû talanê
sedaya top û teyara çû `ezmên werin bêtara
nalîna wan birîndara bi derket `erşa e`la ye
bû eniya şer wê çaxê çi ar berdane Kurdaĝê
tu baqil nebû wê çaĝê ketî ber bayê fitnayê
kê emir da te ey heval ĥeram çona dibe ĥelal
we berda emrê zû el-celal heva layiqê şer`a ye?
We xwe kir tam wekî çeta we xirakir va milleta
We kuştin vê sûc û xeta xort û camêrê Kurda ye
Bê bost û saqê ĥeyran73 tu nabî derwêş Yezdan
Li derdê te nabe derman terîqet ne bi qewla ye
Vê fitneyê ji dil çekin saqin îş xerap mekin
Kurd û Kurmanc em gî yek in şerî`t rêka giya ye
Aĝe kîn e Mirûd kîn e gî ummeta wî şahî ne
Kîna ji dil biderxîne dînê îslamê hana ye
Aĝe ji berê paşê de hew sikar in bi dinê de
We sed carî ji wan wê de zulim kir bi fiqara ye
Ne xêra we û ne xêra wan ji dest we em bûne ĥeyran
Ka însaf û kanî wicdan heva ne şertê mêra ye
Va karê we tukes nake binir li Kurdaxê cakê
Tukê Kurmanca şakê bi yek bi min xeber daye
Ger hûn xêrxwazê milet in ji we re va nesîĥetin
Carekê hûn ji rê ketin mekevin bes tu cara ye
Bes e ey derwîş nadan mekev ber bayê fesadan
Yek miletê xwe şadan heva şana dil ara ye
Bi te re ey sofiyê `esrê biger li Şam û li Besrê
Here Bexdad û here Misrê mirûdê xelkê çona ye
Kê emrê şer`î îcra kir nemaz û rojî ada kir
Xirabî wî ji dil rakir mirûdê ĥeq ti`ala
Bû xêrxwazê mislimana heval û dost û cîrana
Kî zane qîmeta vana ĥeqîqet ehlê teqwa ye
Binir derwêşê ĥeqanî kê berda dunya fanî
Wekî ĥedret Gêlanî kişandî dest ji dunayê

Cîhan berdeye wî cakê dilê kes ji xêrê nakê
Bi her exlaqeka pakê xwe kirî canê cana ye
Te dest nekişand ji dunyayê bi `ilm û zehd û teqwayê
Nabê derwîş axirayê tu ne mĥbûbê xweda ye
Binê em gî bûne bira Mihemed hate ji me re
Bû serwerê pêxembera dîn yek e va çi ĝewĝa ye
Ka wesîla bi dest te de seba dergahê xweda
Ey zalim ey facir kûde te dîn ji dest xwe berdaye
Tu hat sual û cewabê siba li roja ĥesabê
Tukê bidî çi cewabî li dîwanê mi`lla ye

*Bes e Minle Elî cana merêje le`il û mircana*
*Bixwaz xêra Mislimana nizane kes tu minla ye*

***

**Xoşxana `Îda El-cela**

Aferîn ey miletê pir serfiraz — we welatê sûrî ki bermiraz
Pir kişand we zeĥmet û cûr û cefa — hîro jî hûn dikin zewq û sefa
Bîst ĥeft sal in ji zulma ecnebî — rojekê kes bi welatî şa nebû
Bûn esîr û koleyê wan kafira — cûr û zulma wan li me zafira
Pir camêr bûn şehîdê ĥuroyetê — can fîda kirin seba vî miletî
Bi xwîna wan şehîdan me Sûrya — xelas kir ji destê kafira gîya
Pir mucahid derketin seba weten — xwîn rijandin dane ser him can weten
Bi hezaran xort û camêr bû şehîd — hew bi derbê kafirê har û belîd
Çaxa Îbrahîm Henano hate der — Ĥurrîyet î`lane kir wî serteser
Bi Firensa re wî kir ĥerb û cîhad — can fîda kir him danî riknê bîlad
Bi ĥesreta vî welatî pir şêrîn — dane ser can û rûĥê nazenîn
Ey firensa ey here carek din metê — ji qehra te re heman giriya me tê
Bi xwîna xort û camêra me weten — ji destê wan kafira girt reĝmeten
Hev welatê cid û ecdadê me ye — di dirûnê dil de hev hêva me ye
Ey welato rohniya çavên min — axa te pak bi xwîna bav diya min
Bi destê zorê ji destê ecnebî — wan xelas kir can bi qurbana te be
Bi dilê xweş ez dibêjm rûĥî fîdak — bi serê xwe tu hebî welatê pak
Seke Se`della mebê ez ji bîr kirim — bi ĥesreta te hêstira ez kor krim
Qehreman bû ey şahê Kurd û Ereb — te rakir şana weten ey pir edeb
Sed hezar rehmet li ser gora te be — navê te herdem li cîhanê hebe
Tu bixêr hatê eya `Îd el-celaa — te ji ser me rakirî mekir û bela
Hîro bi şa dibe çerx û felek — xortê camêr `esker û leşker gelek
Ey roja deh û ĥeftê nîsanê binir — Sûrya te kir xudan qedir û huner
Çi şan û şuhret ĥikûmet daye te — çi qedir û qîmeta millet daye te
Xweş bî ey Sûrye sal bi sal — bi vê istîqlalê tu bû pir kemal
Pir `îda xort û camêr te bikin — seba xatirê wetenê xwe şa bikin
Xweş be cimhûreta te her zeman — bi erkanê dewleta xwe ve heman
Bi hevalê te ke xwedê tim nesretê — ya dîma xwe ĥeq bi hevalê te ke
Ey serok milletê me û nasdar — qedir û qîmeta te pir bû aşkar
Tu hebî ey milletê `alî cenab — li cîhanê bi şeref wek mahtab75
Can bi qurbane te be şêrîn welat — li miha nîsanê roja te hilat
Miletê sûrî te rakir `alî şan — belav bû li gî dera nav û nîşan

*Şa bibe Minle Elî şev û seĥer*
*Li roja `Îd el-calaê pir huner*

***

## Hawar ji Siltan Selaĥddînê Eyûbî re

Hawar dikim bi zar û şîn Eya Siltan Selaĥddîn
Rabe tu xewa şêrîn şûr û mesrê şahim derxîn
Hawar Siltan Selaĥddîn
Selaĥddîn rabe ser xwe şûr û palê li kember xwe
Va ye dijmin bide berxwe zû li Yahûdê Xeyber xe
Hawar Siltan Selaĥddîn
Yahûd hatin ji Rojava binir ey rohniya çava
Filestîn dane ber gava wekî ĥerba selîb heva
Hawar Siltan Selaĥddîn
Selaĥddîn tu bû siltan li ser Kurd û li ser Ereban
Li rêka dîn te kir qurban şahînşahan gî mal û can
Hawar Siltan Selaĥddîn
Selahiddîn di gorê de bixwaz îmdadê ji xweda
Ji dest van em herin kû de ji weten me dikin cuda
Hawar Siltan Selaĥddîn
Ĥeya îslam gî nebin yek xelas nabi û cûrê sek
Gî ĥerb û zeĥmet û êmek lê bi Yeûdê derê derê vê şek
Hawar Siltan Selaĥddîn
Binir şaha ez Kurd im bi ĥesret û kul û derd im
Dinalim şahê min her dem ĥeya canê xwe bi ser dim
Hawar Siltan Selaĥddîn
Nav û dengê te pir rabû li roavayê balav bû
Bi navê te cîhan şa bû tu qehremanê Kurda bû
Hawar Siltan Selaĥddîn
Ji ber Zoyê Ĝira derket va derwîşa bi eşqê ket
Rabin serxwe ey milet ne şerm e ji we re zillet
Hawar Siltan Selaĥddîn
Rabo serxwe ey îsalam li Bexdad û li Misir û Şam
Feqîr û zengîn û giş `am bes e hev şora wesselam
Hawar Siltan Selaĥddîn
Heva Minle Elî be xweş şeraba eşqê wî kir noş
li biyehûdî şora mefroş fanî dunya gî boş e boş
Hawar Siltan Selaĥddîn
***

**Xoşxana Mektebê**

Hevalê delal were here mektebê      bixwîn binivîsîn bi roj û şevê
Hemî mal û serwet bi qurban te be      bila navê te jî li cîhanê hebe
Bi vê xwendinê xelk û `alem binir      li rûyê cîhanê çi hîştin eser
Di zendê te de hev dibe zêrê zer      te dike serfiraz û xudan pir huner
Bermede xwendinê xwendevanê şêrîn      ji te re ey ciwan sed hezar aferîn
Ji dest ecnebî vê welatî derîn      ne bes e ttalema wan em kirin dilbirîn
Xwendinê te rake şah û `alî cenab      pir welat bi cehaletê ca bûn xerab
Xwe meke pir cehalet bixwîne ha kitab      ger tukê li cîhanê bibî mahetab78
Ger tu nexwende bî qedir û qîmet nema      firsetê bermede tim bixwîn hema
Welatê me ê şêrîn çav li rêka te ma      tuyê bibî serbilind mekşîne tu xema
Ne şerm e ji te re tu xwe cahil dikî      ey heval pir kemal were tukê guh li mikê
Seke Minle Elî qîmeta mektebê      zani be xwendevan  dixwînin edebê
xwendinê ey heval ger lê tunebî      li cîhanê ez şa bibim qet mebê

***

**Çiyayê Kurmanca**

Çayê Kurmênc  ez bi ĝulamê  te guhlêne  va şêrîn kelamê
Tu çakî xweş  kîbar û şên e  tu ne mîn-ze79  te ĥeya Şamê
Nav gulîzarê  te wekî bilbil  ez dinivîsim  ji te re namê
Çi baĝ û baxçê  te pir bi dar in  dixwîne bilbil  çi xweş silamê

Çayê Kurmanca  te canê min şa kir  va kul û derdê  min te dewa kir
Va xelkê nezan  qedir û qîmeta  te nizanîn ĥeyf  wan xera kir
Tu welatekî  bi xêr û bêr bû  welatê Sûryê  te roşna kir
Bi nan û danê  xwe pir comerd e  te comerdî li  xelkê belav kir

Heya Buharê  berfa te narê  li zivistanê  hew tim dibarê
Çi baĝ û bostan  him bi gulistan  dixwîne bilbil  bi ah û zarê
Xew nakî tu şêrîn  li siĥirgahan  ez bi qurbana  zilf û rixsarê
Şerbeta eşqê  min vexwar cakê  kes nizane vê  sirr û esrarê

Çayê Kurmanca  ez dil birîn im  ji dest xelkê te  bi zar û şîn im
Du çiya te hene  çi xweş bilind in  ez şa`irê wan  çayên şêrîn im
Bi wan re dibêjin  Zoyê Gira em  bi arê eşqê  ez pir ĥezîn im
Derwîşekî pir  sûc û xeta me  aşiq cemala  Taha el-emîn im

Çayê Kurmanca  ser bi dûman e  ĥal û eĥwalê  te pir yaman e
Bi ĥêr û rezan  wekî gulistan  dilo ez ĥeyran  hew vê xudan e
Cahil exelkê  vî welatê xweş  Çayê Kurmanca  vê xwendevan e
Zulm û istîbdad  em kirin berbad  em tim esîr in  qe kes nizane

Çayê Kurmanca  çakî delal e  ava xwe sar e  çi xweş zelal e
Ne şerme ĥeyran  em xêre ne xwînin  xwendin bi her  kes re heval e
Ger hûn dixwazin  serê xwe rakin  bixwîn xwendinê van  tim pir kemal e
Minle Elî tu  xweş dinivîsînî  wer va ĥeyata  xewn û xeyal e

***

## Pesna Resûlê Kibriya

| | | | |
|---|---|---|---|
| Ey mucteba | sed merĥeba | aşiqê te me | roj û şeva |
| Dil xalî bû | ne ji te ba | sed aferîn | sed merĥeba |
| | | | |
| Bejina şêrîn | dil kir ĥezîn | aşiq te me | şahê gezîn |
| Şewqa te da | rûyê zemîn | sed aferîn | sed merĥeba |
| | | | |
| Ez bi ĝulam | şêrîn kelam | nûra te wek | hêva temam |
| Navê te xweş | \`alî meqam | sed aferîn | sed merĥeba |
| | | | |
| Ey destgîr | ez bûm esîr | xelaske min | ey por ĥerîr |
| Tu yî beşîr | tu yî nezîr | sed aferîn | sed merĥeba |
| | | | |
| Ey mistefa | ey pir wefa | ji derdara | tu yî şîfa |
| Bi min meke | Cûr û cefa | sed aferîn | sed merĥeba |
| | | | |
| Ey \`alî şan | \`enber feşan | ey şahê bi | nav û nîşan |
| \`alem te bi | reĥmê rişan | sed aferîn | sed merĥeba |
| | | | |
| Ez bi dora | Taha el-emîn | hat reĥmet | lîl \`alemîn |
| Ey fexra | \`erd û \`ezmên | sed aferîn | sed merĥeba |
| | | | |
| Nûr el-hude | şêrîn sseda | bûn xizmetkarê | canim fîda |
| Tu meĥbûb e | li ba xweda | sed aferîn | sed merĥeba |
| | | | |
| Şahê me sek | ĥorî melek | ey nûra | rê te gulek |
| Bi şewqa te | şa bû felek | sed aferîn | sed merĥeba |
| | | | |
| Hezar silam | xeyr el-enam | li ser te fexir | \`alî humam |
| Ji enbiya re | bû îmam | sed aferîn | sed merĥeba |
| | | | |
| Sed el-eman | fexir cîhan | bi eşqa te | biĥelê |
| Hew li cîhanê | Efdel e | sed aferîn | sed merĥeba |
| | | *** | |

**Xwendevan**

Wer heval em gî herin xweş mektebê ger tukê bixwînî `lim û edebê
Xwendin wer karekî pir şêrîn e di zendê te de bazingê zêrîn e
Xwe meke cahil bi cehlê de mere xwendin bi dest te de zêrê zer e
Xwendinî teca serê te ye heval bi şev û ro bixwîne ew pir kemal
Ey heval li xwendinê wer bibezin xwendinî mirad li mîrê mezin
Her çi derket serekê wê xwendin e xwendevan daîme serbilndî ye
Xwendin mera dike emîr û şah bi `lim û xwendinê ey `alî penah
Kî nexûne cahil e û nezan e hew ĥecî ku xwend şahîn û şahan e hew
Bi `lim û xwendinê nav xweş û şêrîn ji te re bêjim hezaran aferîn
Xwendevanê Kurd û Kurmancê delal ez ketim bextê te we seydayê heval
***

**Ne`it Şerîf**

Ketime bextê we birano bermedin rêka Mihemed
Wer hevalo wer cîrano bermedin rêka Mihemed
Serwerê axir zemanê ins û cin hanî îmanê
Kî eger xatirê wî zanê bermedin rêka Mihemed
Nûra wî `alem ddiya kir xelk û `alem pevda şa kir
Kifir û şirk ji `erdê rakir bermedin rêka Mihemed
Xêr vê rahê keştî xarin xarbûna wan aşkar in
Ummeta wî bextiyar in bermedin rêka Mihemed
Hev rêka ĝayet selîm e hev sîratê musteqîm e
Ji gî derda re ĥekîm e bermedin rêka Mihemed
Bermedin rêka wî şahî seba xatirê wî rûmahî
Ji me re pişt û penahî bermedin rêka Mihemed
Wî cîhan gî roşna kir emrê barî wî eda kir
Zikir û ta`eta xweda kir bermedin rêka Mihemed
Sinneta wî xweş eda kir cên li ber payê fîdak in
Exlaqê wî giştî pak in bermedin rêka Mihemed
Guhlêne şahê min xeber da şer`a wî kê ji dest xwe bera
Vê guman wî dîn biderda bermedin rêka Mihemed
Hev rêka ĝayet metîn e hev rêka şer`ê mûbîn e
Rêka reb el-`alemîn e bermedin rêka Mihemed
Ummetê xêr win belav bûn ji rêka ĥeq win cuda bû
Tarikê rêka xweda bû bermedin rêka Mihemed
Seke ey dîn û dîwan e `aqubet pir pir yaman e
Were bira axir zeman e bermedin rêka Mihemed
Xwaş binir Minle Elî wer merêje yaqût û cewher
Can bi qurbanke pêxember bermedin rêka Mihemed
Pir silav û pir selat wîne li fexrê kaînat
Al û esĥabê wî zatî bermedin rêka Mihemed

***

**Bîsmî Ellahî el-reĥman el-reĥîm**

Ya reb sellî `ele el-nebî el-mucteba      ma ĝeredet fî
***<u>erebî</u>***

**Bîsmî Ellahî el-reĥman el-reĥîm**

Meded ey serwerê `alem bi ĥesreta te dinalim
Bi qurban rûyê delal im şefa`et ya resûl Ellah
Meded ey reĥmetê reĥman şefa`et kanî ez qurban
Xudanê weĥî him Quraan şefa`et ya resûl Ellah
Meded ey mezherê lewlak biqurban wa cemala pak
Tukes meĥrûm nake ĥaşak şefa`et ya resûl Ellah
Tu meĥbûbê me ye dilbir biqurban wa rûyê enwer
Tu ji xelkê re bû rihber şefa`et ya resûl Ellah
Hatim ber xakpaya te ĥebîbê min can fîda ye te
Dixazim ez ridaya te şefa`et ya resûl Ellah
Hatim dergahê vê gavê xudanê zemzem û avê
Çi xweş e şêrîn û navê te şahî ya resûl Ellah
Binir Minle Elî Taha sêfîl û `aciz e niha
Dixwaze îmdadê şaha şefa`et ya resûl Ellah
Hezar selat hezar selam li ser te ey fexrê enam
Ser al û esĥabê kîram şefa`et ya resûl Ellah
***

## Xoşxana Medîne Mûnewer

Medîne textepayê Mistefa ye — Medîne xweş medîne xweş medîne
Nezrgahê xwedayê kibiriya ye — Medîne xweş medîne xweş medîne

Medîn efexir `alem lê peya bû — Medîne menzila weĥiyê xweda bû
Medîne nûr û Quraan lê balv bû — Medîne xweş medîne xweş medîne

Medîne merqeda fexir zemîn e — meqamê wî şefî` el-muznîbîn e
Bi `eşqa wî çêkir bi zar û şîn e — Medîne xweş medîne xweş medîne

Medîne Ke`beyê `uşşaq e herdem — Medîne xweş cîhan kir şad û ĥerem
Medîne şehrê pak şahê zemzem — Medîne xweş medîne xweş medîne

Mihacirîn û ensarê wî şahî — can û mal gî fîda li rahî
Ji wî re bûne xweş pişt û penahî — Medîne xweş medîne xweş medîne

Medîne li rêka dîn can heba kir — Medîne dewlet û şaname rakir
Medîne ji her derdan re derman — Medîne xweş medîne xweş medîne

Medîne bi ĥesretê dinalim — bi eşqa şahê `alem pir kemal im
Bi şewqa wî ĥebîbê pir delal im — Medîne xweş medîne xweş medîne

Wekî bilbil şeyda ez diwînim — bi eşq û şewqa te cîger bi xûn im
Bi şev û ro bi giryan û şîn im — Medîne xweş medîne xweş medîne

Medîne baĝ û bistanê te xweş in — Medîne xelkê te comerd û baş in
Medîne te cîhan kir pevda rewşen — Medîne xweş medîne xweş medîne

Te dî wa fîheyê kesk xweş li banî — di bin dara ketî fexir cîhanî
Şewqa xwe rabûye ta ezmanî — Medîne xweş medîne xweş medîne

Mabeyna menberê û ĥeya bi gorê — wekî rewda cînanê ez li dorê
Cîhan pevda ronahî kir bi nûrê — Medîne xweş medîne xweş medîne

Medîne xweş bajarekî kîbar e — bi ĥesretê çêkir bi ah û zar e
Eşq û şewqa xwe ji serê me nare — Medîne xweş medîne xweş medîne

Binirin çayê Uĥud xweş çiya ye — şêrîn e pir bilind e can fîda ye
Meqamê ĥedret Ĥemze tê de ye — Medîne xweş medîne xweş medîne

Serekê şehîdên Uĥudê bû hew apê fexir cîhanê bû binir hew
Seyêd el-şuheda bû vê guman hew Medîne xweş medîne xweş medîne

Temaşekin li mescidê qebayê meqamê hew ĥebîbê kibriya ye
Li wir eda kiriye zikir û selayê Medîne xweş medîne xweş medîne

Bi eşq û şewqa wî `erdê medîn im bi ah û zar û giryanê û şîn im
bi ĥesreta Medînê dilĥezîn im Medîne xweş medîne xweş medîne

bila Minle Elî her weqt her car li ber wê xakepayê pir bike zar
şefa`et kanî ĥebîbê min keremkar Medîne xweş medîne xweş medîne

hezar selat û silavan werîn e li rûĥê şahînşahê Medîne
Mihemed mistefa fexra zemîn e Medîne xweş medîne xweş medîne
***

**Ne`t Şerîf**

| | |
|---|---|
| Hatim ber xakpayê ez | Şefa`et ya resûl Ellah |
| Bi derd û vê `îlac im | hawar ya resûl Ellah |
| Bi eşqa te dikim nalî | binir şahê min li vî ĥalî |
| Ketim bexta te û `alî | Şefa`et ya resûl Ellah |
| Gunehên min paşi netên | dili û cîger bi şewat in |
| Aşiq fexir kaînat in | Şefa`et ya resûl Ellah |
| Ĥedîsê te ya serwer | ji yaqût û cewher |
| Şahêm tu yî xudan kewser | Şefa`et ya resûl Ellah |
| Tu yî him rûĥ û him rîĥan | li ber payê te can qurban |
| Cavê min kor bûne ji giryan | Şefa`et ya resûl Ellah |
| Hatin dergahê siltana | bi ah û zar û evĝana |
| Hezar carî bi ĥeyrana | Şefa`et ya resûl Ellah |
| Bi destê boş hatim şaha | meqewtîne min ji dergaha |
| Hawar dikim meded Taha | Şefa`et ya resûl Ellah |
| Dirêjim hêstrên çava | ĥeya ro tim dere ava |
| Li ser wa ruhniya çava | Şefa`et ya resûl Ellah |
| Hate Minle Elî destboş | hawar dike şahê navxweş |
| Bi ĥesreta xwe kir nexweş | Şefa`et ya resûl Ellah |

***

**Ne`it Şerîf**

Fîdayê te li dê û bavê min wer ya resûl Ellah
Ji dergahê meqewtîn va qûlî wer ya resûl Ellah
Ez im `asê ez im nadim ĥelandim ah û firyadan
Meşewtîn min bike şadan şefa`et ya resûl Ellah
De`îf im ez perîşan im nexweş im ez vê derman im
Ketim bextê te luqman im şefa`et ya resûl Ellah
Dinalim bi ah û zarê bi pêş min ke wê xusarê
Temaşakim li dîdarê meded wer ya resûl Ellah
Birîndar im birîn kûr im, ez ĝerîb im ez welat dûr im
Gunehkar im pir qusûr im hawar dikim resûl Ellah
Bi ĥesreta te ey şaha ĥelîm şewitîm binir niha
`aciz hatime dergeha te şahî ya resûl Ellah
Ĥebîbê min cîgerxwîn im bi eşq û şewqê meftûn im
Dişewitim wekî mecnûn im şefa`t ya resûl Ellah
Meded Minle Elî şake li ĥalê me temaşake
Aşiq bejina te a pak e şefa`et ya resûl Ellah
Selat û bi silama ve li ser te rohniya çava
Ĥeya ro tim dere ava hezar car ya resûl Ellah
***

Ez aşiqê te me binir can bi qurban xeyr el-beşer
Şewqa te `alem serbiser derxist ji kifir û zulmetê
Ey canê can sed eman ey fexra `erd û asîman
Ĥal perîşan e pir yaman e hatime rica û minnet
Bi eşqê dil wêran e bû bi nalîna dîwan e bû
Ah rojekê dil qet şa nebû ji dest cefa û miĥnet
Hêstirê cavê min binir şewitandin dil û cîger
Mestane kir derbider were biderîn ji zeĥmet
Hawar dikim ey Mistefa ey pir kerem ey pir wefa
Xelaske min ji cefa hawar ey şahê ummet
Minle Elî bi ah û zar hawar dike ey bextyar
Pir qusûr e ew stûxar dixwaze hew şefa`t
Hezar silav ey canê can li ser te ey fexrê cîhan
Hawar dikim sed eman xudanê tac û dewlet
***

**Ne`it Şerîf**

Erê firqetê çi bi şewatê
rohniya çavê min ya resûl Ellah
Vê te sebra min `acizî netê
ey canê canan ya resûl Ellah
Ketime bextê te şêrîno niha
zar û giryana şahînşaha
Wer xelske min ji wê dergaha
wey xweda ĥeq ya resûl Ellah
Ez bextiyar bûm ey şahê lewlak
çaxa mi dî wa ĥerema te û pak
Li dîwana xwe va dilî min şake
bi şefa`etê ya resûl Ellah
Ji menberê de ĥeya bi gora te
şewqê da dinê çi xweş nûra te
Dil aşiqê wa gulîsora te
sed hezar meded ya resûl Ellah
Hew qubeya xweş kesk û şêrîn
ronahî kir pevda rûyê zemîn
Bi zar û giryan dil bûye birîn
can bi qurbanê ya resûl Ellah
Ez têr nebûm ji nûra rûyê te
wek qabe qewsên e wa birûyên te
Çi xweş e xelq him wa xewa te
ez biĥeyranê ya resûl Ellah
Kete quraana `ezîm el-şanî
mediĥ û sena ya fexir cîhanî
Qedir û qîmeta te xwedê zane
gihîşt esmana ya resûl Ellah
Ebû Bekir El-sidîq ya ĝara te
`Umer El-farûq bextiyarê te
`Usman û `Elî her çar yarên te
xweş heval bûn hew ya resûl Ellah
Ji dûrwelata hat va ĝerîba
Minle Elî bandike Hebîba
Tu ji derd û kulên wî re tebîb e
ey kerem kanî ya resûl Ellah
Hezaran selat û pir silava
li ser te ey xweş roniya çava
Dikim qurban te dê û bava
kanî şefa`et ya resûl Ellah

***

## Îlahî yê Ĥîcazê

Ez bi qurban rêka te me ey Meke El-Mukerreme
Ez mîvanê xaka te me ey Meke El-Mukerreme
Tu bajarekî çi xweş î tu pir şêrîn û pir baş e
Tukes meĥrûm nakî ĥaşa ey Meke El-Mukerreme
Xudan Ke`ba Mu`ezzem e xudanê ava zemzem e
Dergûşa şahê ekrem e ey Meke El-Mukerreme
Cî yê weĥî û rîsaletê meqamê şahê ummetê
Ez li dorê xweş ni`metê ey Meke El-Mukerreme
Wer xweş tewafke ey bira can bi qurban Um El-qura
Wîn bîra xwe ĝar el-Ĥîra ey Meke El-Mukerreme
Tu şarekî mubarek î li min binir tu carekê
Derwêş im nakim karekî ey Meke El-Mukerreme
Her ku dinirim kevirê reş pêş cavê min wek lale geş
Wer çî şêrîn e wer çi tu xweş ey Meke El-Mukerreme
Xweş sêrke li Bêt El-Ĥeram hewe Ke`beya `alî meqam
Can bi qurban Bab El-selam ey Meke El-Mukerreme
Wer menzera Ĥecê seke li ĥeca can temaşeke
Kul û birîna veke ey Meke El-Mukerreme
Çaxa tewafê bandikin lebbeyk dibêjin aman dikin
Bi ĥesreta giryan dikin ey Meke El-Mukerreme
Ji Merwe de ĥeya bi Sefa meş ĥebîbê min Mistefa
Hew pir kemal û pir wefa ey Meke El-Mukerreme
Qêrîna wan çiya û çema dîĥelîne der sema
Bi zar û giryana hema ey xweş Meke El-Mukerreme
Ĥecacî pak dest radikin bi bergera di`a dikin
Bang ĥedretî xweda dikin xweş Meke El-Mukerreme
Ji nav `Eşîret Biya hatime ĥidûrê kibriyaa
Ey fexra şahê enbiya xweş Meke El-Mukerreme
Ez derd giran û `aciz im ez dilwêran û nacêz im
Ez bi giriyan xûn dirêjim ey Meke El-Mukerreme
Ey ke`begaha ummetê wek firdosa cinnetê
Bi xemil û xweş û zînetê ey Meke El-Mukerreme
Ez bi eşqa te qe nemam ey Ke`be ya `alî humam
Her ne`metek da te temam xweş Meke El-Mukerreme
Minela Elî wer pir menal bixweze ji xwedê wîsal
Hew pir wefa ye pir kemal xweş Meke El-Mukerreme
Hezar selat hezar silav li ser ĥebîbê min xweş nav
Bi qurban rûyê xweş gulav ey Meke El-Mukerreme

Li ser rûĥê enbiya　　　　　al û esĥabê wan giya
Li ser ĥebîbê kibriya　　　　　ey Meke El-Mukerreme

***

## Îlahîyê Ĥîcazê

Bi vê eşqê bi va janan          dişewtînim dil û cana
Cavên min kor bûn bi giryana          binir ĥecacên Beyt Ellah
`erdê xêr û bereketê          li wir reĥma xwedê datê
Ji her welatekî hatî          binir `aşiqên Beyt Ellah
Dibare reĥmeta barî          li ser xelkê gunehkarî
Dibêjin lebeyk hezar carî          binir ĥecacên Beyt Ellah
Va xelk û `alema her aan          dixazin reĥmeta reĥman
Can û mal gî dikin qurban          binir aşiqên Beyt Ellah
Dibêjin lebeyk bi afĝana          dere ĥeft qatê `ezmana
Dixazin reĥm û ĝufrana          binir ĥecacên Beyt Ellah
Ji her koşên cîhanê          kerem dibin li wî mekanî
Tewaf dikin bi nalanê          binir aşiqên Beyt Ellah
Temaşekin li ummetê          dikin reca û minnetê
Wekî roja qiyametê          binir ĥecacê Beyt Ellah
Hawar dikin bi bergera          ji wê roja meĥşera
Bûye qiyamet hew dera          binir aşiqên Beyt Ellah
Bi ah û ĥesret û zara          nalîna wan gunehkara
Dere `erşê bi hawara          binir ĥecacên Beyt Ellah
Ĥelîm şewitîm bi sewdayê          wek Mecnûnê Leylayê
Dilê xemgîn sebir nayê          binir ĥecacên Beyt Ellah
Xwedê zane wekî dîna          bi zar û giryan û şîna
Hawar dikim bi nalîna          binir ĥecacên Beyt Ellah
Bala xwe bide ĥicaca          bi zar û minnet û rica
Van derwîşan û van xoca          binir ĥecacên Beyt Ellah
Li hember wan diĥelê can          kesera wan dere `ezman
Dixazin ji xwedê derman          binir ĥecacên Beyt Ellah
Bixwaz Minle Elî herdem          ji derd û kulên xwe re melhem
Bicahê resûlê ekrem          binir ĥecacên Beyt Ellah
Selat û pir selaman wer          wîne li rûĥê pêxember
Hewa ji me re rihber          binir ĥecacên Beyt Ellah
***

## Îlahiyê ĥîcazî

Bi ah û nalîna hatim ziyaretkim te beyt Ellah
Bi zar û giryan hatim ziyaretkim te beyt Ellah
Xerîb im ez welat dûr im xudan guneh û qusûr im
Cîgerxwîn im û çavkor im bi meraqa te beyt Ellah
Dost û heval min gî berdan him zaro mal gî bi serda
Ĥelîm şewitîm bi van derdan seba xatirê te beyt Ellah
Hezar şukir û sena her dem ji te re ey xweda reĥman
Mal û ewlad min kir qurban seba xatirê te beyt Ellah
Bi barê pir giran im ez bi eşqê dilwêran im ez
Feqîr im ez bêcan im ez bi ĥesreta te beyt Ellah
Xweda ez dibêjim hawar li dergahê meded sed car
Bi giryan û fîĝan û zar bi ĥesreta te beyt Ellah
Ez derwîşekî nadim im bi pir qusûr û niqsan im
Hatim dîwana siltan im ziyaret kim te beyt Ellah
Rûyê xwe li ber wê axa pak çeke `erd dilê xwe şak
Xwedê qe kesî meĥrûm nake seba xatirê te beyt Ellah
Mirazê min va bû carekê tewafkê Ĥerema pakê
Dilê min terga wî nakê bi qurbana te beyt Ellah
`erd û weĥî û rîsaletê ji wan baĝên cinnetê
Hatim bi zar û ĥesretê ziyaretkim te beyt Ellah
Li dergahê dikim hawar ji cavê min hêstir tên xwar
Xelaske min meded her car li boyê eşqa beyt Ellah
Hev derwîşê Biyanî hev Minleyê Kurdan e
Cîger şewitand vê dîwanê bi eşq û şewq beyt Ellah
Hev e Minle Elîyê dîn bi giryan û bi zar û şîn
Cîger pevda kire birîn bi nalîna wê beyt Ellah
Selata pir werîne tu li ser fexra zemînê tu
Bi eşqê dil birîne tu ketim bextê te beyt Ellah

***

**Ne`it Şerîf**

Bilbilê bağan im li nav gilista im
bi eşqê mestan im ez ya resûl Ellah
Her mest û ĥeyran im bi zar û giryan im
derwîş û nezan im ez ya resûl Ellah
Meded ey siltanê min cana bi qurban im
Hawar vê derman im ez ya resûl Ellah
Şaha perîşan im hatime ba Luqman im
bi ah û efxan im ez ya resûl Ellah
şefî`ê ummetê roja qiyametê
derxîn ji zeĥmetê me ya resûl Ellah
ey serwerê `alemê bi eşqê dinalim
pêçare bû ĥalêm pir ez ya resûl Ellah
resûlê kibriya ey serwerê giya
xatima enbiya meded ya resûl Ellah
meded ey pakzat ey fexir kaînat
ji `alemê re hat meded ya resûl Ellah
tu mahêtab anî derd û xişman î
nêrgiz û rîĥan î tu ya resûl Ellah
fexra zemînê tu rû yasmîn e tu
qamet şêrîn î tu ya resûl Ellah
Minle Elî hatî cem te pakzatî
Bi zar û şewatê meded ya resûl Ellah
Hat ber xakpayê bi eşq û sewdayê
Ey pişt û bînhiya me ya resûl Ellah
Selat û selama werin subiĥ û şeva
Ser alî meqama Ehmed resûl Ellah

***

## Îlahiyê Ĥîcazê

Ey aşiqê beyt el-heram him ke`beya `alî meqam xweş zemzem û deriyê el-selam
Can biqurbanê beyt Ellah can biĥeranê beyt Ellah
Ey zairê her du ĥerem silavke şahê pir kerem hew pir kemal muĥterem
Can bi qurbanê beyt Ellah can bi ĥeyranê beyt Ellah
Ey zairê `erdê Ĥîcaz xwedê tu gihande her miraz pir du`a bike bi niyaz
Can bi qurbanê beyt Ellah can bi ĥeyranê beyt Ellah
Te bi çavan dît `Erefat tê de pir xêr û berekat xweda da destê te berat
Can bi qurbanê beyt Ellah can bi ĥeyranê beyt Ellah
Tu hat Mizdelîfe bir çi dewlet da te li wira can bi qurban Um el-qura
Can bi qurbanê beyt Ellah can bi ĥeyranê beyt Ellah
Bi royê re tu gihîşt Mîne wer bike ĥemd û sena te qurban kir ey roşna
Can bi qurbanê beyt Ellah can bi ĥeyranê beyt Ellah
Te bi çavê xwe temaşe kir te can rûĥê xwe şa kir ferza ĥecê te eda kir
Can bi qurbanê beyt Ellah can bi ĥeyranê beyt Ellah
Tu bi xêr û silamet hat mîvan fexir kaînat can bi qurban pakîzat
Can bi qurbanê beyt Ellah can bi ĥeyranê beyt Ellah
Binir tu çû bayê ssîba rewda resûlî mucteba lêke silav bêje merĥeba
Can bi qurbanê beyt Ellah can bi ĥeyranê beyt Ellah
Minle Elî bi ĥesreta te bike rica û minneta herkes nabe va dewleta
Can bi qurbanê beyt Ellah can bi ĥeyranê beyt Ellah
Ey ĥacê Ke`ba şerîf banke ya ĥey û ya letîf hatim dergahê pir de`îf
Can bi qurbanê beyt Ellah can bi ĥeyranê beyt Ellah
Ey zairê rewdeya pak bêje ey ĥebîb rûĥî fîdak bi dîdarê dilê min şa ke
Can bi qurbanê beyt Ellah can bi ĥeyranê beyt Ellah
Lêke selat û pir selam ser Mistefa xeyr el-enam him al û esĥabê kîram
Can bi qurbanê beyt Ellah can bi ĥeyranê beyt Ellah

***

**Ne`it şerîf**

Bextiyar im ey resûlê kibriya ez bextiyar
çaxê ez dinivîsim va ne`meta pak bi `izzetê
Ey ĥebîbê min min-ze te neda çerxûfelek
Wek dara ttobe ye bejina te û delal bi qametê
Wer ĥeqîqetê tu yî ba`itê xelqê cîhanê
<u>Meke nest `erş û e`la heke </u>qadir û qîmetê 103
Xwedê zane tu yî cana zîneta rûyê zemîn
`eceba mimkune kes bîr bike va xweş ni`metê
Wan kesan kifir û cehalet kiri bû karê xwe wan
Hatine îmanê çaxa dîn hew pinahê ummetê
Xakpaya te ji çavê min re nûr e wer çi nûr
Roja Ĥeşrê her kesî derdixe ew ji zulmetê
Mahetaba her du `aleman tu ye fexra zemîn
Şewqa te da asîmanê pevda ket bin zînetê
Lutf û îĥsana xwe şahê min tu ji ser kesî nabirê
Wer qebûlke ey şahinşahê cîhanê vê ĥacetê
Ji cîger de min dixwast ez pesna te bi karê xwe kim
Rûreş im ez ustuxar im lê bûyî şefa`etê
Wergî `aciz im nikanim pesna te şahî bikim
Wî xwedayî rakirî xweş tu bi qedir û qîmetê
Wer azadke ey keremkarê me bi lutfê meded
Ĥaşa ku meĥrûm bibe kes ji ĥenan û reifetê
Şewq û şemala te bi şev roj natê der
Di derûna dil de wekî mûma her dem vêketî
Ins û can gî xizmetkar in ey resûlê kibriya
Padîşah bûn xizmetkarê te bi şan û şuhertê
Can bi qurban ew selatê te bûye xweş karê min
Wer meqewtîn vê gunehkarî şefî`ê ummetê
Hatime dîwana te wer kermke ezbenî
Ya resûl Ellah şefa`et ezbenî şefa`etê
Tu wesîla me ye li ba ĥedretî barî xweda
Ey xudan lutf û kerem hatime ba te rica û minnetê
Ez dinalim ey ĥebîbê min ey kerem kanî meded
Tu yî destgîrê `alem tu xudanê dewletê
Tu yî fexra asîmanê tu yî şahê enbiya
Tu yî zîneta zemînê ev gî li bejina te tê
Sed hezar reĥmet li ser gora te be Minle Elî
Bi meqamê teke xweda firdos û baĝê cinnetê
Bi ĥelîn dil û cîger bi şev û roj bi nalîna

Can bi qurban xakpayî ke tu û rebbê ĥurmetê
Pir selat û pir silavan bixwîne çaxê seĥer
Birêje hêstirên xwînê bi ah û bi ĥesretê
Bi şefî`ê ummetê tu yî meded şahê min meded
Ummeta xwe wer azadke ji cefa û reĥmetê
***

## Ne`it Şerîf

Aşiq navê delal im     hawar Eĥmed hawar Meĥmûd
Bi ĥesretan dinalim     hawar Eĥmed hawar Meĥmûd
Resûlê `alîşan e tu     şahê min fexra cîhan e tu
Ser gî enbiyan e  tu     hawar Eĥmed hawar Meĥmûd
Şahê min tu bavê Zehra ye     tu fexra Al `Eba ye
Bejina te dara toba ye     hawar Eĥmed hawar Meĥmûd
Resûlê bi sefa ye tu     Mihemed Mistefa tu
Şêrîn û pir wefa ye tu     hawar Eĥmed hawar Meĥmûd
Aşiqê bejin û balav im     bi qurban rûyê gulav im
Fîdayê te dê û bavê min     hawar Eĥmed hawar Meĥmûd
Nav û şanê te zatî pak     hewalda (wema erselnak)
Vî derwîşî meke xemnak     hawar Eĥmed hawar Meĥmûd
Dişewitim wekî perwanan     ahên min derin `ezmana
Meded wer ey canê cana     hawar Eĥmed hawar Meĥmûd
Şahê min ez destvala me     aşiq wan xet û xala me
Bi şewq û bejin û bala me     hawar Eĥmed hawar Meĥmûd
Tu arê ferqetê zanî     şewitandî dil û canî
Va derwîş vî dîwanî     hawar Eĥmed hawar Meĥmûd
Xerîb û dûrwelat im ez     bi zar û şewat im ez
Esîrê miĥneta me ez     hawar Eĥmed hawar Meĥmûd
Binir Minle Elî canî     xwe pevde kirî qurbanî
Li ber payê te siltanî     hawar Eĥmed hawar Meĥmûd
Hezar selat keremkanî     li ser fexrê cîhanî

***

## **Ne`it Şerîf**

| | |
|---|---|
| Şewitand min dil û cîger | ji dest eşqa te Eĥmed e |
| Dîwane bûme derbider | ji dest eşqa te Eĥmed e |
| Binirin hêstirên çavan | diherikin ta rojava |
| Ji pişkên wan tavan | ji dest eşqa te Eĥmed e |
| Bi ah û zar û giryana | bi ĥesret û bi nalana |
| Feda dikin dil û cana | ji dest eşqa te Eĥmed e |
| Bi çiya û çeman ketim | bi ah û zar ĥesret im |
| Bi derdê giran û `illet im | ji dest eşqa te Ehmed e |
| Ahînê min derine ezmana | lê nabînim tu dermana |
| Dişewtînim dil û cana | ji dest eşqa te Ehmed e |
| Şewqa te da rûyê zemîn | ey fexra `erd û `ezmên |
| Bûne buhar dinya û dîn | ji dest eşqa te Ehmed e |
| Zerrak ji eşqa te a şêrîn | dil û canê min kir birîn |
| Roj û şevan bi ah û girîn | ji dest eşqa Ehmed e |
| Were ey nazenîna min wer | cîhan pevda gî serbiser |
| Hawar dikin xeyr el-beşer | ji dest eşqa Ehmed e |
| Minle Elî wer pir menal | bi ĥesreta şahê delal |
| Fîda kir min mal û mewal | ji dest eşqa Ehmed e |
| Bi hezaran şahê min selat | li ser canê te pakîzat |
| Ĥebîbê min fexir kaînat | ji dest eşqa te Ehmed e |

***

## Ne`it Şerîf

Bi Xwedê kî wer temaşekin li wa rûyê nûranî wer
Can û riĥê xwe fîdakin li ber wa payê pêxember
Hewa çi canê cana bû hewa meĥbûbê xweda bû
Hewa dilbirê re`na bû hew e şah û hew e sirûr
Hewa fexra cîhanê bû xelata asîmanê bû
Bilbila xweş cînanê bû `alem jê re gî bû kêmtir
Hewa nûrek minewer bû bejin yaqût û cewher bû
Hewa surrek muteher bû hew xudan rûyê enwer
Îmamê enbiya bû hew mefxera wan gîya bû hew
Rihberê ewliya bû hew hew xudan ava kewser
Hewa bû rohniya çavan ji rojhilat û rojava
Şêrînê wan dê û bavan hew e can û hew cîger
Hew e meĥbûbê vî canî bejin balav û subĥanî
Hew e reĥmetê reĥman î şefî`ê `alem serbiser
Hew e sosin hew e sinbil hew e gulzar hew e bilbil
Hew e me`şûqê can û dil hew e misk û hew e `enber
Hew e xudanê Îsrayê xudan qedra mi`lla ye
Bi eşqa wî dilê min şa ye qe deqakê jê netê der
Binir Minle Elî şaha hatî qurban wan dergaha
Xwe şewitand bi sal û miha bi eşq û şewqa te dilbir
Selewat bi hezar carî ji me re xweş tu bû rihber

***

**Ne`it Şerîf**

Rûsl Ellah ez hatim wê diwanê bi girîyan û bi ah û fîĝanê
Ji her du çavên min hêstir dibarin Ĥebîbê min bi ĥalê min tu zanî
Gunehkar im de`îf im stuxar im perîşan im dixazim xweş emanê
Li ber wê xakpayê ez dinalim temaşeke li min fexrê cîhanê
Hezar carî meded ey fexrê `alem hawar ey serwerê kewn û mekanî
Dil û cîger bi eşqa te ĥelî çû xêr ji te kes bi derdê min nizane
Tu yî pişt û penaha ummeta xwe ĥebîbê min şefî`ê ins û canî
Tu yî ey Mistefa dermanê derd û kulê vî `acizî him perîşanî
Ketim ber bayê vê nefis û hewayê dil û cîger ĥeland min bi wêranê
Hat Minle Elî bi zar û giriyan dirêje hêstirên çavan li dîwanê

*Selat û bi silavan xweş dema dem*
*Bi qandî pişkên berf û baranê*
***

**Ne`it Şerîf**

Ĥebîbê min va dilê ĥeyran sïĥir gihanê qe xewnake
Bi eşqa te bûye mestan `eceb şahê min çi sewdak e
Hatime ber wê xakpayê
cefakêşê te me seyda bûme wek bilbilê şeyda
Di dil de gul bûne peyda bi xwedê wer temaşeke
Hatime ber wê xakpayê
Nexweşim dil birîn im ez aşiq rûyê şêrîn im ez
Bi ah zar û girîn im ez vî barê pir giran rake
Hatime ber wê xakpayê
Sinbil im him perîşan im bi ah û zar û giryan im
Hatim dergeha liqman im dilê ĝafil tu iĥyake
Hatime ber wî xakpayî
Ez esîrê xandanê yar Mihemed Mistefa
Xizmetkar im kes nizane aşiqê rûyê Taha me
Hatime ber wê xakpayê
Ummeta te a gunehkar bi şev û roj dikine hawar
Ka şefa`et ey keremkar sed meded ĥal bûye dijwar
Hatime ber wê xakpayê
Şêrîne rû mahta be serwer `alî cenab e
Were binir hew avta be li rêka te can fîda be
Hatime ber wê xakpayê
Bîr meke min fexir `alem bi şev û roj ez dinalim
Ez bi ĥeyran pir kemal im aşiqê rûyê delal im
Hatime ber wê xakpayê
Dil ji eşqê nabe xalêî wer binir şahê min vî ĥalî
Ey xudanê qedra `alî dil bi eşqê pir dinalî
Hatime ber wê xakpayê
Derwîş im ez dil xengîn im aşiqê şahê gezîn im
Ez bi qurban dil birîn im miştaqê bejina şêrîn im
Can bi qurban xakpayê

***

**Ne`it Şerîf**

Ey pir kerem ey pir wefa can bi quram Mistefa
tu ji gî derda bû şîfa can bi qurban Mistefa
can bi ĥeyranê Misteta
sebra min netê Eĥmed e ey mĥbûbê barî xweda
ez ustûxar im pir geda can bi qurban Mistefa
can bi ĥeyranê Misteta
bi eşq û şewqa te me dil şewitî zerrak nema
ey mefxera `erd û sema can bi qurban Misteta
can bi ĥeyranê Misteta
ey şahê mazaĝ el-beser carekê li hîvê kir nezer
jê re bû wenşeqe El-Qemer can bi qurban Misteta
can bi ĥeyranê Misteta
çi xweş heval e bû Bekir çaxa li ber bejina te sekir
tu jê re bû şahê min şekir can bi qurban Misteta
can bi ĥeyranê Misteta
werin temaşekin li `Umer rûm û `ecem gî serbiser
da ber sîngê hespan binir can bi qurban Misteta
can bi ĥeyranê Misteta
were pîrê xweş ehlê ĥeya zavê ĥebîbê kibriya
Osmanê pak li nav giya can bi qurban Misteta
can bi ĥeyranê Misteta
were wî xudanê Zûlfeqar kifir û ddelal kir tarûmar
pismamê te hew bextiyar can bi qurban Misteta
can bi ĥeyranê Misteta
were Ĥemze û `Ebbasê pak çi digotin rûĥî fîdak
ez dîn kirim eşq û hewak can bi qurban Misteta
can bi ĥeyranê Misteta
dinalim ez wek bilbila li nav gulistana dila
bi hesreta zoyê gula can bi qurban Misteta
can bi ĥeyranê Misteta
yek Ĥesen û yek Ĥusên e bi qurban qurreyê `eyn e
ebrû wek qabe qewsên e can bi qurban Misteta
can bi ĥeyranê Misteta
were şeş hevalê çar yar Telĥe û Zûbêr bûn bextiyar
Se`id û e`îd çi xweş kîbar can bi ĥqurban Misteta
can bi ĥeyranê Misteta
Ebdireĥman çi xweş heval Ebû `Ubeyde yê delel
Fîda kirin wan can û mal can bi qurban Misteta
can bi ĥeyranê Misteta

hew xandanê tu şêrîn hew al û esĥabê gezîn
ez bi qurban ey nazenîn can bi qurbanê Misteta
can bi ĥeyranê Misteta
ez ĥeya roja meĥşerê ji çavan berdim hêstira
bi ah û zar û kesera can bi qurban Misteta
can bi ĥeyranê Misteta
ez dil ĥezîn im ustuxar digirîm ez bi ah û zar
xelaske min ey bextiyar can bi qurban Misteta
can bi ĥeyranê Misteta
ez pir guneh û rûreş im ez pir qusûr û destboş im
wer aşiqê rûyê xweş im can bi qurban Misteta
can bi ĥeyranê Misteta
ger ji te de îmdad nebe perîşan im roj û şevê
can bi qurban bajna te be can bi qurban Misteta
can bi ĥeyranê Misteta
wer Minleyê Bîyanî wer meded bi ey xêr el-beşer
şefî` e hew ey bê xeber can bi qurban Misteta
can bi ĥeyranê Misteta
menale wer Minle Elî cîger wêran û dil ĥelî
bi eşq û şewqa te bike can bi qurban Misteta
can bi ĥeyranê Misteta
wîne selatê ey bira li ser rûĥê xeyr el-wera
ser al û esĥabê wî re can bi qurban Misteta
can bi ĥeyranê Misteta

***

**Xoşxana Mewlîda Şerîf**

Xelk û `alem bûne qurban can bi qurban mewlîda te
Bi eşq û şewqa te ĥeyran can bi qurban mewlîda te
herdem aşiq û merdan xweş sifatê te xeber dan
dil şewitandin bi derdan can bi qurban mewlîda te
şaha tu bû li Buharê pêş meke rûyê dildarê
sewda te ji Meryem nazê can bi qurban mewlîda te
were Nîsanê xweş nîsanê pêşmeke fexrê cîhanê
ez nebê hatim dîwanê can bi qurban mewlîda te
li danzê Buharê pêşîn dayîka te nedî êş
were meqewtîn vî derwêş can bi qurban mewlîda te
hatine firîşte û ĥûrî wê şevê kom bûn li dorê
can bi qurbana wê nûrê can bi qurban mewlîda te
pir mi`cîze û ayet wê şevê derket û hat
ji xelkê de xweş xuya hat can bi qurban mewlîda te
şewqa te da va cîhanê heta bi axir zemanê
mefxera kewn û mekanê can bi qurban mewlîda te
ez bi ĥeyran xweş selatê bi ah û zar û şewatê
dixwînim li ser te zatî can bi qurban mewlîda te
were binir Minle Elî can li rêka te dike qurban
ka şefa`et ez bi ĥeyran can bi qurban mewlîda te
silavke ey bayê ssîba rewda resûlê mucteba
bêje hezaran merĥeba ey mefxer Alê `Eba
silavke ey bayê siĥir ser canê can xeyr el-beşer
li Eba Bekir û `Umer bi sed hezaran merĥeba
silavke ey birayê ĥac li ser xudanê tex û tac
xudan îsraa û him mi`rac bi sed hezaran merĥeba
silavke `Usman û `Elî bi eşqê cîger biĥelî
hev in `îlacê vî dilî bi sed hezaran merĥeba
silavke ey bayê nasîm ser wî ĥebîbê pir ĥelîm
him reĥîm û him ĥekîm bi sed hezaran merĥeba
silavke ey bayê refî` erwaĥê cene el-biqê`
ji `alem re bûye şefî` bi sed hezaran merĥeba
bi eşqa van ĥelîm nemam can bi qurban hêva temam
wî şahê pak `alî meqam bi sed hezaran merĥeba
Minle Elî tu car bi car silavke şahê bixtiyar
Al û esĥab û çar yar bi sed hezaran merĥeba
Silavke ey bayê şêrîn wan her du apên nazenîn
Ĥemeze û `Ebbasê dilbirîn bi sed hezaran merĥeba

***

**Ne`it Şerîf**

Mûĥîbê canê cana me bi eşqê zar û mestan im
Tu yî baxê gulistan e Ĥebîbî min ya resûl Ellah
Şefî`ê min ya resûl Ellah
Çaxa ez gihîştime ĥedretê min dî wa qubeya xedra
Şewqê dayê wekî bedra hebîbê min ya resûl Ellah
Şefî`ê min ya resûl Ellah
Ji menberê ĥeya gorê wek firdos bi nûr e
Şefa`et ez li dorê Ĥebîbê min ya resûl Ellah
Şefî`ê min ya resûl Ellah
Ĥerema te çi xweş e wer bêhna xwe misk û `enber
Ji `alem re tu yî rihber Ĥebîbê min ya resûl Ellah
Şefî`ê min ya resûl Ellah
Tu yî pêxemberê zî-şan tu yî serwer û `alî şan
Ey şahê bi nav û nîşan Ĥebîbê min ya resûl Ellah
Şefî`ê min ya resûl Ellah
Wekî Mecnûnê Lelayê vêketim ez bi vê sewdayê
Bibînin bejin û balavê Ĥebîbê min ya resûl Ellah
Şefî`ê min ya resûl Ellah
Bi arê eşqê nalan im bi dîdara te ĥeyran im
Bi qurban te dil û canêm ĥebîbê min ya resûl Ellah
Şefî`ê min ya resûl Ellah
Binir Minle Elî canê xwe şewitandî bi hicranê
Dike feryad û fîxanê Hebîbê min ya resûl Ellah
Şefî`ê min ya resûl Ellah
Wîne selat û subĥanê li ser wî rûyê nûranî
Şeva îsra çû seyranê Ĥebîbê min ya resûl Ellah
Şefî`ê min ya resûl Ellah

***

Navê Mihemed çi xweş şêrîn e bejina Mihemed çi nazenîn e
Binir cemalê wî pir kemalî wek hêva li ezmên e
Wekî wî zatî `alî sifat qe kes nehatî rûyê zemîn e
Can bi qurbanê fexra cîhanê bejin û nîşana te yasmîn e
Tu `alîşan e`enber feşan e rû derxeşan e şahê Medîn e
Şems el-duĥa ye Bedir el-duca ye nûr el- hîda ye Taha el-emîn e
Kanî şefa`et ey şahê ummet ji cûr û miĥneta me derîne
Minle Elî hat bi zar û şewat dixaze berat bi ah û şîn e

*Sibê hêvarê bi hezar carê*
*Selatê barî li ser wîne*

***

Welleh ez aşiq te me miştaqê wê bejna te me
Bi Ellah ez aşiqê te me miştaqê dîdara te
Ey canê canan Mistefa
Ez ketime bextê ĥebîb ji derdê min re tu tebîb
Li nav gilzayê min `endelîb kanî şefa`et ez xerîb
Ey canê canan Mistefa
Ey bilbila baĝê cînan ey sunbila rûyê cîhan
Ey rohniya dil û çavan ey mefxer wer Îns û Can
Ey canê canan Mistefa
Bi mewlîda te Mistefa cîhan kir zewq û sefa
Ey nazenîn û pir wefa ji te re dahat (qul kefa)
Ey canê canan Mistefa
Ey taça dara enbiya ey serweranê ewliya
`alem bi şewqê bû ddiya him tu yî nûrê kibriya
Ey canê canan Mistefa
Ey pêşewayê ehlê dîn ey reĥmeten lîl`alemîn
Ey nûra `erd û `ezmên ey zîneta rûyê zemîn
Ey canê canan Mistefa
Ey pir ezîz û pir kerem ey xweş sîfat ey muĥterem
Xudanê zemzem û ĥerem nav li ser lewĥ û him qelem
Ey canê canan Mistefa
Minle Elî win bi şewat ser rûĥê fexrê kaînat
Hezar selam hezar selat be ey xudanê mu`cîzat
Ey canê canan Mistefa
Were aşiqê dilĥezîn bi meded şahê gezîn
Bi eşqê wek Mem û Zîn xwe bişewtîn ey nazenîn
Ey aşiqê Mistefa
Ey aşiqê Mustefa pir bike zewq û sefa
Tu gihîştî mirazê xwe xelas bû tu ji cefa
Ey aşiqê Mistefa
Zîyaretke sibih û şev rewdeya `alî meqam
Silavke dayêm mûdam ser şahê fexir el-enam
Ey aşiqê Mistefa
Çi xweş e rewdeya pak dilê min terka wê nak
Xweş ziyaretê lêke rûĥ û rewanê xwe şake
Ey aşiqê Mistefa
Şêrîne `erdê Ĥîcaz pir bike zar û niyaz
Bixwaze li wir miraz ji xwe re ey serfiraz
Ey aşiqê Mistefa
Minle Elî bi meded sed hezar car vê `eded

Bi meded şahê min meded bîr meke Île el-ebed
Ey aşiqê Mistefa
Bu agirê eşqê wer bişewtîn dil û cîger
Selewatê wîne li ser Mistefa xeyr el-beşer
Ey aşiqê Mistefa

***

**Xattêr**

Ketim bextê te Minle Elî şêrîn canê min bi qurbanê
Can û riĥê min gî fîdayê te qehremanê cîhanê
Milletê Kurd dêndarê te ye Minle Mistefa Barzanî
Xwedê zane ne kes barê te ye serekê kurdan î
Te belav kir li çar koşê cîhanê nav û şanê me
Minle tu her hebî bi xweş li nav xort û ciwanên me
Te can da miletê Kurdan te melhem da kul û derda
Te can û mal û milik berda li boyî Miletê Kurda
***

**Ji heval û yarên Ĥacî Îbrahîm Rehmetî re**

Xocê min serwerê min ez bi mîvan bi ĥesretê dinalim ey dilovan
Dixwazim ez esera te belavkim miştaqa wê cemala te a pak im
Bi şev û roj dikim firyad û zarê şewata te ji xeyala min nare
Çi ĥacet ez hewaldim nav û şan te seyda xelk û `alem kişti zane
Berî tu barkî xocê min ji cîhan bi ĥeftakê li min dibe `yane
Di xewnê de dibînim ez li Şamê te feqîhê me `alî meqamê
Li nav cim`eta `alim û zana `ecayib mam birano ez li wana
Me got ey xoceyê min xêr tu hatî ji êl û `eşîrê vî welatî
Got min barkir ji Kurdaxê welîyê min bi derket ji qefesê bilbilê min
Belê min dît li pê wî melayî xel`etek pak li pêş xwe daniye
Min got ey xoce ev xel`eta kê ye got zati ez ketime fikra wê ye
Me got tu narî welatê xwe cakê got canê min terga Şamê qet nake
Ji şewatan re ketim giryan û zarê ji her du çavên min hêstir dibarî
Dixum sondê bi navê ĥedretî ĥeq me hana dît di xewnê de muĥqeq
Berî wefata te ey canê cana hewalda va xewna vê gumana
Ĥecî Îbrahîm li min hev bû `eyane ji ixwanê te radikim beyan e
Dixwazim ez xeberdim nav û şanê te te zatî xweş belavkim li cîhanê
Bi dest xelkê de ev bibe destan ji rûĥê te re hev bi şadîman be
bi teqwayê cîhan te xweş xemiland seba wî min va medĥa pak nivîsand
Li vê demê te navda ey dilê min tu melhem bû ji ser derd û kulên min
Li Kurdaxê şana te pir belav bû feqîhê min tu çîçeka minla bû
Tewekul bû him bi dest me de minewer li ber wê xakpayê bûme kêmtir
Bi her exlaqeke pak ey dilawer te navdabû li Kurmanca seranser
Tu meĥbûbê me bû ey canê cana gelek camêr bû tu `alim û zana
Bi ĝîret û bi namûs û comerdê tu mewsûf bû dîsa seydayê kurdî
Te da `umrê xwe bi we`iz û nesîĥet bi îrşadê tu bû rihberê millet
Li nav `eşîra Şêxan û Biya tu bû feqîh û xêrxwazê me giya
Nav û dengê te çûne çerx û eflak kanî şêrîn kelam hew exlaqa pak
Bi şev û roj dinalim bi ĥesret ji derdê te re ey feqîhê millet
Ĥecî Îbrahîm tu çû Beyt El-ĥeramê tewaf kir ke`be ya `alî meqamê
Ziyaret kir ĥerema wî pakî bi çi zehmet û miĥnet û cefakî
Te bi çava dît rewda wî mutehher bi şefî`ê te be hew şahê enwer
Tu aşiqê resûl Ellah bû herdem te vexwar him mubarek ava zemzem
Tu gerî pir li welatê Ĥîcazê cenab ĥeq tu gihande wî mirazî
Li cami`a Umewî pir `îbadet te kir ey xudanê zihid û qena`et
Tu çû Bexdad û deşta Kerbelayê ziyaret kir te birca ewliyayê
Çi ne`met da te ey sedayê kurdî te ji me re bi zimanê xwe xeber da
Hezar reĥmet li ser gora te be li Firdosê te dilşad bike xoce
Te ar berda kezeb û him dilê min te pir kir derd û êş û him kulên min

Bi arê ferqetê ez bûm birîndar bi şewata te ey xoceyê dîndar
Felek ka te çi kir ew bijin û balav felek ka te çi kir ew rûyê gulav
Felek ka te çi kir ew dîmê narîn felek ka te çi kir hew xocê şêrîn
Kanî ew rûyê nûranî û enwer kanî ew sofiyê `esrê munewer
Ez şagirtê te me istazê ekrem ez xizmetkarê te me xocê herdem
Rica dikim ji wî yezdanê pak rûĥê te li bihuştê xweda şake
Çi camêr ey canê ciwana nikanim ez hewaldim bi zimana
Tu dîndarê zemên û pir kemal bû bi derwîşan re enîs û heval bû
Nesîĥet bû şorên te xoceyê me gî ĥikmet bûn delîl û rihberê me
Qe bîrnabe cemala te a narîn ji rûyê te yê pak nêrgiz dibarîn
Ka bejna te mubarek ketî gorê can û serê min `evdalî li dorê
Binir ĥalê vê dunyayê hana ye ĥeya niha ji kesî re nemaye
Kî hat cîhanê ev şerbeta vexwar çi cana hew dike bin axa sar
Ji kesî re hev zemîna baqî nabe `eceb tukê bi bi vîdî çi cewabê
Cinnet ji te re xweş `alî mekan be bi resûl Ellah re heval û cîran be
Li firdosê bi hevalê te bim ez ji can û dil de pesindarê te bim ez
Navê te ji me re xweş ermeĝan bû xocê min tu ji me re xweş sayîban bû
Wekî Ferhad û Mecnûn ger bixwînim ser nicama te dîsa dilbixwînim
Bi arê eşqê xistim ez ĝerîba li derdê eşqê çare nabe ĥebîba
Bi qurban te bim xoce ne `eyb e li nav baĝê te bilbila me seyb e
Dinalim wek Zelîxayê bi eşqê ji derdê Yûsifê xwe re bi şewqê
Li deşta ken`anê min meĥbûbê xwe kir delîl û metlûbê xwe
Şewata min pir ey dilbirê min nabînim wek te zatî rihberê min
Çi bext û tali`a te hebû ey can li derdê te ne bû çare û derman
Te de`weta xwedayê xwe qebûl kir te kulfetê xwe yê bêkes melûl kir
Li bîst û pêncê Sefer el-xeyr temamet te de`weta xweda kir îcabet
Li sala hezar sê sed û şêst û şeş çû reĥmeta xwe mileyê bextreş
Hatim cem te bi destvala ĥacî li ser gora te bûm sêxê di`acî
Bi arê eşqê min heva nivîsand ji me re ger venakin kul û derda
Binivsînin wekî vê destanê belakin hew li çar koşê cihanê
Ssîba lêke silaman vê ĥesab li rûĥê wî ê pak canfîda be
Dixwazim ji xwedayê asîmanî bi meqamê te ke koşka cînanê
Tu `efû û meĝfîretkî pir `etaya te layiq reĥmeta xwekî xweda
Bi ĥedret Mihemed Mistefa re tu wînî meĥşer bikî cîwara
Ricakarê şefa`et Taha me miştaqê rûyê fexrê enbiya me
Gunehkar im ĝxerîb im pir xeta me Ĝulamê xakpaya Mistefa me
Sîĥrgaha dixwînim wekî bilbil ji ĥesreta gul û rîĥan û sinbil
Ĝerîbê nav gilistana me şaha hew bû ji me re pişt û penaha
Muĥîbê çar yarên ba sefa me esîrê xanedanê Mistefa me
Şefî` e hew ji `asî ummetê re dahat rehĥmet ji xelkê û `alemê re

Ger hewa bû xema mexwin birader hezar Şah bûne li dîwanê kêmtir
Bûme şa`irê Kurmanca ezî dîn bi derdê hicranê ez mame xemgîn
Va xoşxana delal min kir dîwanê seba xatirê xocê xwe xwedê zane
Ĥacî Îbrahîm şefî`ê me delîl e him îmamê Camiya gundê Hec Xelîl e
Ji gundê bêkê eslê wî delal î ĥecî nizane wî pir kemalî
Bûmeş agirtê wî `alî cenabî li rêka wî feqîhî can fîda bî
Bi himmeta wî bûme xwendevanê vî `esrî bes bi tu `ilmî nizanî
Çi Îĥsan wî bi me kir vê qirar bû li cem her kes heva aşkar bû
Çi fexre ji me re pesna te pir xweş bûme meddaĥe te ey xoceyê baş
Bi pesna te zatî bixtiyar im bi vê destanê ez iftîxar im
Li ser gorê dixwînim pir silava li ser rûĥê te ey rohniya çava
Îlahî ez rica dikim bi hawar tu `fkê va qûlê `asî û gunehkar
Li dergahê de`îf û şermesar bi şev û roj karê xwe ah û zar
Keremke tu bi reĥma xwe xwedaya û meĝfirtke curim û him xetaya
Wîne hezar selat û him selama li rûĥê Mistefa xeyr el-enama
Li esĥab û alê wî îllahî bi şefî`ê meke wî padîşahî
Kî ĥez dike rûĥê wan giya şakî hîbake li canê wan fatîĥa kî
Ebû Sma`îl ĥeşrke tu bi wan re hew in meĥşerê bi fexrê cîhan re
Bi istazê xwe `alî meqam re bi muimin û xudanê ehlê îman re
Xwedê mirazê min kir wî delalî bûme meddaĥê xocê pir kemalî
Bi vê destanê ez bûme mewffeq hezaran şukir û minnet barî mutleq
Rica dikim ji xwendevanê zana li vê xoşxanê qusûr in wê û hena
Bi qelemê xwe rakin wê qusûrê û `afkin `eybên min hew ez li dorê
Min xîtam kir hezar el-ĥemdû lîllah bi reĥma xwe min meĝfêretkê Ellah
Kî ĥezdike rûĥê xocê xwe şake bixwînin li rûĥê wî fatîhakê
***

**Ĝezelê eşqê**

Hat nûbuhar ne zivstan e
Dil bi eşqa te mest û ĥeyran e
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Ji dest vê eşqê ez qe ranazim
Ĥeya siĥurê bi gêl û gaz im
Ji gulçîçekan xatir dixwazim
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Ez bûm esîrê te gulîzarê
Can bi qurbana zulf û rexsarê
Ez bûm aşiqê rûyê dildarê
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Bi ĥesreta te dilbira Kurdan
Derd û kul pir bûn dane ser gî derdan
Çavê reş belek ji min re kildan
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Rûyê te dîlber bû bû egaha
Derwîş kurdan dîn bûye naha
Ez kirime xudan te pir gunaha
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Lêvên te şêrîn çi pir kîbar e
Li rengê sêvan rûçik ĥinar e
Li derdê eşqa min kes nedît çare
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Çavên te reş wekî xezala
Zarê te pir xweş ey pir delala
Min meşewtîne bi miha û sala
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Rûyê te dilbir şîrîn e şêrîn
Xûyê te dilbir narîne narîn
Hîro gul û çîçek bi ser me de barîn
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Bi ĥesreta te dil pir dinale
Zar bûye aşiq ĥusin û cemal e
Ez kirim meftûn şewq û şemal e
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Hat nûbuhar gul bûne ĝence
Dilbirê tu pir şêrîn û qence
Ez neyî dînim narînê bence
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Çi bejin û balav li hevdu hatî
Yar meke cûrê min dilşewatî
Bê te naxwazim ez vê ĥeyatê
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Dilbira min tu şahê xobanê
Dil bûye aşiq zar û zimanê
Te yarê sadiq `alem nizanê
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Li hember xwe min meşewtîne
Ji vî `ezabî wer biderxîne
Xwedê (ĥebînî) dil bi birîn e
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Ĥeya bi gorê herdem binalim
Yar ez li dorê bi xem û xeyal im
Aşiqê bijna te a delal im
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Buhar çi xweş e bilbil dixwîne
Bi ah û zaran ez ketime şûnê
Hêstirên çavan bûn gola xwînê
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Ey me`şûqa min tu nazenîn e
Bi hesreta te dil tim ĥezîn e
Derd û kulên min wek Mem û Zîne
Were meşewtîne min canê cana

Dil bi birîn e wer meke hana

Agirê eşqê çi pir yaman e
Va derdê eşqê çi pir giran e
Dil ĥelandî yarê kirî wêran e
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Vê te dunya li min pir teng e
Bi xem xeyalê te qal û ceng e
`
ey pir delalê bes e derng e
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Şêrîna min wer zilfan hilîne
Dev û lêvên te sorgulî ne
Çavên te û reş dil diĥelîne
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Hat nûbuhar ev ne havîn e
Bi şewqa rûyê te xemrevîn e
Leşkerên eşqê li min civîn e
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

Minle Elî wer bes menale
Şêrîn e dilbir îro hîlal e
Agirê eşqê li te ĥelal e
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana

`ewîlê Kurmanc va ermeĝanê
Belake li çar koşkê cîhanê
Dil bi eşqê ket `alem nizane
Were meşewtîne min canê cana
Dil bi birîn e wer meke hana
***

**Ĝezelê Eşqê**

Hevala min delala min gulînê ez ne yî dînim
Şewate ket xeyala min nikanim ez derxînim
Bûme wek bilbilê şeyda Di dil de derd bûne peyda
Binir çi ĥal e ev şeyda bi şev û rojê girî û şîn im
Bûme sermest û sergirdan dinalim ez ji dest derdan
Ji dest dilbira Kurdan meraqa dil pê datînim
Feleka fanî hana kir va xelk û `alema şakir
Wekî Mecnûn Leyla kir ji dest felekê dilxwîn im
Felek te ew canê kîbar çêkir zalim te kir mirdar
`eceb te hew kir axa sar dîsa ez kê herim wînim
Dilo ji berê û paşê de tu yî çala kul û derda
Te tarûmar bi min berda ji te malavê bi kîn im
Ji ber Zoyê Giran derbûm di arê eşqê ez wer bûm
Li rengê gulşenan zer bûm bi ah û weh û nalan im
Seke tu derwîş neçar menal Minle Elî her car
Felek bi kesî re nabe yar ager ez dil bişewtînim

***

## Ĝezelê Eşqê

Bi arê eşqê ez şewitîm  Ĥelî canê min ey cana
Binir ĥalê min ey dilbirê  perîşan meke min hana
Cefakêş te me hatim[131]  bi xwedêke min meşewtîne
Ne Tirk im ez ne jî Tat im  bike pirsa min tu ji wana

Esîrê ĝurbetê me ez  bi derdê zeĥmetê me ez
Şehîdê firqetê me ez  tu yî `îlacê va jana
Ketim bextê te ey dilbirê  meşewtîne canê min tu were
Li bejna te gî serbser  nabînim ez tobe hana

Wa çavê reşbelek kilda  dil û cîger vê re kilda
Meraq pir bûye di dil de  ĥelandim ez wa gerdena
Derkev tu ji paş perdê  meşewtîn min bi vî derdî
Diran mircan û rû werdî  li rengê ĥûr û ĝulmana

Xwedê zane şêrîn î tu  binefşî tu yasmîn î tu
Narîn guhar zerîn î tu  dev û lêv wekî mircan e
Binir Minle Elî cîger  Ĥeland bi eşqa te dilbir
Va dunaya fanî serteser  li pêş çavan bû kulxan e

***

## **Ĝezelê Eşqê**

Va eşqa min nizanî ço    bi dil ket kir esîrê xwe
Dinalim ez bi şev û ro    ji dest vê eşqê ey şaha
Ji dest vê eşqê cana min    ĥelî lal bû zimanê min
Xira bû tîrkevanê min    şikestî pişta min niha

Ne bi zar û ne bi giryan    bi vî derdî nabe derman
Ez kuştim dilbira Kurdan    neçe sal û neçe mihan
Cefa meke bi min gorê    bes e dilbir meke corê
Bûme ĥeyran bi vê torê    dinalim ez siĥirgan

Melûl bûye dil û cîger    li hember te şêrînê wer
Cefa meke bi min dilbir    bi ava rohniya Taha
Tu nizanî vê eşqê zar    tu min dişewtînî ey yar
Şeraba eşqê vexwar    nizanim xatir û caha

Bi ber eniya xwe de şarê    tu bade zilf û rixsarê
Arê eşqê ji dil narê    meke qe ah û nalîne
Va eşqa min nizanî bû    li dil cakê mîvanî bû
Çi derdekî giranî bû    binir Minle Elî şaha

***

**Xezelê Eşqê**

Were ey qemeriya pir can li rengê ĥorî û gurcan
Sseda şêrîn diran mircan esîrê bejin û bala me
Were ey tterttiya şêrîn mişewtîne min guhar zerîn
Bi şev û roj dikim qîrîn bi ĥesreta delala min
Were ey bilbila fodil mexwîne ĝence bûne gul
Di dil de derî vebûne kul esîrê xem û xeyala me
Were ey ĥoriya cinnet li benda te me vê minnet
Bes e dilbir meke zeĥmet cakê teşrîfke mala me
Aman gorê danî cabê133 dilê xemgîn qe çênabe
`eceb va derda sewda be nexweşê meh û sala me
Cîhan bi min bûye tarî derxînin min ji vî arî
Hawar dikim hezar carî nebû wexta wîsala me
Bêhna te misk û `enber bû diran yaqût û cewher bû
Gulistanên te gî zer bûn kanî şewq û şemala te
Binir minleyê Biyanî arê eşqê qe nizanî
Li dunayê pir fanî şewitandim xezala me
Guhlên Minle Elî Kurd e bi ĥesret û kul û derde
Çima eşqê tu kê berde sebê ez destvala me

***

**Xezelê Eşqê**

Xwedê zane bi can û dil bûme aşiq cemala te
Dixwînim ez wekî bilbil li ber şewq û şemala te
Keremke tu rake perdê xelaske min ji vî derdî
Bi dilxweşî bi comerdî bûme şêrîn haval te
Guhlên şêrînê malava hîro min çaxa rojava
Bi her du rohniya çava min di gorê hilala te
Wa bijna te û rîĥanî wa zilfê te û badanî
Siba jê xeber anî ez kuştim xet û xala te
Binir dilbir tu biçûk e bejina te pak tu hîn bûke
Va `umerê fanî rok e min hejmartin sala te
Hîro li nav gulîzara şa bûm ji şewq û eşqara
Min sekir hate dildara te xwende `erduĥala te
Cefa meke bi min zalim ji derdê te re dinalim
Feqîr im ez vê mewal im kirim meftûn cemala te
Temaşeke çi xoşxane dixwînim rû bedirxan e
Bûme serxoşê meyxana li ber wa qed û bala te
Mebêjin Minle Elî dîn e begê min xwedê cîne
Bi arê eşqê xemgîn e nizane qîl û qala te

***

**Xezelê Eşqê**

Dirêjim hêstirên xwînê li rengê ava Cêĥûnê
Dil û cîger bû meftûn ê şêrîn wê bejin û balav
Binir ey dilbira rengîn ji min re hat niha mizgîn
Bi xwedê kê yar mebe xemgîn li benda te me vê gavê
Dinivîsim vê xoşxanê ji te re şahê xopanê
Dişînim ez xwedê zane bi nesîmê re silava
Temaşeke xezala min muĥibet ket xeyalê min
Perîşan bûye ĥalê min felekê dame ber wavê
Bi bejin û qameta gulşîn li Buharê dibin rewşen
Dev û lêvên te çi xweş in kemera zerîn daye navê
Hîro min wa rûyê te dî ji şewqa te min kir fedî
Wek hêva çardeyê nû dî ji şewqa te min kir fedî
Va eşqa te ji kû anî `Eceb Minle Elî Biyanî
Ĥebîba çav belek kanî wa zar û wa zimanî
Ĥelîm şewitim bi vê janê bi eşqa dilovan
Hîro ez bûme mîvanê te nazliya dê û bavê
Dinivîsim va xoşxanê li nav bax û gulistana
Dişewitim wekî perwana bixwîn Minle Elê ya vê

***

**Xezelê Eşqê**

Bixwedê kin wer temaşekin li ĥalê min çi sewda ye
Cîger wêran e min şakin va eşqa ne qola ye
Bi şev ro xewa min netê bi arê eşq û şewatê
Ĥelandim ez vê mîratê çima vê min gî berdaye
Vê eşqê pir ciwan kuştin kul û ĥesret vê re hîştin
Bi arê eşqê dil şuştin dilê wan dîsa şa ye
Vê eşqê dil kire wêran got va ye we rêça mêran
Here pêde wekî şêran va eşqa karê merda ye
Li ber Zoyê Gira canê min bi vê eşqê vê janê
Ĥelî bi arê sozanê li şûna aşiqa maye
Vê eşqê ez kirim kêmtir li ber payana te ey dilbir
Wa bejina pak serbiser ji min re durr yekta ye
Va eşqa tîne bîra min rûyê te por ĥerîra min
Çûbû ji bîr xebîra min ji min re hev bû serr maye
Bi vê eşqê bûme dengbêj bi vê janê serê min bû gêj
Bi min de `umrekî dirêj tu dermanê gî derda ye
Meke Minle Elî pir zar gulistanê te bûne xar
Ji vê eşqê mebe dilsar va eşqa karê mêra ye

***

**Xezelê Eşqê**

Were dilbir bipirse sewda te bûye bilbil
Cîger kir him wêran û kul aman dilbir yaman dilbir

Xwedê zane bi sewdaya te dîn bûm ketime ber tayan
Bû aşiq bejna te vaya aman dilbir yaman dilbir

Va eşqa karekî zor e dev û lêvên te belor e
Rûçik sêv û gulîsor e aman dilbir yaman dilbir

Li ber dilê min evdalî cîhan peva bûye xalî
Binir cakê li vî ĥalî aman dilbir yaman dilbir

Ez derwîşekî nezanim xêrî eşqê bi çi zanim
Aşiq rûyê te me canim aman dilbir yaman dilbir

Tu fodil gulistan e şêrîna şahê xoban e
Hîro li ba min tu mîvan e aman dilbir yaman dilbir

Bixwedêkî yarê mebe dilsar şeraba eşqê min vexwar
Tu nazelîna min dildar aman dilbir yaman dilbir

Tu xêre ji min înan nakî temaşeke li dil cakê
Şêrîne ez herim ba kê aman dilbir yaman dilbir

Dilê min bi arê eşqê ket mûma sewdê têde vêket
Cavê min hîro li bejinê ket aman dilbir yaman dilbir

Sibê zû ji xew rabûm bi bejna dilbirê şabûm
Esîrê jan û sewda bûm aman dilbir yaman dilbir

Ez kuştin zulfa rexsarê ey şêrînê dildarê
Va sewda te ji dil nare aman dilbir yaman dilbir

Wan çavên belek şa kir dil û cîger bi sewda kir
Te xêre narînê hana kir aman dilbir yaman dilbir

Meraqa dil qe danetê vê te sebira min netê
Yaman e arê şewatê aman dilbir yaman dilbir

Dilo jaro çi sewda ye muĥbet ne qola ye
Şêrîn hîn tu di xewda ye aman dilbir yaman dilbir

Hîro bayê ssîba anî silava te gerim kanî
Şêrînê can bi qurbanê aman dilbir yaman dilbir

Xêre ewqas dibasî tu ji min yar mebe `asî tu
Canê xwe meke yeisê tu aman dilbir yaman dilbir

Ji ber Zoyê Gira anî ez hatim li vê cîhanê
Va xelk û `alem zane aman dilbir yaman dilbir

Ji Gundê Bêkê bavê min Elî ye seyda navê min
Tê xwar hêstir ji çavê min aman dilbir yaman dilbir

Menal Minle Elî canê te şewitand vê dilovanê
Meşewtîn min bi giryanê aman dilbir yaman dilbir

***

**Ĝezelê Eşqê**

Aman Minle Elî şorên te şewitandim kirim gorê
Va eşqa nabe bi zorê aman ji dest vê sewdayê
Dilê min pir menalîne cavên te reş delalî ne
Birû bijang hîlalî ne aman ji dest vê sewdayê
Dilê min te ji xew rakir bi eşq û şewqa xwe rakir
Te bi tilayê sewda kir aman ji dest vê sewdayê
Heval tu canê cana diran yaqût û mircan e
Birîn kûr e tu derman e aman ji dest vê sewdayê
Bi sewda te dilê meĥzûn temaşeke bûye meftûn
Bi eşqa te cîger bû xwîn aman ji dest vê sewdayê
Kul û ĥesret lê peyda bû wekî bilbilê şeyda bû
Me bankir yar di xewda bû aman ji dest vê sewdayê
Seda şêrîn were ba min tu nabê ka ĥebîba min
Tu yî can `endelîba min aman ji dest vê sewdayê
Ez im qemer ez im bilbil ez im gulzar ez im sorgul
Ez im nêrgiz ez im fodil aman ji dest vê sewdayê
Ez im narîn ez im şêrîn ez im ĥeyran guhar zêrîn
Gul û çîçek li min barîn aman ji dest vê sewdayê
Ez im bîn xweş ez im rîĥan ez im derd ez im derman
Ez şal û ez im gerden aman ji dest vê sewdayê
Ez im ancû ez im almaz ez im cewher ez im birnas
Meşewtîne min dil ewqas aman ji dest vê sewdayê
Ez derwîşê Biyanî me wekî Eĥmedê Xanî me
Bi sewdaya wê canê me aman ji dest vê sewdayê
Ne Şêxî me ne Amkê me ne Şikakî me
Ne Robarî me ne Rojkî [4]me aman ji dest vê sewdayê
Binir Minle Elî ĥeyran bi sewda te xwe kir qurban
Li derdê xwe nedî derman aman ji dest vê sewdayê

***

[4] . Şêxî, Amkî, Rojkî; Şikakî; Robarî.. navê hin hozên kurdî li Çiyayê kurmênc.

**Ĝezelê Eşqê**

Seĥergan ji xew rabûm min dilbir dît di xew de ye
Bi zindê qemerî şa bûm min got yar ev çi sewda ye
Min bankir ey şêrîn rabe va eşqa bi xewê nabe
`ecab derdê min sewda be nizanim ev çi xew li biya be
Min nazli ji xew rakir şal û gerden bi xwe kir
Li vê bejnê temaşe kir heval çi canê cana ye
Ĥelandim ez bi çavên xwe xeber da min bi navê xwe
Ez kuştim dev û lêvên xwe binir li rengê sêva ne
Bi sewda te dil û cîger Ĥelî şewitîaman dilbir
Diran yaqût û him cewher ji qudretê xwedê daye
Bi eşqê dil giriftar e bi şewqê can birîndar e
Bi şev û ro nalîn û zar e dilê min pir melûl maye
Menal ey derwêş kurdî meşewtîn xwe bi vî derdî
Bi çavê xwe min dilbir dî gul û çîçek bi dest de ye
Bi destê xwe da min ew gula min bîn kir hew danî ser dil
Çêbû vêre gî derd û kul bû dermanê gî derda ye
Binir Minle Elî canê xwe kir qurban dilovanê
Bi eşqê dil bû talanê wan çavê reş kil dane

***

**Ĝezelê Eşqê**

Loma meke seydayê min çi derdekî dijwar eşq
Ez bi mîvan sewdayî me çi arekî bêtar eşq
Fikir û xeyal wêran kir vê rojekê dil qe şa nekir
Bi nalîna mestane kir ez bi ĝulam xemxare eşq
Hev derdekê vê çare ye di dil de hev siyare ye
Bi eşqê dil aware ye aşiq zanin hawar eşq
Vê eşqê ez kirim heval wê dilbira şêrîn delal
Bi şev û roj xewn û xeyal pevde kirî bazar e eşq
Vê eşqê anî nûbuhar bilbil dike pir ah û zar
Pir can kirin vê tarûmar him xar e him gulzar e eşq
Nazliya min wer agirê eşqê di dil de namire
Ĝeddar e tu dilgawirê him ar e him jî mar e eşq
Bi ĥesreta eşqê cîger pevde ĥelî serbiser
Geh aĝû ye geh şekir geh xweş e geh ĝem e eşq
Ĥecî ku ev eşqa nedî bila nebêje dunya min dî
Hev derdekî daye xwedê geh germ e geh sar e eşq
Bi eşqê ey Minle Elî canê xwe herdem biĥelê
Can û beden jî şelî geh dost e geh neyar e eşq

***

**Ĝezelê Eşqê**

Binir dilbira dil meĥzûn bi sewda te bûye mecûn
Li şûna hêstira tê xwîn bes e şêrîn te ez kuştim
Dikim pir ah û firyadê bi şev û roj bandikim yadê
Tu xêr wan zilfa yan nadî bes e dilbir ez kuştim
Bi ĥesreta wê bejina pak dil û cîger bûne ĝemnak
Ji ser çavan tu perdê rak bes e şêrîn te ez kuştim
Feleka fanî hev derda bi dil xist zalimê berde
Bû wêran ax di cîger de bes e şêrîn te ez kuştim
Temaşeke Mem û Zînê çi berdan hêstirên xwînê
Bi eşqê ez ketim şûnê bes e şêrîn te ez kuştim
Bi ĥesreta çavên min kor bûn çi zor e dilbir dûr bû
Ah ĥesret çi zû ji bîr bûn bes e şêrîn te ez kuştim
Xwedêwo çavê min cakê li bejina te temaşeke
Tu xêre qedra min nakî bes e şêrîn te ez kuştim
Lê pirsîm go çûne yayla bi dengekî min go heylê
Binir li qamet û şêlê bes e şêrîn te ez kuştim
Di dil de pir kul û hesret bûye Minle Elî zeĥmet
Çi zor e narînê ferqet bes e şêrîn te ez kuştim

***

**Ĝezelê Eşqê**

Binir seyda vê eşqê ez kirim dîwane dîwane
Wekî bilbilê şeyda ez kirim perwane perwane
Vê ar berda dilê narîn li dil vekir kul û birîn
Cîger pevda binir şêrîn bûye wêran wêran
Rû nade min diran mircan li hember wê ĥeland min can
Bi destê xwe da min fîncan kirim mestane mestane
Nizanim xêre bûye dilsar bejin pakê beden kîbar
Wa çavê reşbelek hercar şêrîn derman e derman e
Bi xwedê kî bes meke nazê `eceb yar tu çi dixwazî
Derdê te zor e dîlbazê bi min yaman e yaman e
Min dît rokê gulîzara min bada zulf û rixsara
Ez dîn bûm yar ji eşqan re gerîm dewerane dewerane
Rokê ez te nebînim ger wê bal û zendê te dilbir
Va dunya fanî serbiser dibe kulxane kulxane
Girîm li darê dunyayê meraq pir bûye sewdayê
Va çavê min qe xew nayê binir giryan e giryan e
Dilo Minle Elî zar e   cîger bi eşqê kir par e
Bi ah û ĥesret û zar e tukes nizane nizane

***

**Ĝezelê Eşqê**

Ezê ço bikim aman dilbir ji dest te û vê sewdayê
Rokê ez te nebînim ger vê te sebra min qet nayê
Bi şev û ro bi ah û zar dilê min bûye tarûmar
Li hember wa canê kîbar cavên min kor bûn qe xew nayê
Arê ferqetê yaman e serekê kul û derdan e
Ey mubtela bûya zan e ez kuştim yar vê belayê
Bejin balav da dûzanê beden wek tayê fîdanê
Şêrînê can bi qurbanê ji qudretê xwedê dayê
Temaşeke wekî Zînê merêje hêstirê xwînê
Ĥelandim ez te narînê te arê eşqê berdayê
Bi ah û ĥesreta yarê meşewtîn min setemkarê
Şwitandim te dildarê ez kuştim yar vê sewdayê
Dişewtim dilnalim ez aşiq rûyê delal im ez
Heroj bi xem û xeyal im ez   werin min û vê ĝewĝayê
Hev e Minle Elî seyda li rengê bilbilê şeyda
Di dil de derd bûne peyda min canê xwe da ber bayê

***

**Ĝezelê Eşqê**

Dilê min dîsa nalî wer temaşeke ĥelî cîger
Wa bejina pak gê serbiser çi narîn e çi şêrîn
Loma meke ji min ey yar şeraba eşqê min vexwar
Dilorînim rojê sed car çi narîn e çi şêrîn e
Çi agir bi dilê min ket êşek bi kula min ket
Arê eşqê têde vêket çi narîn e çi şêrîn e
Ez im serxoş û sergirdan bi sewda qemer ya Kurdan
Ji dest va eşq û va derdan çi narîn e çi şêrîn e
Ĥelîm bi arê sozanê tukes vî derdî nizane
Seke Minle Elî xanî çi narîn e çi şêrîn e
Ez bi vê eşqê bûme dîn û dîwane yar gulê
Mubtelayê pir kul û derda kirim yar vî dilî
Agirê eşqê bi canê min ketî wer lê binir
Bi şewat û ĥesreta eşqê cîger pevda ĥelî
Dilbirê ez dilpirîşan im bi ah û nalîna
Wer temaşeke li canê min bi vê eşqê gulê
Ey gulîsorê te çi hanî serê min ez bi nalîna
Bi şewat û nalîna can û beden ji hev şeliya
Bi şewqa te gul vebûn çîçek vebûn hat buhar
Ji xewê rabe binir gul barîne Minle Elî

***

**Ĝezelê Eşqê**

Ey felek ez ketime bextê te bi min ccûrê meke
Canê min şewitî nema  derdê serê min ne yek e

Zalimê dilgawirê însaf û wicdan qe nema
Hundirê min agirê eşqê ĥeland wer lê seke

Dem bi dem si`et bi si`et miştaqê bejina te me
Dilbirê çavê xwe kilde zulf û rixsara şeke

Aşiqê wa rûyê te û sorkî me ey nîgar
Nazliyê dîmqemerê sewdalî me perdê çeke

Ey şêrîn ĥusin û cemala te li ser kes min nedî
Dîm gulîn Minle Elî hat dil bi mêvanê te ke
***

**Ĝezelê Eşqê**

| | |
|---|---|
| Hêstirê çavê min derbûn | bi şewat û ĥesretê |
| Yar gulîstana me zer bûn | çûm diyarê ĝurbetê |
| Ey gulîzara me gerden | yar çi li bejna te tê |
| Ax ji dest va kul û derda | ax ji dest vê firqetê |
| Ketime bextê te kîbarê | çav reş ji qudretê |
| Ez mirim bi ah û zarê | meke ccûr û miĥnetê |
| Şîn bike ey gulîsor | bi wa naz û muĥbetê |
| Ji rûyê te xweş gulînûr | hez dikim ji suĥbetê |
| Narînê tu pir delal î | şêrînê mal neketê |
| Cewher e hev çi cemal e | di pêş cavê min re metê |
| Rohniya cavê min î tu | zalimê vê mirwetê |
| Taseka ava ĥeyatê | jê vexwim vê minnetê |
| Yar binir Minle Elî can | kir fîdayê vê ummetê |
| Dîm gulê qumriya bircan | ĥoriya nav cinnetê |

***

**Ĝezelê Eşqê**

Xerîbê dil bi eşqa te dinale wer temaşeke
Girêftarê kul û derda bûye wer dilbirê şake
Bi şev û ro dibarînim ji çavan hêstirê xwînê
Nema dermanê vê eşqê nizanim hev çi sewda ke
Siĥirgahan ez rabûm ji xewa şêrîn min dî bilbil
Dixwîne pir bi ah û zar wekî min hew xewnake
Xwedêwo ezkê vî derdî herim bakê şîkkayet kim
Vê eşqê can û ruĥê min ĥeland tu çare lê nake
Xeber da min hîro cana min derket nav gulistana
Xwe da nav gul û rîĥana gulîzara min çi nav pak e
Şêrîn herdem tu ji xewn û xeyala min nayê der
Bi vê eşqê dil û cîger ketime fikrê qe xew nake
Wekî perwana ez şewitîm li ber şewq û şemala
Binir Minle Elî ewqas dibase tu qe deynakî

***

**Ĝezelê Eşqê**

Dilbira min ez  mîvanê zulf û rixsarê te me
Cewhera min ez dilovan mestê dîdarê te me
Çavreşa min derdê eşqê ez kirim pir dilĤezîn
Navxweşa min ez bi şewqa nalîn û zarê te me
Canê min şewitî bi arê eşqê were şêrîn
Dilgeşa min merĤemetke dil birîndarê te me
Nûbuhar hat derketim seyranê nav baĝê şêrîn
Bilbil ez bi şewata eşqê ne barê te me
Derdê eşqê derdekî zor e xwedê bi kesî nexe
Xelk û `alem kes nizane mest û hişyarê te me
Agirê eşqê dil û cîger tev kir tarûmar
Nazliya min can bi qurban wan gulîzerên te me
Ji berê û paşê de derdê eşqê yaman e wer
Rabe ez dilşikesta mest û bêgarê te me
Ĥesreta te ez kirim dîn û dîwane ey nigar
Ah felek Minle Elî xweş go te bêçarê te me

***

## Ĝezelê
## Eşqê

Şêrînê ez bi ah û inkîsarê dilşikestî te me
Xwedê zane bi sewdaya te dilbir ez westî me
Hele can were li derdê min ne bû derman ez çi bikim
Binir li ĥalê min narîn `eyar û sade hestî me
Dîsa rokê tu li ĥalê min naspirsî çi wicdan e
Li rengê bilbila aşiq gulê tim bi zar û mestê me
Birîna dil qe çênabe eger ez herim ba luqmane
Li ĥalê min temaşeke(ne ez wek) Kalê Şetê[5] me
Xwedê neke dilê kesî agirê eşqê neşewtîne
Bawerke ey xezala min bi te re ez rastî me
Cîger qul bûye bi zar û ĥesreta te dilbira şêrîn
Bes e Minle Elî şewitî bide destê xwe destê me

***

[5] . Navê sitiraneke kurdî e kevin e l Çiyayê Kurmênc.

**Ĝezelê Eşqê**

Ah felek wer min neşewtîne bi arê ferqetê
Agirê eşqê çi zor e zalimê vê mirwetê
Dil ĥelî cîger ĥelî bi arê eşqê lê binir
Ah û nalîna min çû ezmana yarê malneketê
Ez zanim agirê eşqa te li min bûye bela
Zilf û rixsarê te pak in ez nizanim qîmetê
Şêrînê ez Zîn û Leylayê nadim li mizgînê
Wer rica dikim bi min meke cûr û zeĥmetê
Ah şêrîn bes dil perîşan bi wan ah û nalîna
Encamê ez kê herim gorê bi derd û ĥesretê
Kanî wicdan kanî mirwet ey gulîzara me ka
Te çi anî serê min `evdalî ax vê mirwetê
Seba xatirê te me berda heval û dostên delal
Rokê xweş ez bi te re neketime kêf û suĥbetê
Ĥeye niha kê wefa diye ji we mekkarino
Kesî nedî çare li eşqê wer vê dewletê
Were meşewtîne bi arê eşqê xwe Minle Elî
Hev cîhana vê wefa ye xwe meke bin zulletê

***

**Ĝezela Eşqê**

Şeraba eşqê daye min agir dîsa berdaye min
Hezar û yek derd daye min çi derdekî yaman e eşq

Dil şewitî cîger bû ar felekê can kir tarûmar
Bi ĥesret û feryad û zar çi derdekî yaman e eşq

Ĥecî bi eşqê ket binir şev û rojê ji hev nake der
Were lê seke ey vêxeber çi derdekî yaman e eşq

Ez nizanim xewa şeva ji kûde hat serê min heva
Ji dest vê ez herim kûva çi derdekî yaman e eşq

Va zalimê ez kal kirim vê dost û vê heval kirim
Vê mal û vê mewal kirim çi derdekî yaman e eşq

Minle Elî ĥeyran memîne bi ĥal û eĥwalê zemên
Firyada te çûn asîmên çi derdekî yaman e eşq

***

==============

**Di malpera Yek-Dem, meha Cotmehê 2024.Z- 2636.K de, hate weşandin**

[www.yek-dem.net](http://www.yek-dem.net)

[info@yek-dem.net](mailto:info@yek-dem.net)